

hejimar '16'

Tebax 2013

Sernivîser  
Qado Şêrîn

Derhener  
Xorşîd Şûzî




## Peyvên Şêrko Bêkes berî 20 salan

### Hevpeyvîna kovara Zanîn

(Xelesa yekê)

Hevpeyvîn bi zimanê erebî: Ibrahîm Yûsif

Wergerandina kurdî: Ebdulbaqî Huseynî



Şêrko Bêkes  
(1940-2013)

Bi helkefta dawî, ku helbestvanê mezin Şêrko Bêkes koça xweyî dawî kir, em dixwazin ji xwendevanên rojnameya (Pênûsa Nû) re hevpeyvîna ku ligel nemir Bêkes di sala 1993 ji alî helbestvan Ibrahîm Yûsif hatibû kirin, û nivîskar Ebdulbaqî Huseynî wegerandibû zimanê kurdî, û di kovara Zanîn de hatibû belavkirin, li vir careke din dubarebikin, çimkî peyvên nemir Bêkes di her heyamê de bejin bilind û dewlemend dimînin, û hilma welat û çanda kurdî ji wan dibarin ....

Hevpeyvîn bi pêşgotinekê bedew hatibû xemlandin, û paş re pirs hatibû kirin, wekû di hejmara heftan ji Kovara Zanînê hatibû belavkirin, wiha emê ji we re li ser du xelakan, belavbikin.

#### Pêşgotin:

Di xarîta helbesta kurdî de navê Şêrko Bêkes bi tundî weku yek ji girîngtirîn navên dahênanî diyar dibe, û giranbuhaya wî ne ji ber ku di Kurdistanê basûr de şalyarê çandeyê ye, lê ji ber ku bejna helbestvan a dahênanî pir bilinde, û ew digel van navên helbestî ên nûjen: Qedrî Can, Goran, Rojen Bernas, Ebdula Peşêw, Refîq Sabir;... Evên ku dîrokek hêja di jiyana helbesta kurdî de pêkanîne,...

Şêrko Bêkes hişt ku guhdariyek nû çêbibe, zimanê wî ê toreyî û karîna wî a rastî hişt ku canek nû di cendekê helbestê de vejine,.. Ev tev di berhemên wî de belû bûne,..

Û wegerandina wî ji naveroka beyana (Riwange) a nûjenî, ewa ku heşt û dilhzikirinek mezin ji bo paşeroja helbesta kurdî bi gelemberî nû za bide.

Şêrko Bêkes kurê Suleymaniyêye, ew çavdêrê bobelata gelê xwe bû, ew gelê ku di dîroka mirovatîyê de jiyaneke pir perîşanî derbaskir, ne tenê bi zarokên Helebçe re a ku faşîstê yekem bi awayên ne mirovane ew qelandin, digiriya, lê bi birînen hemî gelan re digiriya!

Û ev rewşa han di berhemên hemî dahênanên kurd di Kurdistanê tevî de belûye.. Dema ku çêla kul û derd û birînen gelên din dikin, wekû çêla ên xwe dikin.

Şêrko Bêkes helbestvanekî netenê li Kurdistanê hêjaye û bikêr tê, lê belê bikêrî cîhanê jî tê... û qezenckirina wî ji xelata (Tocoliskî) re, van gotinên jorî bi cî dike.

Û em dibînin du dahênanên kurd ên cîhanî Şêrko Bêkes û Selîm Berekat hêjane ku xelata (Nobil) bighê wan.

Çiqasî em li ser Şêrko Bêkes bibêjin hindike, û ev pêşgotina kurt mafê wî pêknayne, ji ber vî hawî, emê gotinê jê re bihêlin ku bersivên pirsên me bide..

#### Hevpeyvîn

1- Zaroktî, xwendinên pêşî, kelepore, bîranên yekem digel helbestê ve.. û çima helbest? Xwezka tu li ser van hemîyan biaxive..

**Şêrko Bêkes:** Hûn li ser çî dixwazin ez biaxivim, li ser zaroktiya xwe a ku ji alî rengê reş ve hatibû kuştin, dema ku bavê min mir, û pişt re jînek perîşanî di himbêza dêkê, ku herdem bi reşiyê pêçayîbû, û ew hîn ciwan bû, belê ez ji bexçê rengan ji bilî du rengan nayê bîra min: Reş a ku min çêla wê kir, rengê kirasê diya min, û rengê berfa ku di zivistanê de li welatê min Kurdistan dibare!

Tunebûn, zikmakiya helbestî li cem min şiyarkir,.. wê çaxê min xwe li pêşiya ziman nedikarî xwe biparêzim.. û cara yekem ji çîrokên gelêrî û dastanan, ez fêrî xweşiya ken bûm, wekû hemî zarokên normal ku xewnên şevan dibînin..

Min hez ji xurîstê kir, ew kopên cadûyî, û çiyayên herî bilind, û baxên ku bi dengê bilind di şevê de dipeyivin.. ew babelîska digelewrên çîrisandî diçe.. tu tişt ji xurîstê mezintir nîne.. û agirê di odeyekê biçûk de veketî, diya min, xuşk û birayên min û çîroka; hebû, nebû, mîrek li devereke dûr hebû... û li darên ku bi şikeftan re diaxive ez guhdarbûm.. û ewr bi ezman re û baran li derve dibariya,.. û diya min ta dawîya şevê çîroka xwe berdewam dikir.. ta ku ez di xew diçûm, û di xewna xwe de ez bi laş di rêkên çiyayî de dimeşiyam, derdiketim ser darên berûwan, dikeniyam, digel keroşkên kovî dileystim, bi ava sûlavan ên zêvî xwe dişostim.. û min dilezand ta ku bighê Xezalê, û dibin siya şengebîyekê de devê wê maçdikir.. qefdek ji xecxekokan jê re pêşkêş dikim.. û bi vî hawî, dema ku ez şiyardibim ez di cîhana helbestî a cuda xwedîdibûm..

Mirov nikare xwe ji cadûwekê sev û roj li bal wîye, zû zû xwe rizgar bike,.. zimanê helbestê nêzîktirîn zimane ji alî vejîna xurîstê ve,.. ew bixwe zimanê heyvê ye, û zimanê perîşanaye jî.

Firehiya ziman, firehiya zimanê helbestî a ku zû xwendevan tede naghê, ku tiştin dîpêre tunebe, wêne di hundirê wênê de, min bixwe û di civana



yekem de hez vî zimanîkir.. zimanê razên xwe bi hesanî diyar nake, wek evîna ku di civata yekê de xwe naspêre evîdarê xwe.., ew bixwe hezkirina zehmete, û digel wilo jî zehmetî carna xweşe,.. ew bixwe êşe.., eger dûrî te ket, dê tu bêriya wê bikî, bi hêviya ku li te vegere, û te bişewitîne.., wekû yek bi kulîlkan bê şewtandin.

Di destpêkê de dema ku min ristên xwe dihûnandin, tenê tiştên di bala min de bê huneriyek cak min dinivîsand.

Nivîsandinên min di hundirê min de diman, dervediket jî derve,.. nivîsandinên bi ava gulabûn, lê diserî tenê de bû, danediket ser pelikan,.. herdem ez xemgînûm, min digot; gelo tiştê heye wê bê, û hayê min jê nîne,.. û min nedizanî wê kengî bê,.. ez li benda zimanekîbû, min ew ziman di peywendiyên xwe de nedidît.., ew ne zimanê bazar û dibistanê bû, lê zimanê destan û efsanên ku diya min jî min re digotin, lê bi rengekî nû, bi kirasekî nû, û bi ragêşanek nazenîn, tenê ew ziman, min di xewna xwe de didît.., min çiqasî hez dikir ku ez wekû baran erdê himbêz dike.., û çiqas min hez dikir ku ez wek dengê bahozê di şevên zivistanê de biaxivim.

## 2- Ji kelepura feqetiyê a kilasîk di cîhana helbestê de, ta danîna hîma yekem bo birojeya nivîsandina helbestek kurdî nûjen.., xwezka tu ji me re diyar bike, bê eve çawa çêbû?

**Şêrko Bêkes:** Dahênana helbestî cîhanê wê tenê heye, digel ku awayên wê pirin, em bixwe li cewher digerin, dema ku em helbestekê dirêsin, ta ku li himberî demê raweste.. ji berî 300 salî çend firokên helbestî ên herî nazik di ezmanê kelepura me de difiriyên, û hîn jî bi çelengî difirin.. tu dibêje niho dest bi firandinê kirine, dahênan dahênane, tiştê ku di koka xwe de hêjabê, dahênanvan berî hemî tiştî di hundirê ziman de dikelin (şoreşê xwe vedixin).. şoreşa feqehan, şoreşa riyalîzman, şoreşa suryalîyan.

Di herdemê de helbestvan û pêximberên wê hene,( Nalî ) di demê xwe de dengê nûjen bû, di hundirê ziman de dijî, zimanê pûteyî hilpiriya, helbestvanê dahênan herdem tiştan dugherîne.

Divê dahênan zanibe, ku berdeyamkirina ziman û pêxistinê wê jê tê xwestin, ji ber ku ziman cemeke û ji bo ku herdem ev cem biherike, divê dana dahênanan berdeyam be!

Goran, serê pira helbesta nûjen bû, wî guherînek ji alî têgihiştina helbestî li bal millet ve çêkir, bi zimanekî hêsan û şêrîn, wek şêrînbûna Kurdistan dinivîsand.., û wekû tê nasîn ku saz wek baranê ye ji canê helbestê re ... wilo jî saza hundirê helbestê guhert.

Piştî Goran gelek awayên helbestî lingin me peydabûn, lê eve piştî şerê cîhanê ê yekem hatin û di riya Turkiya de a ku wê çaxê pêşve çûbû.. û Turkiya bibû wek dilekî di navbera Rojhilata û Rojava de ji ber vê zûzû tevgerên konevanî û civakî û toreyî tede gesbûn, wekû em dizanin wê çaxê hinek ji torevanên kurd li Turkiyê bûn, û evan bûyerên ku me çêla wan kir şûnekariya xwe li wan kesan kirin, li vir ez karim navê Pîremêr û şêx Nûrî şêx Salih û hinin din diyar bikim, ji ber ku evbûn kesên yekem ku bi gelemberî nûbûnanîn toreyê kurdî, û bi taybetî li helbestê... û eve halê tev çandeyên ku digehên hev,.. ta ku cokine dahênanî diafirînin.

## 3- Helbesta kurdî di berhemên Şêrko Bêkes û Ebdula Peşew û hinin din.., karîbûn kulên demê û bûyerên giring bi zimanê

## demê pêkbînin..., Gelo tiştêkî di li bal te heye ku tu li vê gotinê zêde bike?

**Şêrko Bêkes:** birastî, xarîta helbestî a nûjen niho li nig me di Kurdistanê başûr de guheriyê, an jî van salên dawî hatiye guhertin.., erê dahênanên Ebdula Peşew û Refîq Sabir û Letîf Helmet û hinin din, cirîskin pir ronî û zêdeyiyên giring anîne holê, lê niho dengî xweşik tên diyar kirin, ew nenasbûn, ev bixwe jînenîgerya jînê ye, ku herdem tiştin nû pêktîne.

Destpêkên me di salên heftêyan de bû, dema ku me karekî mezin, berbicav kir, ku me beyana Riwange a toreyî, ango berî 22 salan, helbet me cav li beyana helbestî 69 di Iraqê de ketin û cav li tevgerên nûjenî di cîhana erebî de, û beyana 68 di Misrê de.., dêmek em karin bêjin ku Riwange bû banga nûjenî an jî bû sêrwana nû ji bo lebtandina gola qeşagirtî, hin dahênanên xwe rawestandî û hin sistbûn û hinan berdeyamkir.

Ez li dervî welatbûm, di biyanîyê de min dinivîsand, ..û berhema dawî ku min nivîsand destanek helbestî bû, bi navê (Derbenda pinpinîkan) ku sala 1991 derket, qalindbûna wê 235 rûpelin ji qetên orte, û ta niho ez berdeyamîya nivîsandinê dikim, û piştî vegera min li welat, min ewrin sipî ji helbestan dîtî, û di nav nîfşê nû de, ji xortan min dengên sûlavên helbestî bihîst, yek ji wan xortan (Bextiyar Elî) e, ew bixwe dengê bilbilîyê, jîre, ristên wî bilindî, niho gelekî pêşdikeve.., digel hin dengên din mîna (Qubadî Celî Zade, Kerîm Destî, Nûzad Rifet) û helbestvana jêhatî (Kejal Ehmed), ev steyrika geş di ezmanê helbesta kurdî a nûjen de.

(Berdewame...)

## Şêrko Bêkes di çend rêzan de (Nasnameya wî)

- Şêrko Bêkes ji zayînê Suleymanîyê ye (1940). Bavê wî helbestvanê kurd ê nemir BÊKES e.
- Dest bi nivîsandina helbestan kir, hîn temenê wî 16 salî bû.
- Di sala 1963an de, di şoreşa êlûnê de (li Kurdistanê başûr) bû şoreşvan û di pêlweşa (Radyo) ya şoreşê de karkir.
- Dîwana wî a yekem di sala 1968an de çapbû.
- Piştî peymanê Avdara 1970 digel çar helbestvanên kurd mîna: Hejar, Dr. Merûf Xiznedar û Ezedîn Mustefa Resûl, bû endamek di komîta yekîtiya nivîskarên kurd li Bexdê.
- Piştî şikestina şoreşa 1975 digel tibabek ji niştimanên kurd, rêcîma Bexda dîrkirin başûrî Iraqê.
- Di sala 1980î de, digel çend hevalên xwe û li herêmên rizgarkirî, yekîtiya nivîskarên kurd bi rengekî nehênî saz kirin.
- Ji dervî welat, çend xelatên toreyî qezenckir.
- Li Swêd jiyân dibû ta serhildana 1991 vegeriya welat.
- Di sala 1993an de li Kurdistanê başûr bû şalyarê çandeyê.

## Ji Berhemên wî:

- Ronaka helbestan (helbest-1968)
- Hewdeca girî (helbest- 1969)
- Kawayê hesinkar (sanoyeke helbestî- 1971)
- Ez bi rivînê têhnşikestî dibim (helbest- 1973)
- Xezalê (şanoyeke helbestî- 1978)
- Hingûr (şanoyeke helbestî- 1978)
- Du stranên çiyayî (helbest 1980)
- Cem (Çîrokne helbestî-1985)
- Neynikin biçûk (helbestin hilbijartî- 1988)
- Derbenda pinpinîkan (destanek helbestî- 1991).

Dumahîk heye...



## Bêkes Têlo

# JI SÎNEMA MANÎST BÛME ROJNAMESÊN !.



### Hazretê Îsa dibêje:

□ mirov ne tenê bi nan dije " .Lê ez dibêjim ,Gel an ne bi nan an jî,bo nan dijîn.Lê bo pêvajoya derbasbûna xwe di dîrokê de,bi dem û war biçesipîn in.Ev çespandin bi riya huner,wêje û afarandinê pêktê.baweriyek ji pola, liba min hebû û ta niha jî,ku sînema weke alaveke herî bi bandor,bo me pêwîste .Deku bi hev re diyalog ,êş û hêviyan parvebikin.Hem di nav xwe de,û hem bi gelên dîtir ve parvebikin .Bo nivîşê duwihatû yî,ku paş sedsalan li ser me lêkolîn bike.Ji destpêkê ve ez mikur tîm,ji bilî pirtûkan, sînema roleke serata di pêkanîna pênasîn û zanyara min de listiye.Bi hûrbîni nayê bîra min, yekem film ku min temaşe kirbû.Lê xweş tê bîra min ,dema ez bi malbata xwe re , em diçûn sînema yê.

Ez yek ji wan zarokên bextewar bûm,ku malbata min maltêr û bi kurdeyatî navdar bû .Ji malbatên pêşketîxwaz bû,bi malbatên fileh re, yên herî arêstokrat mîna mala Hana,Hadayê û Lahdo di taxa Bişeryê de, li bajarê Qamişlo ,bi dostanî girêdayî hev bûn.Ew pêwendî ,bi bandor bû ser min û malbata min ku her roja Înê, destur didan me,em herin Sînema bo filmekî temaşe bikin.Sê sînema li Qamişlo Fûad,Dîmeşq,Hedad û yeka havînî servekirî, bi navê Şehzad hebûn.Min sînema mîna navendek pêwendîdar bi cîhanek dîtir ve didît .Wê çaxê pir kêr malbatên kurd diçûn sînema,jibilî malbatên Erebi û xirîstiyân an .Weke zarokek deh salî ,sînema bi min pir sihrbaz dihat xwûyanî kirin .Bi rastî, deku bi xwe re û bi we re rastgo bim,di destpêkê de sînema bo min weke listik û demborî bû.

Bala min li ser cilûberg,por û rewşa hestiyarî a listikvan an, wê hîngê balkêşiya min dikşand.Paşê têgihijîtim ku sînema xwedî nêrîn e,huner e,,alavekî derbirîn û zanîn dan e.Wê çaxê min bîrbir ku sînema gotarekî vebêjîyê ye,xwedî deqeke dîtwerî ye,zimaneke taybet liba wê heye.Zimaneke pêwendiyê ye,wêne û deng hokare pêre,û lêvegerek e perwerde yî ye.Hînga ez bûme sînema manîst (sînema hezker). Wê gavê xwesteka xwendina sînema liba min çêbû û kerwanê biber Mosko ve destpêkir. Cihê gotinê ye ,Y.Guney bandorek mezin li min kir ku ev xwestek liba min peydabibe.Wisa jî pêdiviyê destnîşan bikim ,ku em tev deyndarên Yelmaz Guney ne, ku guherînek bêhemba di hişê me de pêkanî. Ji dema Guney ve,Kurd yekemîn car xwe li ser perdeya sîpî dîtî, nasnameya xwe a sînemayî naskir in .Bi weteya kurd neçar bûn, weke gelên cîhanê , kûl û êşên xwe bi rengêkî hunerî ,pêşkêşî çîhanê bikin.

Bilêta dilê min biber Mosko ve diçû,ne jiberku ez komonîst bûm û mala Xwedê avabibe,ticarî komonîst ne bûm û nabim.Lê bêbextiya çerxê wisa xwest , ew bi xwe riya min bi aliyê Swêdê ve bû,paşê hete guhertin.Li wira min agahdar kirin ku dextoriyî ji para min e,wê demê ,dextorî xewna her

xwedekarekî kurd bû.Lê ,min red kir û xwestika xwedina sînema ji wan re diyar kir.Paş danûstendinek zor û dirêj,biryar bû ku têkevim pişbirkê di Inîstûta VGÎK de ya listikvan û derhîneran fêrdike û derçûn dike .VGÎK pir derhînerên binavûdeng mîna Andrey Tarkovskî, xwendina xwe tê de qedandine û mamostên mîna Sirgê Înîştayîn û Mîxael Rûm têde karkirin e .Hemû xwestek û şertên komisyona pişbirkê danîbû ber pêşbirkar an, min pêkanî.

Rêportajekî bi wêne,pandomîmayek û xwendina helbestekê.Ev bûn mercên ku li hember me danîbûn.Min her sê qezenc kir,13-e pîrefêsor ji endamên komisoyana pişbirkê,12 endam bi bêdudilî min qebûl kir in.Lê yê 13- an,pîrsek tenê ji min kir,bersiva pîrsa wî ,jiyana min hemû guherand.Tu komonîst yî? Na !.Ez dengê gel ê ku di rohnahiyê de ,bi henasên demokrat û lêberal ,cihekî ji xwe re digere, welê min bersiva xwe da.

Ew kesê 13-an,bi zimanekî nermokî,ji min xwest çend kêlî derêm jiderve û paşê ew ê gazî min bike.Tiştêk mîna lihêviyê mayînê qurs ,aloz û giyan rûxankar nîne.Lê ez ,weqas ji xwe bawer bûm ku ti mereq bi min re çênebû.Jibekur bixwebawerî hêzeke,henasa duwem dide mirov,û hokare pêre bo bibe.Bê wê,mîrov weke giyayeke li sahara ye,weke mîja sipî jihev belav û zûka wenda dibe.Loma tê gotin ,gava mirov li ber sikratê ye, hêvî ya dawî dimire.Li kerîdora nîvtarî, weke giyayê lal li rêçeke avê bigere,li wira li ber dergehê mam.Hebek bayê tozgirtî dest avêt dilê min.Gelo dibe ew hezkirina sînema ji zaroktî ve bi biryara yek kesî ve wenda bibe?.Ew sînga bi êlektrîk dagirtî, ji evîna sînema di kêlîkekê de vemire? .Li ser pêşla perfa Mosko, gelo bi germahiya ciwanekî ,ew ê hest bibe û bihilye? . Gelo Mosko ew ê bihêlê rajim berdaxekî mey û bibêjim Noşşşşş ! Ji te re hey peytexta wekhevîyê û diya belengaz an ?!.Erdhejîn hat ji bersiva wî kesî ,yê dixwest di eniya min de komonîzmê bixwîne û bibîne.Encama moxilkirina wî bo giyanê min, giha baweriyek û pêşniyarek ku xwendina rojnamegeriya TV î bixwînim.Wê kêliyê bêdengiya min Kenya, weke ku dara bê sîber bim.Ez bûm navek,ku li navnîşana şeva xwe digerya,bêriya min bi destûpê, bi aliyê hevoka,li herderê ,em zarokên sitemkariyê ne ve diçû.Wê kêliyê, ez li ezmanekî jînê digeryam deku bibînim kesekî ji wan 12 endam an, bibêjê: ev biryar zalime !,min ê ezman jêre bi rengan dagirtibana.Wê kêliyê, dengêkî ji giyanê min derket ,gelo mirov çawa bighê dengê yezdan?, weke nûnerê bedewbûn û wekehevî yê.Nexwe bejnûbala min bo rojnamegeriya TV î ye !.Aha ,çi pêve heye,xemnake li wira ezê filmekî derhînim.Welê giham baweriyekê, weke ya helbestvanê Firansî Pol Îlwar ku di helbesta ,,

Razê,, dibêje:

bi rokê re di çavekî de

Û di ya dîtir de bi heyvê re

.....

.....

Barbike bi gorên bahozê

Bi ava cemekî merqdar

Bi meyzekirneke nû

Berbi jor ve.

Bi mebseta agirê ji rokê di jiyanê de ,çiqas bi şewat be,gerek tu hêvî weke heyvê wenda nekî,û jiyana xwe berdewam bikî. Bi nêrîneke nû ve,welê mirov kare biser şikestinên xwe ve biserkeve. Min ev formûle, kir rêznameya xwe û bû sîbera salên hatûwî. Paş 5 salan, ji xwendina dîrok,şewe û têknîka programan û derhîna filmên dekomental, ji rojnamevaniya cîhanî a TV-î ,em bi hûrbîni fêrbûn. Derçûna min bi filmekî dekomenatal li ser jiyan û tekoşîna xebatkar , helbestvanê gewre Cegerxwîn,min saz kir û dîploma rojnamevaniya TV î wergirt.Gava dawî ji qedandina xwedîne mabû, ew bû ku em sûnd û peyman bixwin ku tim li dûv rastiyê bin û rexneya cewteyan bikin.Di vê dema dawî de , û bi taybetî paş teqîna şoreşa Sûrî,her tişt litevhev bûye .Kî rabû û xwe kir rojnamenûs,an bû bernama sazkar,bêyî alavên herî bingeîn ji rojnamegerî bidesbixin.Hewara xwe, dîsa dîghênim keç û xortên Rojava ku di ragihandina kurdî de dixebitin an dixwazin têde bixebitin van xêzên dawî baş li ber çav derbas bikin.

Rojnamenûso- (ê)!. ticarî bawer neke ku xwêner,guhdarvan an jî, dîtwer balûle ne,ê balûle tuyî , çimkî ev raman di serê te de heye.Wisa jî jîbîr neke ,asteya azadiya rojnamenûs li te vedigere,ne li rêberê te yê TV an rojnameya ku tê de kar dikî.Jîbîr neke ku bo rastiyê derîni ,tê gelek car nexweş bikevî û serêşî bo xwe bînî.Bela di bîra te de be, ku peyv çekê te ye û hemû jê dîtirsîn.Çiqas kêfa te ji kesekî re neyê jî,mafê te tune ,malbat an jiyana wî a taybet têxî metirsîyan .Û bela her gav di bala te de be ,tu çiqas kesekî rexne bikî ,lê ticarî wî nizim neke.Ger tu dixwazî rojnamevanek serkeftî bî, ji şelaviya bireve, ji partî û kanalên wan, xwe biparêze û dîrbixe.Û Vê sûndê bixwe:

Sûndixw im !.. ,rastî û tenê rastiyê binivîsîn im û bi lêv bikim.

Sûndixw im !..,bûyer an berovaje nekim .

Sûndixw im !..,derew an, ne nivîsînim an bi lêv bikim.

Sûndixw im!.. ,rêzgirtina temaşevan,guhdarvan û dîtwer bigrim.

Sûndixw im!.., rastgo bim.

Sûndixwim!.. tenê belge û dekoment pêşkêş bikim.

Sûndixw im!..,rojnamenûs bim .Welê min zanokeya Mosko beşê rojnamenûsî qedand .



## Brahîm Mehmûd



### Nav..Nav

Îro bi hesanî dikarim xwe bi nav bikim: Nivîskarim, rexnevanim, bîryarim, rewşenbîrim ... Ma çî û ne çî weku hatiye gotin . Bi hesanî ez dikarim xwe bi nav bikim, di rêya bendîtîyê re, ku ez û hinek bi zanetîyê taybet hev buxîrînin xurandinek lêhatî, ku dunya li ser vê yekê ava bû ye. Îro bi hesanî ez dikarim malperekê ji xwe re amide bikim" ez yan hinek ji vê pîrsê re ku gelek xurtin", ku ez bibme xwedî deng, bi rêyên ku hatine nasîn, daku ez bi nav bibim li çî civata hunerî an çandeyî, an ta ya siyasî, taku çî kesê bi nav dibe an bûye xwedî nav li paş bimîne.

Eger yek ji min re bipirse: Ma ev karê ku tu dikî durîste? Ez ê bibişîm, di peyre ez ê bikenim û bikenim taku zik bi min ve nemîne, taku ew mendehoş bimîne, û ez ê bersivê bidim: Oooh delalo û hevalo, ez dikenim çimkî weku tu nizanî dunya çawa hatiye nasîn. Ma ne Qabîl Habîl kuştîye, û ka çibû tu bi xwedayê xwekî ? Dunya bi navê wî ma tapo kirî! Ma tu kesî hesab pîre kiribû ? Tu dizanî bê kê bi nav dikim, mebest ku ez davêjim kû de. Îca îro çend Qabîl hene ? Em ê vê yeka hanê li ser me kurdan bi nav bikin. Ma divabe em van kesan bi nav bikin? Dibe ew Qabîlê yekem bi wateyek din binase, lê ya ku ez jê bi guman im xweş guman, ya ku ez di behweriya wê de me, ew e ku Qabîlên me kurdan ber bi çavin. Îca de ka tu bi xwedayê xwekî tu dikarî van Qabîlan bijmêrî hêêê?! Çend Habîl tene kuştin daku Qabîlek bi nav dibe? Çend Habîl, her kêliyê, bi hev re tene girêdan daku Qabîlek derkeve bi navê wan, û bêne jibîrkirin? Îca xwedê ji te razîbe tu li kû de dimînî hêêê?!

Ez dixwazim bibme xwedî nav, û divabe ez xwedî nav bim, daku ez jî tizbiya xwe ya dirêjî dirêj berdim nav van tizbiyên kurdî ku pîrr bûne. Ez vê yeka han bi kerb dibêjim çiko hinekan, dibe gelek bin, dane pêşîya min, Îca ji mafê min e ku ez bidme xwe, taku navê min pêşîya hemî navan be, taku tu kes nema karibe xwe di min re derxîne. Eger tu ji min bipirsî: Îca ev çîye? Ez ji te re derziyê bi dar vekim, ku ev ne zîrîkiyeke, na! Ev hinek guhbelbûnek, hinek xweşêrî kirinek, hinek pesn ji yên ku bûne rêber û seydayên vê yekê, hinek durûtî û ziman ku îro ew bû ye mîtodek ji dengvedanê re, hinek gotinên qelo ku balkêş bin...Hud.

Îro bi hesanî dikarim tu kesî li pêşîya xwe nehêlim, daku ez çawa bilivim an bêhna xwe berdim û bikşînim bê mîtî û nîşankirin valî walî. Îca ya ku ji hesanî tune ye ew e: Rêyên ku te bi nav bikin, ji wan alavan pirtir tune ne, weku min ji tere gotiye: Bes tu xwe bilivînî li ser vê mebestê, cavê xwe bigre û veke tê xwe bibînî hember navê ku te xwestiye, hema ez yek ji wan kesê ku di cih de ez ê li te mikurê û belav bikim ku weku te xwestiye, helbet ez vê yekê dibêjim, çimkî ez di misogeriya ku tu jî wisa bi min re vê yekê bikî. Îca ku tu nebî Qabîlek tu kes guh nadê te, îca Qabîliya kurdî bertire û heq tîne. Hema ji vir de ez û tu bûne xwedî nav !

## Ezîz ê Cewo

### DÎSA LI KURDSTANÊ HEWAR E!



... Ev êdî çend roj in, ji hêlekê va cîhana îslamê cejna Remezanê pîroz dike, lê ji hêlekê a dinê va komên kirêt, ên ku ji navê îslamê tevdigerin, di Rojavayê Kurdistanê da komkujîyan pêk tînin. Dîsa li kurdan rakirine fermane! Û dîsa li kurd û Kurdistanê hewar daketye, dîsa meş û mîtîng û civînên çapemanîyê tînin lidarxistan, û dîsa, wek berê, wan bûyer û kiryanan şermezar dikin...

Di vê navberê da ji cîyên cuda ên Sovêta berê û Rûsîyayê kurdên me yê herêmê hest û nêrînên xwe tînin zimên. Ew tîlêfon dikin, bi întêrnêta nameyan dinivîsin, dibêjin, kela dilê xwe dirêjin, dikewgirin û ...dibêjin:

-Ma îslam jî weha dibe, dema tevkujîya Helebçê, hîç dewlet û rêxistineke cîhana îslamê deng dernexist... Ma ne, ew çî ku pêk tê, ji navê wan dibe, ma ne, ew pîrsa şan û şerfa wan a mirovî ye. Ji kurdan bêhtir, divê ew li kurdan xwedî derkevin, ji bo ku navê xwe yê mirovî biparêzin, ji bo ku bikaribin bi rûyê vekirî li çavê mirovahîya tevaya cîhanê binihêrin! (Silêman ê Emer, Kirgizistan).

-Êdî bes nîne, em dijmin şermezar bikin? Ma mirov jî dijmin, kujer û wêrankarên welatê xwe şermezar bike? Mirov divê her bi çeka dijmin bersiva dijmin dide. Ew me dikuvin, welatê me wêran dikin, û... em jî wan şermezar dikin! Ma wisa dibe? Gelo êdî ne bes e?!

Em divê ên nav xwe, ew kurd, ên ku ji bo berîka xwe, ji bo ku zikê wan hertim tîr be, rûmeta netewî, xwîna wan jin, zarok, kal û pîrên me yê bê sûc û guneh didin devê van gur û çeqelan, van hov û haran. Ma ne bes e, ma berîk û zikên wan nedirayn? A, divê em van şermezar bikin! An – na! (Xidir ê Barî, Krasnodar/Rûsîya).

...Xwedê min qurbana wê axê bike, a ku li ser wê gelê me weha şer dike û xwîna wî dirije, ji bo azadîya xwe berxwedide! Ez pîrejinek im, destê min nagihîje wan, ku ez li pey gêrlayên me bimeşim û şûna nigên wan maç bikim. Ez qurbana we bim, kurdno, li dora van bicivin, bibin yek û welatê xwe biparêzin!...(Gulçera Semend, Stavropol/Rûsîya).

Ev tenê çend gotin û name bûn, ên ku min rêdakte kirin û li vir danîn.

Helbet, ez dibêjim, gelek kurdên me jî wê îmza xwe di bin van gotinan da danyana, û minê jî danya...

Rast hatye gotin: “Bi zarê gel Xwedê diaxive!” Heya k’engê emê bi xwe bi hev ra siyasetê û dîplomasiyê bikin? Heya kengê emê kirên netê û neçê yê hev veşêrin? Ma, eger yekîtiya me hebûya, hemû kurd bi yek dilî, yek rewan û ramanê, bi yek dengî li gel û welatê xwe xwedî derketana, gelo wê ev tevkujî, wêran û talanê bihatana serê gelê me?

Baş e, ku partî û rêxistinên Başûrê K’urdistanê jî daxwîyanîyek a hevbeş a şermezarkirina wê tevkujîyê, ya ku di Rojavayê K’urdistanê da li dijî lê me pêk hatye, dan, Lê gelo ev tîrê dike. Ka,

helwesta Hukumeta Herêmê ? Ma êdî pêşmerge, hêzên wir ên taybet, tank û topên wan li ku man? Lê ew ji bo çî û ji bo kê ne, eger wê rojên oxirmê giran da kêrî gelê xwe neyên? Vê jî li hêlekê bihêlin, lê k’ a alîk’arîya mirovî, çima dergên sînor venabin, çir’a alîk’arî naçe? Ma ne ew jî parç’eyekî gelê me ye! Û, divê bê gotin, îro gelê me yê herî hêja li vir e, ji ber ku îro ew berxwedide! Ma ew zar’okên li wir ji ç’eka dijmin jîyana xwe ji dest didin û ji birçîyan nikarin bilivîn, zar’okên k’ê ne. Ma bi çî dilî emê li poêşer’oja xwe binihêrin? Ma emê ji wan r’a çî bibêjim?

Îro di cîhanê da dengê piştgirîya gelê R’ojavayê K’urdistanê bilind dibe, gelek dibêjin, ku divê ev pîrs bik’eve r’ojev sazî û r’êxistinên navnetewî. Belê, r’ast e! Başûrê K’urdistanê îro êdî xwedî statûsekê ye, ez dibêjim rêvebirîya wê dikaribû ev întîsîtêva hilda destê xwe, pîrsa R’ojavayê Kurdistanê bigihanda sazî û dezgehên Rêxistina Netewên Yekbûyî, heya Şewra Ewlekarîyê...

Divê hemû hêz û derfetên netewî bikevin xizmeta gelê me yê di roja teng da .

An – na, wê rojê bê, gelê pîrsê ji me hemûyan jî bike!

Her çiqas jî alîkarî û piştgirîya navnetewî pêwîst û girîng e, lê dîsa jî bêyî me - kurdan bi xwe nabe. Di vê rewşê da tenê Yekîtiya Netewî dikare me ji vê rewşa bêrûmet derîne . Tirajêdîya me ne di wê da ye, ku dijminê hov û har di welatê me da tevkujîyan pêk tîne, tirajêdîya me di wê da ye, ku îro hinek di nav me da para xwe di van tevkujîyan da nbînin, û hewl nadin, ku dest nabin xwe, ji bo ku wê tirajêdîyê rawestînin.

Ez bi gelê me bawer im, di van rojên teng da, ewê hemû hêzên xwe berevî ser hev bike û mafê xwe yê mirovî û netewî dest bîne .

Careke din divê bê gotin, ku gelê me yê Rojavayê Kurdistanê, yê ku me hemûyan jêra bi şêrinahî “Başûrê Biçûk” digot, di dema xwe da ji hemû serhildanên parçeyên dinê yê Kurdistanê ra piştgirî û alîkarî kirine, şoreşger û rewşenbîrên penaber ên siyasî di ruh û dilê xwe da hewandine û li wan xwedî derketine, îro di rojên teng ra debas dibe... Naha jî dora kurdên parçeyên din û yê hemû cîhanê ye, ji xwişk û birayên xwe yê Rojavayê Kurdistanê ra di wê tîkoşîna wan a bêhempa da bibin yek, li tîkoşîna wan xwedî derkevin, ji ber ku ew parç’eyekî tîkoşîna netewî-gîştî ye...

Îro şan û şerefa me ya netewî di Rojavayê K’urdistanê da bi bînpêbûnê ra rûbir’û ye!

Îro binetewbaûna me di Rojavayê K’urdistanê da întihama demê digire!

Îro ji her demê bêhtir Yekîtiya Netewî me divêt!

Îro dive hemû raman, derfet û hêzên me yê netewî ji bo rizgarîya Rojavayê K’urdistanê û gelê me yê wir bikevin tevgerê û kar bikin!

Ev e erênî û fermana demê!

## BÊWAR BARÎ TEYFÛRÎ

### OL, OLDAR, MIROVAHÎ Û DEM

#### Beşa yekemîn.



Êpoxa asîmlasyonê, înkare, kevneşopîyê, kole darîyê, tirsê, bandorê, nezaniyê, bê fehmîyê, êrîşkarîyê û desthilatdarîya li ser gelan berbi kutabûnêva diçe. Dawîya zulm, zor û derewa tune. Gel, mirov, mirovahî çiqasî tene xapandinê da hawqasî biçûk û zêf xuya dibin. Ji bo berjewendiya hêzên desthilatdar ên qirêj demeke pir dirêj mirovahîyê di nav qerebalixekêda xayî dikirin û bi perwerdeke çewt, ne durustve mirovahîyê parçe parçeyî kirine, bere hev dane, pêşketinara astengî pêşda anîne, ji bo ku pêşengîya gelan, mirovahîyê bikin. Dîrokêda tu tişt veşartî nemaye û namîne. Ji bo ku mirovan û gelan bi xwesteka xwe îdare bikin, birêvebivînin ji ol, oldarîtiya cahîl, nezaniyê û xizan bi deman (hezar salan) pêk anîne û ji xwe pêştir der dor nedîtine hemû ji xwera kole û deyndar hesabandine. Bi hezar salane ol çawa hacet, çek li dijî mirovan tê şuxulandinê, di derbarê ol (olan de) mirov, mirovahî durust nehatine agahdar kirin, wetaya olan jîyanêda nehatîye zelal kirin, gelek caran mijara olan hatîye da kirin (xewle kirin) ji mirovan, bi demane mirovahî kor û di nav zelaletê da xuya dibe. Heqîqet, rastî li bin sîyê da hatîye xewle kirin, le îro şilovekirin û aşkar kirinara zerûreteke zanîstî peyda bûye. Dema hemdemîda mirov hesnakin jîyanêda qerebalixî, durîti bidome, yê şareza hewl didin dunyek bi şeref û wekhevîyêda dabijînin.

Oldarîtiya tund ji mînanî nijatperestîyê ji bo mirovan tehlukeye, pêşketinara astengîya pêşda tine. Mirova li bin esareta kevneşopîyêda xayî dike.

Ol çîyê û çima ol pêşda hatine. Ezê li vê gotarêda hewl bikim ku kurt derbarê vê mijarêda raman û fikirên xwe bînim ziman û helwesta xwe destnîşandim.

Çand û emirjîyana gelanda rola olan bê şik pirre.

Li gorî pirtûkên (kitêbên) esmanî ol ulmê xwedaye, mijara perwerdeya mirovahîyê ye. Ol testîq dike ku xweda heye û teke, hêzeke bi edalete. Dunya, gerdûn, kaînat, mirov û suruşt hemû tişt xweda xaliqandîye û bi îrada (vîna) wîva girêdayne. Ol him jî di navbera xweda û mirovan de pîreye, wesîleye. Mirov beqî ol xweda nasdikin û bawerîyê lê tînin. Ol rêya jîyana mirovane, rêya merîfetêye, exlaqêye, menevîyat û çanda mirovahîyêye. Çend olên gerdûnî hene (Xrîstîan, Îslam, Bûdî).

Bi milyardava mirov bawerîyê li van ola tînin. Ev olana mirovan bi xweda va girêdidin. Û wetaya

wan dişipe hevdu mebesta wan jî perwerdaya mirovahîyêye, ew hemû jî bê şik yek xwedê bûnê testîq dikin, nirxek mezin didin mirovan û beyan dikin ku xweda ev dunya û axîret ji bo mirovan efirandîye.

Mirov hemû xûşk û birayê hevdune, Adem û Heva kalik û pîrik ê wanin. Bê şik hemû ol jî evrane, paqijîn lewra rêya qenc û durust nîşanî mirovan didin. Hemû ol jî ji bo pêşketina mirovahîyê pêşda hatine yek û yekî tamam dike Ol hemû jî azadin gorî hiş û ramanên xwe kîjan olîra dixwazî dikarî lê îmanê bîni, mirovên bi îman bi wîcdanin, xwedênasin. Mirovên esl xwedênas tu wext xirabîya nakin. Belê, dîn azadin, Kîjan olî dixwazî dikarî bawerîya xwe lê bîni, îro jî bi hezaran mirov ola xwe dugehîrin lê xwedara bawer dikin. Mirov jî gorî ola azadin ev jî taybetmendiyêke olane. Çand û emirjîyana gelanda bandora olan hertim xuya bûye.

Cîvakên îbtîda de (komên ewlîn) jî ol hebûne, mînak-totêizm, animîzm, şamanîzm. Demên kevnarda, dema îbtîda de koma gorî zakonên van ola xwe rêk û pêk kirine. Lê wexta cîvakêde sinif (çîn) pêşda hatine helwestên nû ên cîvakî xuya bûne, rewşa mirovan a sosîal tê guhurandinê, kole, koledartî, xulamî-axatî xuya dibe, mafê mirovan gelek tînen pêpez kirinê, dewlet pêşda tê, mafê mirovan, azadî û keda mirovan tê îstîsmar kirinê (dagir kirin).

Ji bo ku mafê mirovan, azadîya mirovan, keda mirovan were parastinê, mirov werine nirxandinê olê gerdûnî pêşda hatine. Bi wesîla olan ve yekbûna mirov û gelan çêbûye, di hêla mêjûve.

Hemû ol jî xuya dikin ku eva dunya mala mirovahîyêye, mirov wekhevin, azadin, xûşk û birayên hevî tenê aqil û feraseta xweva ji hevdu tînen cudakirin, mirovên aqil tîngêhiştî, adil peywirdarin cîvakê rêvebivînin. Ol zulm, zor sîtemêra rê nade, dijî dagirkerîyêye. Ji bo mînak ola ÎSLAMÊ (Quran) dide kifşê de ku kuştina miroveki amû tam tunekirina beşerîyêye, kuştina hemû mirovahîyêye, mafê tu kesî tune heyin û hebûna yekî din înkare û îmha bike. Yê zulmê dikin jî dijî îrade (vîna) xweda dertînen.

Lê mixabin bi demane bi daxwaza xwedava cîvak, mirovahî bi zakonên durust, rast ya ku xweda pirtûkên esmanîva ji bo mirovan şandîye nayê emel kirin, mirovahî dîrî perwerde îlahî maye. Pêşengên olan ên nezaniyê, sexte hertim hêzên desthilatdar ra ên xudbîn û nijadperest ra bûne yek êrîşkaryêra mijûl bûne, ji bo berjewendîyê xwe

şexsî kuştina mirovan ra fitva dane. Ji bo ku mirovan hêsyay tabê xwe bikin hewl dane mirovan di goveka xizantî û nezaniyêda xayîkin.

Mirovan di goveka xizantî û nezaniyêda xayîkin. Bi fitva xadîmên olan ên nezaniyê, sexte, xudbîn bi deman di navbera gelan da şerê demdirêj qewîmîne. Dema meda jî diqewmin.

Fetullah GUL xadîmekî (xizmetkar, pêşeng) olîye, navdare, dunya wî nasdike ê Turkiyayêye. MILYARDAVA dollarê wî heye, (kes napirse ji kune ev pere, dirav). deverên cuda-cuda de medresa dide vekirinê, bi navê xweda diaxife, lê tunekirina heyin û hebûna miletekîra fitva ê dide, kurda înkare dike, ji xweda qilandina netewa kurd dixwaze, koleyekî rêjîma dewleta turke. Divêje, eger hun xwe turk bihesbînin tu pîrsgrêk û cudatî navbera meda yê nemîne. Eşkere divêje gerek koka kurda bê qilandinê. Bi xwe jî beqî kurdan xwedêbernegiravî bûye oldar, li dibistana (terîqeta) Neqîşbendîya de fêrî îslamê bûye Lê qe carekê jî ji bo biratîyê, aşîyê, wekhevîyê û rawestandina zor, zulm û şera dengê xwe jî dernaxe. Kurdên oldar durîtiya wî nabînin.

Xwedênas û oldarên sexte (îslama radîkal) îro jî li bin seda Allahû Akbar xwîna mirovan hildişînin, mirovên bê gune saxlem ji bo ku tabê îrada wan nabin didin daliqandinê (dewleta Îranêda). Yê weha gelekî dîrî exlaqê olî û dîrî nirxên mirovahîyêne.

Ji demê berê bigire heya naha bi zêhnîyatek xirav hewil didin mirovan, gelan tîkin li bin bandora xwe, dunya kirine qada şeran, bi malê dunê duşuxulîn zêhnîyata bugehîrin, mirovan, gelan bere hevînin ji bo ku milyarda qazanckin şera dikin. Mirovên saxlem xwedênas pêwîste van hêzên durî û xudbînra rê nedin serkevin.

Têgîhandina mirov û cîvakanda perwerda îlahî roleke balkêş dileyze. Oldarîtiya derew, sexte tendurîstîya mirovahîyê a menewî, exlaqî (torî) dike, mirov dibine koleyên hest û daxwazên xwe qirêj û hemberî hev cînayyetê, sîuca dikin. Oldarên nezaniyê nijadperest ola xwe ji yê din hêjatir û çetir hesabandine û dihesbînin. Hemû bobelat jî ji vir despêdîkin. Hemû ol jî hêjane, ji bo perwerde û jîyana mirovan, azayî û rehetbûna mirovan pêşda hatine. Lê mixabin heya niha jî durîst rîayet nayê kirin. Ol ji bo pêşketinê rê vedikin, lê mixabin pêşengên (xizmetkarên) olan ên çewt, nezaniyê, xûjan hertim mirov şaş kirine, bere hev dane, netîcêda mirov bûne kujer ê hevdu.

OLDARAN MIXABIN DÎROKÊDA ÊN DÎROKÎ LI SER XWÎNÊ BIRYAR GIRTINE, BÎNA XWÎNÊ JI DÎROKA OLAN TÊ...

.Pêdivîya mirovan hertim li rastîyêra heye.



**Dr. Ehmed Xelîl**

## Hêz, Rehberî, Dewlet, û Rêya Bi Tenê

Bi me re berbas bû, ku navkokiya ji bo bidestxistina erdnîgariyê yek ji rasteqînên dîrokê ye, lê sê rasteqînên dîrokî yên din jî hene, ew jî evin:

### Hêza Gewre:

Erdnîgarî pêwîsiyê du hêzane: Hêza ji bo Bidestxistinê, û hêza ji bo parastinê, di her demê de, gelê xwedî hêza gewre karibû erdnîgariya dewlemedtir bi dest xwe xîne û biparêze, lewre gelek ramankarên navdar giringiya hêza gewre dan xuyan, Nîqola Mîkyavillî dibêje: „*dîrok diçespîne ku pêxemberên çekdar welat dagîr kirin û xwedî serkevtin bûn, lê pêxemberên bê çek ne serkevtî bûn*”<sup>(1)</sup>.

feylesûfê alman ê navdar Fridrik Hîgil jî dibêje: „*pêwîste maf bi hêzê were hilpesartin, maf hêze*”<sup>(1)</sup>. Feylesûfê alman ê navdar Firidrik Nîtçehe jî dibêje: „*Pirsgirêk pirsgirêka hêze, ne pirsgirêka mafê*”<sup>(1)</sup>. Napilyun Ponpart jî dibêje: „*Cihê ku egirê tang te digihîne, mafê te jê digihîne*”.

### Rehberî:

Gel nikare bibe xwedî hêzeke gewre, eger di bin serdariya tek-rehberiyê de necive, gelê ku nerîn, armanc, helwest xwe cuda bin, ê hîç nebe xwedî hêzeke gewre, û ê nikaribe hebûna xwe û welatê xwe biparêze. Lê pîrsa giring eve: Gelo, çawa tek-rehberî (tek-serokatî) ê pêk were?

Sazkarên tek-rehberiyê pêşengên gelane, ewin ên ku geyana netewî di xwe de dicivînin, çanda netewî ya resen vedijînin, hişyariya netewî di nav gel de bi cih tînin, nerîna netewî ya hevbeş pêk tînin, pirojeya netewî ya hevbeş ava dikin, gel dicivînin dikin tek gewde di ware çandî, konevanî, aborî û leşkerî de.

Pêxember Muhemmed û dûvelangên wî bi va kar û baran rabûn, ta ku êlên ereban, di sedsala (7z)de bûn gelekî xwedî dewletwke gewre, û Cenkîzhan di derbara êlên Muxolan di sedsala (13z) bi va kar û barî rabû, û bi va awayî jî Corc Waşingtium û hevalên wî, di sedsala (18 z)de dewleta Emêrka damezrandin.

### Dewlet:

Dewlet ne tenê dezgehî, dewlet berî her tiştî, hişyariya gelêriye, hişê gelêrî ê hatî dezgehkirine, dewlet nûnerê hebûna netewî ye, nûnerê vîna netewî ye, zirxa ku hebûn û nasnameya netewî diparêze, her gelê ku vê dewlet be ê her û her lestik be di destên dagîrkeran de, û her ramankarekî gewre ê ku bal kişand ser pirsgirêkên gelan di dîrokê de, mijara dewletê bi awayekî bilind nîrxand, wek mînak; ramankarê □înî Konfoşyos (sala 479b.z mir), û eylesûfê yonanî Eflatûn (sal 347b.z mir). Feylesûfê almanî Firidrik Hîgil (sala 1831 b.z mir) di va babetê de dibêje: „*Dewlet xwedayê ku li ser zemîn dimeşe ye*”<sup>(1)</sup>.

### Rêya Bi Tenê:

Eger em pêvajoya netewa xwe, li dirêjahiya 25 sedsalan, beramberî pêvajoya netewên din bikin, dê were xuyan ku ewa pêvajoyeke susrete, bi serde jî pêwîst em ji bîra nekin ku pirsgirêka me ya bingehî ne bidestxistina (mafên netewî) di dewletên dagîrkeran de ye, nexêr, pirsgirêka me ya bingehî parastina nasnamaya me û hebûna me ya netewî ye, bi gotineke din: pirsgirêka me ya bingehî ewe ku em mirovahî, azadî û rûmeta xwe biparêzin. Ramanbîrê firensî Can Cak Rosso dibêje: „*Destberdana ji azadiyê wek destberdana ji mirovahiyê ye*”<sup>(1)</sup>.

Bi rastî, ti rê li pêş me ninin, ji bilî ku em hebûna xwe ya netewî biparêzin, ji ber ku serdarên pirojeyên dagîrkeriyê li rojhilata navîn (faris, toranî û ereb), qet napejînin ku destên xwe ji yaqa me berdin, û bihêlin ku em kurdîstaneke serbixwe ava bikin, lewre ew girgîn dibin çaxê ku em mefê xwe yî çarenûsî dixwazin.

Erê, ti rê li pêş me ninin, û nabe ku em careke din têkevin ber davên zozên derewîn, û pêwîste em ji bîra nekin ku bawerîya dagîrkeran bi çanda setemkariyê hatiye avdan, doza wan a sereke ewe ku gelan dagîrkin, çand û nasnameyên wan ji holê rekin, û gelek behane hene ku- ta niha- wana dest ji va baweriyê bernedaye, û ciyê dimokratiyê, fidiraliyê li ba wan nine, ew- wek bavpîrên xwe ên dagîrker- duruşmeyên nîrxbiha radikin jor, lê karên qirêj bi cih tînin.

Em ne bê damarin, em xwdî dîrokeke serbilindin, pavpîrên me ewin ên ku kevintirîn şaristanî (şaristaniya Gozana) li rojavaya asyayê ava kirin, pavpîrên me yên Med serdarên rojhilatê bûn, gel ji zordariya Aşuran rêzgar kirin, lewre, em pijartî ne ku em careke din bi rola xwe ya şaristanî û mirovehî rabin, çanda setemkariyê birûxînin.

Helbet □anaziya bi bavpîran pêşerojeka geş ji gelan re pêk nîne, a rast ewe, ku em pêvajoya netewa xwe sererast bikin, cihê xwe di bin tava royê de bistînin, û da ku em van armacan bi cih bînin pêwîste em sê bi baran rabin:

- Avakirina tek-rehberî.
- Avakirina hêza gewre.
- damezrandina dewlet.

Çi dibe jî, pêwîste Kurdistan were rêzgarkirin!


### Jêder:

1. Nîqla mîkyavillî: Mr, rû 82.
2. Herebert Fişer: Dîroka Ewropa di serdemên nû de, rû 203.
3. Firidrik Nîtçehe: Mirovê pêdaçûnek di mirovahiyê de, beş 1, rû 196.
4. Ciyofrî Robirts: Ferhenga nû ji şîroveya konevaniyê re, rû 340.
5. Cîlîn Tindir: Ramana Konevanî, rû 162.



**Beyar Robarî**

**Şêrgo Bêkes<sup>1</sup>**



Dengê azadiyê bû herdem û dan û text

Xweşî û mirovahî mebest bû û hest

Xwedî raman bû û helwest

Û hêja wêje û helbest

Jiyana Şêrgo pêlên deryê bû û kaş û deşt

Ciyê te helbestvanî buhûşt be ger heyê beheşt

Kêj me hebûna kesên wek te û Cîgerwûn heyşt

Te li pê xwe hiştin berhem bi heftan û heyşt

\*

Şêrgo Bêkes

Deryak xeyal bû û hest

Jibo gelê ristin delal helbest

Çend û çend xilat ketin dest

Xweş be bîrewera te her wext

\*

Şêrgo xweş rûpele

Serwer mirov û bilind kele

Kela dilê pêşmerge û balind û nefele

Çawa wisa ji nava me bardike û dere?!



### 1- Şêrgo Bêkes:

Di 2`ê gulana 1940`î de li **Silêmaniyê** hatiye cîhnê. Ew kurê helbestvanê navdar **Faîq Bêkese**. Wî xwendina xwe ya bingehîn û navîn li Silêmanî û Bexdayê tamam kiriye. Bêkes ji 17 saliya xwe ve dest bi nivîsandina helbestan kiriye û cara pêşîn helbestên xwe di heftenameya bi navê **Jîn** li Silêmaniyê belav kiriye.

Helbestvan Şêrko Bêkes di sala 1984`an de beşdarî serhildana li başûrê Kurdistanê bû û 1986`an de wek penaber çû Swêdê. Li Swêdê bû endamê Komeleya Nivîskarên Swêdê û **PENA Swêdî**. Di 1987`an de PENA Swêdî **xilata Tucholsky** dane wî.

Di 1991`ê de li başûrê Kurdistanê bû endamê parlamên

û sal nîvekê wezîriyê çandê. Bêkes li Silêmaniyê wê demê dijiya û dipê wê re serokatîya navenda çandî ya bi navê Serdem kir. Bi dehan berhemên wî hene û gelek jê hatin vergerandin zimanên biyanî.

Di 4ê tebaxa 2013`an de li **Stockholma** paytexta **Swêdê** ji ber nexweşiya pençeşêrê û çû ye ser dilovaniya Xwedê.

## Qado Şêrîn

### Bang boyî kongireyê

#### nivîskaran



Ji roja ku guftûgo li ser kongirê nivîskar û rojnamevanan tê gerandin, û ka bila kînga li dar keve yan na, dîtî û pêşniyara min nehatiye guhertin, her ji roja pêşî ve pêşniyara min ew e ku bimîne piştî rûxandina rêjîmê, ji ber du sedemên bingehîn:

1- daku hemû nivîskar û rojnamevan bikaribin lê amade bibin, û bihane ji kesî re nemînin.

2- hîna rêjîm li Qamişlo heye, û çî kongirê di bin sîwana rêjîma Beşar a kujer û nerewa de li dar keve, ne rewya ye.

Wê kongir bi çî rûyî li dar keve, û rojane 5-6 hezar kes ji herêma me koçber dibin, jixwe li dar xistina kongir di van rojan de tê wateya aramiya herêmê, û ev qet ne rast û durust e. Her wiha nivîskarên ji herêma koban û Efrînê jî wê nikaribin bi hesanî amade bibin.

Gelek nivîskar jî koçber bûne, li gor agahiyên me li dora 70-80% ji nivîskaran koçber bûne û ne amade ne di van rojan de veşandin. Qamişlo û li kongiran amade bibin, helbet ewê di van kawdanên dijwar de nikaribin amade bibin, êdî heçê dixwaze berî rûxandina rêjîmê kongiran li dar xîne, xêrê ji nivîskaran re naxwaze, her wiha yekîtiya nivîskaran têk dibe û hewla têk birina kongirê serkeftî li paşerojê dike.

Heçê dixwaze kongir di van rojan de li dar keve, bêşek dizane wê kesek ji wî û çendên mîna wî amade nebin, daku hin berjewendiyên xwe yê kesane pêk bînin û navê xwe li rûpela dîroka qelp binvîsin.

Diyar e ew kesên ku teng difikirin, û tenê li nav û dengê xwe digerin, di bin asteng li ber saz kirina kongir, bila ew kes etmofereki zelal û xweşik di nav hemû aliyan de ava bikin, daku kongir di rewşek aram de li dar keve û encamên baş bide, baştîre ku sibe eşkere bibe bê çiqasî qaşo ew nivîskar keysebaz û kurme darê ne.

Zelal û vekirî dibêjim ku ez li dijî damezirandina şaxik û hev girtinên bajar û bajarokan bûm, ana û piştî ew şax û hev girtin hatin çesipandin, ji wan hêvî û rica dikim ku bibin alîkar ji bo saz kirina kongireyekî yekane serkeftî û nebin asteng.

Ji me hemiyana tê xwestin ku bi erkê xwe yê netewî û dîrokî rabin, û xwe wek berpirsyar di ber yekkirina nivîskaran de nîşan bidin. Ji me hemiyana tê xwestin ku bi berpirsîyarî yek dezgehê ji bo nivîskaran damezirînin daku lanet li me hemiyana neyê barandin. Jixwe li dawî wê eşkere bibe kê xêr dixwest û kê nedixwest û kê ji bo berjewendiyên xwe yê teng û bi gemar dikir.

Li dawî, bila kongireyekî serkeftî ji henû nivîskar û şax û hev girtinên heyî piştî rûxandina rêjîmê saz bibe, û soz didim we ku ezê doza tiştêkî li we nekim, bila ez ne di komîtên birêvebir de bim, bila ez ne sernivîserê rojnama "Pênûsa Nû" bim (rojname Hev girtina Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî {H.N.R.K.S}), bila ez ne di komîta birêvebir a derve de bim, tenê ezê wê wextê xulamtiya we û xizmeta biryarên kongir bikim û dest û çavên we ramûsim.


19/08/2013

Qado Şêrîn

Endamê komîta birêvebir û sernivîserê rojnama "Pênûsa Nû" ya {H.N.R.K.S}

## Idrîs Hiso

### Xewna berî sed salî



Manga Tebax ê bi êş û azerye bo kurdan, roja 10 a ji vê mehê, berî 93 salan peymanê Sîver di nav hêzên hevalbend yê serkeftî di cenga cihanî yekem de û ipratorya Osmanî de hat imze kirin, di wê peymanê de mafê kurdan di dewletek serbixwe de li ser hemû xaka Kurdistan, li gel mafên gelên ipratoryê mîna Ermenî û Ereban hat berçavgirtin, kurdan jî ji alyê xwe li wê peymanê dinerîn wek peymanek rewya ku têde mafê wan di dewletekê de hat çesibandin, wek yekemîn peymanê cihanî ku eşkere li mafê kurd û kurdistanê rûdinê. Lê ji ber serkeftina hêzên nejad perstên Tirk û tîkçûna yonaniyan, û ne yek rêzya gotina kurdan, mercin din xwe li meydanê bi cîkirin û hêzên nav dewletî jî, li gor berjewendiyên xwe meşîn, û wijdan û bextê xwe xerakirin, hêzên nejad pestên Tirk bi serokatya Mustafa Kemal Atatürk, nexwestin hemû xaka ipratoryê ji dest wan here, peymanek dî hat holê, peymanê Lozan (24/7/1924), derewên hevalbend eşkerebûn, û ipratorya Osmanî ne hat dabeşkirin bi temamî.

Kurdistan bû qelenê hevalbendiyê dinavbera Tirkiya û Urpî yan de, ji tirsê ku Tirk destê xwe tîxin destê Rûsan de, Urpî yan Kurdistan kirin qelen û imze kirin li ser peymanê Lozan, nav û dengê kurdan ji civata navdewletî hat rahiştin, Kurdistan bi devê top û tivngên faşîstên Tirkan bû meydan qirkirinê bi her hawî û dibin guh û çavên cihanê de.

Komkujî, qirkirin, gundwêran, penaberî, cînosayid bi her şeweyî û qirkirina şaristanya kurdistanê paşî Urpî yan guh û çavên xwe girtin, ji Tirkan re bû armanc, bêtir ji melyonek kuştî û bi melyonan penaber.

Lê li himber vê cînosayidê kurdan serî Hilda û berxwedanê bê rawestan kirin, ew xebat û tîkoşîn ne gihan armancên xwe tevî qurbanyên gewre, lê helbet diyarkirin jî, kurd ne mîletê ku nebe dewlet.

Kurdan xebat bi gelek alyan ve

dişopand, him xebata çekdar û him xebat pênûs û kaxetê. Di xebata çekande kurdan tîxîr nekir, lê wê xebatê bi tenê nikaribû maf û azadî pêkanîba.

Di aliyên din de hin qisûrî hebû, tevî ku xebatên zor girîn hatin kirin, û rola wan ne kêmi ya tivngê bû, li ser serê wan karan dirûzkirina Elfebeyek hesan bo nivîsa kurdî ji lay mîr Celadet ve, û xebata ragihandinê ji lay vê malbatê bi giştî.

Bi her halî, di vê bîranînê de ez dixwazim çend xalan bînim ziman

- di wê demê de kurd bûn qurbanya berjewndiyên hêzên cihanî

- gotin û helwêsta kurdan ne yekbû û hin ji serkirdayên wan ne dixwestin kurdistanê mezin çêbibe, tenê imaret û memleket bo herêmekê tenê dixwestin.

- hin caran li hin perçeyên kurdistanê bawerya rêxistinên siyasî bi şîyanê gelê kurd nedihat, ta ku dîrbûn dinav wan û mîlet de çêbû, wek nimûne (mîna tevgera siyasî kurd li Rojava yê Kurdistanê)

- qisûrî û kêmanya di warê ragihandin û çandê de, û kêmanya di derheqê ziman û çanda bi zimanê kurdî, tevî ku kesayetiyên mîna mîr Celadet bi erkê xwe rabûn û riya durst bo me afrandin.

Îrojî û bi van guhertinên mezin yê ku li rojhilatanavî dibin, eynî van xalan hîn hene, û divaye li ser bîr karkirin.

Em pêwîstî yek helwêsta siyasî ne, û guhdanek bê sînor bi ziman, çand û keltûraxwe ne, pêwîstî bi ragihandinek kurdewarî, zanistî û netewî ne, ne tenê ragihandinek partîfî û rêxistinî.

Kongira netewî kurd wê divê mehêde bê lidarxistin, wê xweştirba heger di roja 10 mehê deba, daku me nameyek bighande cihanê, em yek mîletin û mafê me ye bi dewletek serbixwe, mîna ku berî 93salan de di peymanê Sîvr de hat behskirin.



## Bîranînên Têkoşerekî Kurd

Ehmedê Ebdirehman Axa Kurê Şahîn Axa Şûzî

Şoreşa Şêx Seîd ,...

Çûna Me Ya Iraqê ,...

Avakirina Xoybûnê

\*\*\* Wergerandin ji Rojnameya "ARMANC" jimara 5<sup>am</sup> sala 1989 \*\*\*



Xorşîd Şûzî



### Xelek – I –

bû, lê li ser xwarinê de bi bêbextî ew kuştin digel mamê min îbrahîm û sê kurmamê min,"Ebdûllah, hamid û sebrî".

Dema bavê min hate kuştin qebîla me piştî çend roja poşman bûn lê nema poşmanî feyde dike, ji ber bavê min zilamekî zana û mêranî bû, û xortekî pir çeleng û xweşik bû, umrê wî 35 sal bû.

Piştî ez mame bê dê û bav û ez zarokê 9 Salî me dijmina karê kuştina min dikirin, zilamek navê wî Ezîz bû kurê xalê bavê min bû ez veşartim di malekî de çend roja, di vê navê re xaleta min "Xedîce" pîreka şêx "huseyn Heqî" şexê botan bihîst bi kuştina bavê min zilamin bi navê şêx û bi şev di riya çiyayî ez birim Dirîşkê gundê xalê min "Remzan axa" û xaleta min hêviya min bû li cem birayê xwe, û ji wir ez birim cem xwe li basret gundê şêx huseyn (rehmeta xwedê li wa be).

Li basret ez li cem xaleta xwe mezin bûm, ewê ez xwedî kirim bi qencî û delalî, ez ji bîr nakim heya rojekî min li ser vê dunyayê heye ji ber ew diya min a bi rastî bû, û ne dihişt tiştêk ji min kêmbê, û wê qur'ana kerîm ji min

re dixwend û ez hîm dikirim kû ez bixwînim.

Pişt re wê ez dame xwendin li cem mela Mihemed melayê Basret, wî dersên "nehû û serf" ê şerî'etê dida min.

Sala 1921 ez çûm şernex ji bo xwendina ilmê dîn, salekî ez mam li wir, û pişt re ez vegeyriyam basret cem xaleta xwe, da li cem şêx Ibrahim Heqî bixwînim(rehmeta xwedê li ser ruhê wî bit). Min li cem şêx xwend heya şoreşa şêx Se'îyd ê Pîranî dest pê kir di sala 1925 de, û piştî şoreşîkê turka ew û gelek ji hevalên wî girtin û şeniq kirin.

Pişt re Mistefa kemal emir derxist kû hemû meşayix, beg û axa ên kurdistanê dîr bibin ji cihê wan û tevan rêkin nav tuka.

Dema şoreşa kurda dest pê kiri bî şêx Ibrahim Heqî xeber da bû hemû axa ên botan kû arîkarî bi şoreşê re bikin, lê mixabin geleka xwe neda ber vî barî ji nezanî an ehmeqî an ji tirsî.

Tirka şêx Ibrahim girt, lê bi şev millet êrîş kir ser hebsê û gelek eskerê turk kuştin û şêx derxistin ji hebsê. Di vî çaxî de malîyê ên şêx xwe hazir kiribûn, û me teva berê xwe da Iraqê.

Bi navê yezdaqnê pakê dilovan û mihrîban.

Ez çîroka jîna xwe ji ewelê umrê xwe heya vê rojê ji bo zarokên xwe dinvîsim, da bizanin çawa min û hevalên xwe xebat ji wlatê xwere me kir. Lê ez bi hêvîme ji wan û dosten min û xwendevanên vê çîrokê bi çavê wî wextî lê binêrin, û ez gelek sipasiya teva dikim, û ji teva re dibêjim: kurd nagihin daxwaziya xwe kû pişt hev negrin, û destê xwe nedin hev, û gotina xwe nekin yek.

\*\*\*\*\*

Xwedê ez dam li ser dinyayê sala 1907 li gundê şûz ê dikeve wilayeta sêrtê-qeymiqamiya Xezxêr. Şûz wî wextî li dor dused malî hebun û du qebîle bûn ji botan, yek jê burdiwa ez jême, û ya dî saliha pismamê mebûn. Her dem di nav wande dibendî bû û şerê hev dikirin.

Dema umrê min bû çar sal, diya min zayî bî. Piştî wê bi pênc sala bavê min Ebdirehman axa kurê şahîn axa hate kuştin sala 1916, bi destê qebîla burdiwa bi arîkariya eşîra Eruh.

Gelek ji herdû qebîlên şûz digel eşîra eruh şerê bavê min û hevalên wî kirin, û şer panzdeh roja dirêj kir, û bîst mîr hatin kuştin ji herdû kenara.

Piştî şer sekinî Aqûb axa serekê eşîra eruh digel şûziya û bavê min lev hatin, û ji edeta wan bû hevdû bixwazin ser xwarinê, û bi wî rengî bavê min xwestin jiber kû meznê wan





Sarhan Isa

Pênûsa Min îro



## Ji Serpêhatî û bîranînên min û Hirço

Di çanda rojhilata navîn de ji Kûçikan re cî û maf tune ye, ji ber vê hindê jî Kûçikên rojhilata navîn man bê çand û dîrok û hebûna wan ma tenê devikî, û nav li wan kirin Seyên har û beredayî.

Yek ji fakterên bingehîn yê ku hişt ev kotekî û bêmafhişin li Kûçikan were kirin, ew e ku li gor nirx û baweriyên Ola Isamê têkilî û xwedîkirina Kûçikan heram e. û Pêxember silav xwedê li ser bin kuştina Kûçik, Mişk, Dûpişk û hindê lawirên din helal kiriye.

Û bêguman ji ber ku Islam Ola Dewletê ye, hêdî hêdî dikaribû bandora xwe li Olên din yên herêmê jî bike, û li ser serê Kûçik, Pisîk, Mişk, Beraz û gelek lawirên din bû fermana Xwedê?

Berûvajî vê yekê li welatên rojava guhdaneke bêhempa didin Xwezayê bi giştî û van Lawiran bi tayîbet!!

Heta ku ghişte wê radeyê ku ji bo parastin, kedîkirin û guhdana wan, partî û rêxistin hatin damezrandin, û êdî Xwezaya Rojava bû xwedî dîrok, maf û yasa.

Berî ez û Hirço ji rojhilat ber bi rojava ve werin (û ew roj ne roja xêrê bê), me soz da hev ku em ê vê hezkirin û hevaltîya xwe biparêzin, çi dibe bila bibe, û kî çi dibêje bila bêje. Xwedênehiştê Hirço berî min giha, de min jî ku Hirço pir jîr e, wê çav li Kûçikên Ewropiyan bikê, û wê ji wan fêr bibê, û dest ji Kûçikaniya xwe ya berê berdê, û nema xelkê bidirê.

Dem û dewran hatin û çûn, gavek li vir yek li wir, pîrsek ji vir yek ji wir, ezbenî sêrî ez û Hirço yê xwe li kolanekê ji kolanên Ewropa pêrgî hev hatin, bû kewte kewta wî, xwe avête ber lingê min, sola min, destê min, serûçavên min alastin, û di cîyê edebê de rawestiye û li min nerî, ê de min jî ku ez bi Xwedê kim Hirço tam bûye Ewropî.

Min lê nerî, min gotiyê Hirço tu hîna Hirço yî yan jî tu bûya Hirço pa ??

Serê xwe nizim kir, ku na na ez Hirçopaaa me, ê de min got baş e,

naxwe ez jî ez ê dest bi nivîsandina dîrok û çand te bikim, belkî em karibin te bikin rêza Hirço yê Hirço pa.

Hezkirina min roj bi roj ji Hirço re pirtir û geştir bû, û bi coşeka pîr mezin min dest bi nivîsandina çand, dîrok û serborekên wî kirin.

Le tiştê ku qewimî û min dît û hate serê min, Rebî neyê serê Gurên serê çîya.

Dîntina ku min dît, ku Hirço, karwanek ji Cewrik û Kudikan (Kudik çêlikên Berazan ne) li xwe kom kirine.

Û her ku ez ber bi Hirço ve diçim, dibêje Hew Hew, û dike ku dev bavêje Gewdê min, yê ku tev hezkirina wî bû.

Hew û hew, kewt û kewt, nir û nir, zir û zir, heta ku Hirço êdî nema Hirço, bû Kûçikê Kişkiş, hema kî hestiyekî rût ditavêje ber, û jê re dibêje kişkiş xwe zerdikê min/wan/we, û ku kesekî nebînê xwe zerdikê xwe, weke Dûpişk bi xwe vedidê!?

Ez serê we pîr bi xwe û hirço yê xwe re neêşnim, di hevdîtinê me ya dawî de, min wisa jê re got:

Ne xeme ku tu Kûçik bê,  
lê zanibe tuyê kengî bireyê,  
û kengî êrîş bikê,  
û kengî dev li gewdê nêçîra xwe bikê,  
ne xeme ku tu Kûçik bê,  
lê nebe Kûçikê kişkiş.

Hew ...Hew, min ku hirço ev çîye? ma ev (şîreta Bûk û Xesiwê ye?) ku na na ez dixwazim bêjim ku şîretên te li ser serê min, û ez hirçopayê xwediyê sozê me.

Bi serê bavê min û we, hîna ez li xwe nezîvirî, dîntina min dît ku çavên wî sor bûne mîna du Fincanên xwînê, û hew.. û devê xwe yê xwehro mehro xiste xavika min, û hişt ku qêrîn û wara min ji Esîmanê hefta werê.

Ha ev kurt û puxt mistek ji serpêhatîya min û Hirço bû.

Can Kurd

Tîravêjan



## Bazara Tehran û Enqere dîsa li ser kurdan e?

Ez baş têdigihim, ku bingeha siyasetê abora welatan e, ceng jî şeweyekî tûj û tehl e ji siyasetê, hema ez têngahim siyaseta Kurdan li ser çî ava bûye û cenga wan ji bo çîye. Eger ew ceng ne ji bona serxwebûn û azadiya gelê Kurd e, ew ji serxwebûna kê re ye? Di vir de ji min re gelek şirovekirin pêwîst e, mixabin, mamhosatyên min jî, di vê mijarê de, hîn ji min nezantirin, serîvalatirin û bêçare ne.

Xala dî ewe, ku ez nema dizanim kî dostê gelê Kurd e û kî nedost e, neyar û dijmin e. Berê, me neyar û dost ji ser hev derdixistin, lê niha êdî giş tev li hev bûne. Ewê ku em dijmin dibînin ji me re bûye piştvan an bûye azarvan û rênas. Ji wan jî du neyarên mezin ên gelê Kurd: Tehran û Enqere. Ji ber ku siyasetmendên rojavayê Kurdistanê diçin Tehran û diçin Enqere, û wan mîna dostan dibînin, bi wan re li ser her mijarekê dipeyivin, wekî pîr ji zû ve destbirayên hev bûn. Qey siyaseta me Kurdan pêşkeftiyê û dikane di zikê hefteyekê de neyaran bike dost? An jî neyarên Kurdan ewqas zîrek û zanatir bûne, ku bo Kurdan dibêjin: Qedera me û we bi hevdu ve girêdayî ye, ji niha pê ve em dostên hev in ne neyar û em nema we qir dikin an we binzor û bêmaf dihêlin.

Çûyîna hêja Salih Muslim bo Türkiyê, ku yek ji sêbirka serokatiya PYD ye, bûyereke seyr bû. Ji aliyekî ve vê partiyê her Kurdekî biçûya Türkiyê, ji xwe re wekî dijmin didît û di nêv gelê me de ew wekî ajanekî xiniz dida şeqlêkirin, û ji aliyekî ve çûyîna xwe wekî serkeftineke diplomatî dida xuyakirin. Min piçekî ev listik, dora çend rojan da ber şeyê nasyariyê û pîvanên diplomatî, min qehfê xwe di ber wan hiziran re gelek caran xurand, û guvêşkên xwe guvaştin û paşê min ji xwe re got: Te tiştêk ji vê lîskê nas kir, de rabe here xwe bavêje nav baxê xwe û li ser geyayê piçekî rakeve, lê diho, gava min bihîst, ku qumandarê pêşîn ê PKK, hêja Cemîl Bayîq gotiye, ku serok

serok Cemîl Bayîq gotiye, ku serok arzanî bi Türkan re neyartiya gelê me li rojavayê Kurdistanê dike, êdî ji nişka ve dilê min hat girtin û min got: Bêguman dîsa şehtîna „kirîza“ xetimîna damarên dilî li ba min dest pêkir.

Ez dîsa bi vê mijarê gêro bûm, lê min nikanî bû ji xwe re şirove bikim. Salih Muslim wekî em dizanin ji paytextê Kurdistanê diçe Enqere, eve jî bê zanîna deselatdariya wir nabe, û ji pişt ve rêberekî mezinê PKK hîn Türkiyê wekî „neyar dizane“, PKK dayîka PYD ye.

Qey wilo dibe, û çewa Salih Muslim diçe bi neyaran re dipeyive? Li ba Ereban ji vê yekê re „*Têkiliya bi neyar re*“ dibêjin, û ew kesê ku bi neyaran re dipeyive, êdî xayîn e û têye tawanbar kirin, belku darvekirin jî.

Fermo, hêja Salih Muslim, tu vê yekê zelal bike.

Çendîn ev mijar giran be jî, dîsa em dikanin dilê xwe sar bikin, û ji xwe re bibêjin: Eve gaveke diplomatîk bû, di demekê de tê, ku rewş li Sûriye wêrantir bûye û Türkiyê dixwaze bercewendiyên xwe yên aborî – siyasî di herêmê de xortir bike, Kurdan ji Îran û sîstema Esedê Sûriyê bidûrxîne. Lê ev serlêdana dî ya çûyîna Tehranê çî serlêdan e? Qey Îran jî, ya ku partiya PJAK bédeng kiriye û berî wê yekê bi sedan kur û kiçên me Kurdan dane kuştin û darvekirin niha bûye dostê me? Ma bercewendiya wê ya aborî bi rojavayê Kurdistanê re wekî ya Türkiyê heye û heta çî pileyê heye? Eger abor- mabor di vir de tune ne, ev serlêdan bo çîye? Bo siyasetê? Ma qey partiyêd me ta niha nizanin siyaseta melayên Îranê di her warekî de çî siyaset e? An bazareke dî, ya wekî dema cenga sar heye, û ji nû ve di navbera Türkiyê û Îranê de li ser Kurdistanê heye?

<http://cankurd.wordpress.com>

[kurdistanicom@yahoo.de](mailto:kurdistanicom@yahoo.de)

**Hoşeng Broka**

hoshengbroka@hotmail.com



## „Kongreya Neteweyî a Kurdistanê“

Ev bû dora çend mehan, ku dengûbasên „Kongreya Neteweyî a Kurdistanê“ rojeva Kurdan, a siyasî, rewşenbîrî, hunerî, dînî, dinyayî...htd., dagîr kiriye. Her kes, bi her kesî re, li her demê û her cihê, êdî basa vê kongreya dahatû dike .

Dengûbasên destpêkê yê rûniştinên destpêkê, ji Hewlêra destpêkê, wek „gava destpêkê“, Kurd û Kurd, partî û partî, rewşenbîr û rewşenbîr û herweha Kurdistan û Kurdistan, pirr bi geşbînî hatin pêşwazîkirinê. Ji „yekkirina gotar û stratejiya Kurdî, li sera asta herçar aliyên Kurdan“, ku yek ji armancên herî sereke yê vê Kongreyê ye, heta bi „azadî û serxwebûna Kurdistanê“, wek xewneke bi Kurdî mezin, Kurdan bi hemî deng û rengên xwe ve, hêvî li ser vê „gava bi Kurdî mezin“, girêdan.

Lê diyar e, ku wek hercarê di vê kongreyê de jî, dê hesabê „sûka Kurdistanê“ û „mala Kurdan“, li hev dernekeve. Nîşana herî nêzîk û berz a vê „nelihevkirinê“ jî, bi ya min, du faktor in:

1. Derengman û gîrokirina kongreyê a berdewam, ku ev bû du car tê bipaşvexistinê.
2. Nelihevkirina hin aliyên Kurdan yê siyasî (wek PKK û PDK) di hindê xal û pirsgirêkên giring de, ku di van du sal û nivên dawî de, rojeva Kurd û Kurdistanê dagirtine. Pirsgirêka herî sereke jî, li vir, ku mirov dikare eşkere û vekirî, li ser asta van „nelihevkirinan“, destnîşan bike, Pirsgirêka Rojavayê Kurdistanê ye.

Jixwe nîşana herî diyar a van „nelihevkirinan“ di navbera van herdu hêzên Kurd yê mezin û bi bandor de jî, „şerrê ragihandinê“ ye, ku di van hefteyên dawî de, her aliyek dixwaze, gotara aliyê din di Rojavayê Kurdistanê de, „pûç bike“ û herweha mantiqê wî ê siyasî „vala“, „nerewa“ û „li dij berjewendiyên Kurdan ên bilind“, derbixe.

Dibe ku „Kongreya Neteweyî a Kurdistanê“, nêzîk yan dernege, were lidarxistinê, yan jî bo „Kurdistanêke din a „gîrokirî“, ji „Kurdên gîrokirî“ re, were gîrokirinê.

Lê pirs a ku dê tim wek pirs a vê kongreyê di Kurdistanê de, û herweha wek pirs a Kurdistanê di vê kongreyê de, bo Kurdan bi mîne, bi ya min, ev e:

Aya bi rastî Kurdên siyasî, li her çar aliyên Kurdistanê, amade ne, ku Kurd di Kurdistanê de, û herweha Kurdistan di Kurdan de, bi bin yek: yek stratejî, bo yek Kurdî, di yek Kurdistanê de?

Bi qasî ku ez dibînim nexêr: Ne Kurd, bi qasî ku siyasî wan yê rojane dibêjn, îro roj, dikarin bibin yê wê Kurdistanê, û ne jî Kurdistanê wan dikarin bi bin yê wî Kurdî.

Jixwe Rojavayê Kurdistanê, wek fakt û realîte, wa li ber çavan e.

Kurt û Kurmancî, rêya „Kongreya Neteweyî a Kurdistanê“ di Rojavayê Kurdistanê re, derbas di be.

Lihevkirineke Kurdî a serkeftî di başûrê „Kurdistan kongreyê“ de, di serkeftineke Kurdî a lihevkirî, di Rojavayê Kurdistanê re, derbas di be.

Lewre, berî ku Kurd herin Hewlêra „Kongreya Neteweyî a Kurdistanê“, di Kurdistanêke mezin de, ku hîn „xeyaleke mezin“ e, yekîtiyeke bi Kurdî ragihînin xelkên xwe, pêwîst e berî wê, herin Qamişlo di Kurdistanê Rojava de, bi bin yek.

Rêya yekîtiya Kurdan a neteweyî, îro roj, ji her demê bihtir, berî Amed, Hewlêr û Mehabadê, di Qamişlo re, derbas di be .

Yan dê Kurd û Kurdistan dê vê kongreyê de, li Qamişloka nêzîk bi bin yek, yan jî her Kurdistanêk dê here maka xwe, û Kurd dê di kongreyê nêzîk de, li Amed, Hedwêr û Mehabadê, qet nebin yek .

**Arşevê Oskan**



## Çîrok in pir kurt

### Kuştin

Dema bavê min bi destê serokekî hat kuştin, min zû gazî bir ser termê wî, lê dema min term dît, ez veciniqîm ...!?? .

### Derya

Min avjeny a pêlan pir hêsan didît, lewra min biryar da ku avjen bibim, dema min serk avêt nav pêlê, derya ez daqurtandim ... !?? .

### Seyran

Ez û wê çûn seyran zewiyekî xemilandî ji sorgulan, lê ku em gihiştin, em nehatin pêşwazîkirin, lê pir dereng em li xwe hayê bûn ...!?? .

### Xeyd

Hêvî silav li min kir û berê xwe guherî, min da pey wê û çûm û çûm û heyani niha jî ez derim, da nasbikim çima xeyidî ...!?? .

### Bilûr

Rojekê min ji bazarê bilûrek kirî, li wir dengê wê pir xweşbû, lê ku min li malê lêda, ez dilgeş nekirim, min ew li erdê da û giriyam ...!?? .

### Nêçîr

Çûm nêçîra kiroşkekî sor, hemû kiroşkên çolê bi min re hatin malê bi saxî, lê tajî hemû xeyidîn ...!??

### Tirs

Di polmanê de xulmaş bûm, min xewn dî ku polman diqulipî, min kir hawar û gazî, ajovan ji min tirsîya û xwe di rê werkir û em hemî hatin kuştin ...!?? .

### Mendal

Temen du mehî peyvî û şîret li me kir, diya wî benîştê xwe dicût û dikeniya, kalemêrekî got: Xew nema li çûka, heya nema li bûka ...!?? .

### Dadgeh

Mêr û jin çûn dadgehê da peyman zewaca xwe mor bikin, dadmend ji jinê xwest ku doza berdanê bike, da zewac bê mor kirin ... !?? .

### Zewac

Yek ji xwe re xwest û şahiya xwe pêkanî, bûka xwe siwar kir, lê ku derbasî cem wê bû, dît ku bûk hatiye guhertin ...!?? .



Amadekirin: *Ezîz Xemcivîn*



Celadet Alî Bedirxan

Bi navê Yezdanê pak ê dilovan ê mihrevan

## NIQTEŞANÎ

Bingehên gramera kurdancî (xeleka 3an)



30- Qiset bi hin nîşandekan ji hev dibe. Ev nîşandek dawî û birên komekê pêş me dikin . Bi danîna van nîşandekan mana qisetê çêtir li hev bi der têt. Ji usûlê danîna nîşandekan re niqteşanî dibêjin. Ji milê din em bi niqteşaniyê , di dema xwendinê de cihên rawes û vêsîhê jî dizanîn û li gora nîşandekan, cih cih û kêr û zêde disekin û bêhna xwe didin.

31-Nîşandekên niqteşaniyê ên bingehîn ev in:

- { } Niqte
- { } Bihnok
- { } Niqtepirs
- { } Niqtebang
- { } Niqtecot
- { } Niqtebihnok

Ji van pê ve çend nîşandekên din hene ko em wan kêr caran dixebitînin; û wezîfa wan ji ên jorîn cida û bi awakî din in.

- { } Kevanek
- “ ” Dunik
- \_ Xêzek
- Bendek

**Niqte** - Niqte paşya komekê şanî dide. Ji lewre gava komek tamam dibe li dawiya wê niqteyek tete danîn: Hêv tariya şevê diedilîne.

Bi reşandina avê şewat tete vekuştin.

Bedena Diyarbekrê bedeneke kevnare ye.

Xwîn bi xwînê nayê şuştin.

**Niqtepirs** - Niqtepirs dikeve paşya komekên pirsyarê. Ji manê pê ve ew jî reng û dengê pirsyariyê dide qisetê: Genco kengê ji welêt hatiye? Hevînd çî dinivîsîne ? Te çend kew kuştine? Kî ji derincê de ket ?

**Niqtebang** - Niqtebang dikeve ber baneşanan û li paşya komekên baneşaniyê. Ax! ez çiqas têşim ! Binve kezeba min; binve lo lo ! Way li min ax ezo ! Xwedêyo ! tu bi rehma xwe kî.

**Niqtecot**- Gava li ber komekê tiştê tete gotin an hejmartin; niqtecotek dikeve paşya komekê. Bavekî di dema mirina xwe de ji zariwên xwe re got: zarono! ez ji we re navekî pak dihêlim; qedirê wî bizanin û wî weke xwe hilînin. Mirovê hêja bi sê tiştan hêja ye: mêranî, xebat û comerdî.

**Niqtebihnok** - Niqtebihnok dikeve navbera wan hevokên ko bi hev re girêdayî ne û mana hev diedilînin û wê dibin serî. Dewlemendî bi hinarê ye; ne bi mal û pereyî ye.

**Bihnok** - Bihnok dikeve navbera wan bêjeyên ko di komekê de dane pey hev û bi gihanekekê ne hatine girêdan. Di vî halî de bihnok, bi awakî cihgirtiyê gihanekekê ye. Ji milê din ev nîşandek dikare bikeve navbera birên komekê ên kiçik jî. Bi şertê ko bi danîna wê mana komekê neyit guhartin. Temo, Cangîr, Hevînd û Ferzende brayên hev in. sor, spî, kesk û zer rengên ala me ne. Mirov bi axaftin, nivîsandin û xwendinê ji heywanan tete ferq kirin. Kurên min, hon çire bi ya min nakin û bi ya xelkê dikin. Em hemî, emê herin şerê welêt. Belê, ez jî, ezê bi we re bêm.

32-Rewes û vêsîh. me gotibû ko nîşandekên niqteşaniyê, di qisetê de cihên rewes û vêsîhê jî şanî me didin. Herçî niqte ne cihê rewesê ne; yanî di wan de mirov qederekî disekine. Herçî bihnok û niqtebihnok in cihê vêsîhê ne; û di wan de em hindik disekin in. Vêsîha bihnokê ji hemiyana kurtir e.

33-Nîşandekên mayîn.

**Kevanek** - kevanek li pêşî û li paşya wan pirsan tete danîn ko bi sebebê ketine komekê û heke jê hatine hilanîn mana komekê ne kêr dibe; û ne jî diguhêre.

**Belayê** {wê nexweşiya xedar } ez gelekî êşandim. Segmanên me hemiyana {qederê bîst û pênc mêt} li rêlê wer hatine û şergeh girtin.

**Şanek** -Li şûna kevanekan mirov dikare xêzikan jî bêxe.

**Belayê**- wê nexweşiya xedar - ez gelekî êşandim. Segmanên me hemiyana- qederê bîst û pênc mêt- li rêlê wer hatin û şergeh girtin.

**Dunik** - Dunik dikevin pêşî û paşya wan pirs û komekên ko mirov wan ji derve dîtine û tete qisetê. Te ne bihîstiyê ko dibêjin:”her tişt bi zravî dişkê; mirov bi stûrî”.

Ehmedê Xanî ji bo kitêba xwe gotiye:

Ev mey we eger ne avdar e

Kurdancî ye ev qeder li kar e

**Xêzek** - dema ko qiset dikeve şiklê axaftinê û carê ko xeberbêj diguhêre; li pêşya gotinê xêzekek tete danîn;

Mizgînî dan kerê û gotinê:

-Dehşik ji te re bû.

Kerê li wan vegerand û got:

-Êmê min kêr, barê min zêde bû.

**Bendek** – Bendekê datînin navbera du bêjeyên ko di navbera wan de hogiriyek heye.

Kariyê – belek

Kariyê – kelehê

Birca – belek

Bedir- Xan.

Ji milê din gava ji kêmbûna cih kîten bêjeyê ji hev de dikevin ev nîşandek wan kîtan bi hev re girêdide. Hingê bêje dibe du perçe; perçekî wê di dawiya xêzekê de dimîne û perçê din dikeve pêşya xêzeke nû.

Gava ev bêgavî tete pêş, divêt bêje kît bi kît ji hev bêne xistin; bêyî ko tîpeke kîtê jê bibe û bikeve xêzeke din. Mesela heke {nermijandin} kete paşya xêzekê û tete de cih ne bû; ev bêje bi vî awayî tete birîn: {ner mi jan din} î ji van çar kîtan hin divêt bikevin paşya xêzê û ên a mayîn pêşya xêza nû, bêyî ko ji tîpên her çar kîtan ne tu jî ji hev bibin.

*Dûmahîk heye...*

*Kemal Tolan*

## ERDÊN ÊZDIYÊN LI BAŞÛRÊ ROJAVAYÊ KURDÎSTANÊ (Sûriyê) KURTIYEK JI DÎROKA CÎH Î WARÊN ÊZDIYÊN LI

BAŞÛR-ROJAVAYÊ KURDÎSTANÊ (binêre li:\*)

... Xelek – 1 –



Li gorî lêkolînên hinek dîrokzan, di wextê salên nêzî 1500 B Z de, li derûdora çiyayê Araratê û ser erdê Kurdîstanê îro Împaratoriyeke xurt bi navê Xaltîyan hebûye.

Dîrokzan dibêjin: “Xaltî di sala 1500 B.Z de li Araratê û Kurdîstanê navîn de ferweraniya Xaltî serrast kir. Ferweraniya Xaltî jêhatî, tûwana, hişdar û cengawer bû. Tospa- (Wan) paytexta Xaltîyan bû. Paş ku Xaltî li Araratan û li Kurdîstanê navîn bi cî bûn, pir ne çû baş xurt bûn, erdê xwe fireh kirin, gihştin Antî Torosan û milekî wan xwe gihande deryaya Reş. Îro bixwe li Kurdîstanê, li gelek ciyan bermayên Xaltîyan hene.(13:55-57)”

**Min jî di lêkolîna xwe ya bi navê, “Êzdiyatî haveynê mirovatiya li Mezopotamiyayê ye, Urartu anjî Orarto yan pêşiyên Êzdiyan Xaltîya ne? (Binêre li çavkanî:14)” de, daye xwanê ku heta niha hêjî ev navê Xaltîyan di nava kurdên Êzîdî de hatiye xwedîkirin û hêjî piraniya me Êzdiyan xwe Xaltî dihesibînin. Îro çend eşîrên Xaltîyan mane û niha hêjî li kurê dijîn?. Bersiva vê pirsê Binêre li kitêba K.Tolan: “Hebûn û Tûnebûna Êzdiyan tev romanên zindî ne”.**

Wekî dinê jî, raste ku li ser vê Împaratoriya Xaltîyan gelek lêkolîn hatine kirin û her yekê bi sedemên başe başe û gelek jî wan jî ne xwastine wê Împaratoriyeke bi kokeke Kurdan ve girêbidin. Li gorî baweriya min çend egerên wan ne gotine jî ev in:

- Piraniya lêkolînavan ji miletê cînar bûne û ne xwastine wê bi kurdîtiyê ve girêdin.
- Xweya ye ku kêma kesan jî wan haj jî kevnepên Xaltîyan yên ku di nava Êzdiyan de hêjî tene parastin hebûye.
- Gelek jî wan jî ne xwastina kevnariya dîne Êzdiyatîyê kifş bikin.
- Herçiqas hineka jî wan ne xwastine bi hemda xwe di berhemên xwe de bahsa desthilatdariya li Êzîdîxan û Kurdîstanê bikin jî, lê gava ewan bahsa ol û netewên li Mezopotamiyayê kirine, wan nikarîbû bêyî bahsa rewşa kurdên Êzîdî gelek tiştan diyar bikin. Weha gelek jî wan mecbûr mane, bahsa xesar û zilma wan şerên jî bo serkeftina metîngehkar, neheqî û zordariya di wexta destpêka ola Zerdestî, Yahûdî, Xirîstîyanî, Musilmanetî û yên wekî dinê hatine li nava Kurdîstanê bela bûne, her wusa bahsa zilma Şah, Xelîfe, Sultan, Paşa, Mîr, Beg, Walî, Axa, Jendirme û berpirsyarên hemû baylozخانên dewletên dagirker ku li kurdên Êzîdî kirine bikin.

### • Û h.w.d.

Jixwe, ji ber wan kêmasî û neheqiyên di dîroka me de, gelek cûdatî û nezanî jî ketiye nava me Kurdên Êzîdî û Musilman. Her weha hêjî gelek nêrîn an jî agehdariyên ne rast li ser cîh-war û baweriya dîne Kurda ye herî kevn tene belakirin. Ez bawer nakim êdî, ku tu kes jî me û dostên me dikaribe temamiya kronolojiya dîroka Êzdiyatîyê birêz bike .

**Herçiqas ne bi temamî û bi kêmasî be jî, ez dixwazim niha dîsa bi alîkariya Zargotinên me û hinek berhemên dîroknas û lêkolînavan, çend nimûnan li ser kronolojiya dîrok û rewşa Êzdiyan Sûriyê nêrîneke xwe diyar bikim.**

Em dibînin, gava Împaratoriya Xaltîyan hilweşiyaye, ew Êzdiyan li hemû deverên Mezopotamiyayê û yên li derûdora Şam-Helebê jî ketine bin bandora gelek Împaratoriyan (yên weka ya Kasiyan, Mîtanîyan, Nehriyan, Mûşkiyan, Urartuyian, Mannaiyan, Mediyân, Sassaniyan, Bîzansiyan û whd.) dinê.

Di zargotina me de xwanê ye, wexta ku Kurdîstan bi sînoren dewletên dagirker bûye çend perçe û şûn de jî, dîsa çûn û hatina di nava Êzîdîxanê de hebûye. Ji xwe di wê demê de Êzîdîxan ji Êzîdîyan dagirtî bûye û Mîrê Êzîdîxanê, hingê li gorî rewşê Êzîdîxan kiriye heft herêm û her herêmêk Tawisek bi navê wê kifş kiriye. Mîrê Êzîdîxanê, ji bo hevgirtin û xwedî kirina Êzdiyatîyê, hersal ew Tawisên sembolê dîne Êzîdî didan destên qeflek qewal-koçekan û ew dişandine nava gund û bajarên Êzdiyan.

Her sal yek jî wan Tawisên sembolê Êzdiyatîyê diçû nava Êzdiyan li derûdora Helebê.

Gava em li zargotna me birênên û ji vê “ Qesîda Şêx Mend” fahm bikin, emê bivînin ku demên berê çûn û hatina di nava bajarên (Heleb, Mêrdîn, Ruha, Bozan, Cizîr, Laliş û whd.) Kurdîstanê de gelekî hêsan bû .

### “ Qesîda Şêx Mend”

Seydî îro min dîtîbû ciwan e

Di dilê min da bû hizneke giran e

Seydî suniya pê çu bû Dîwan e

Seydî min çî mirand

Seydî heca sor e

Mîr ji Mîra vavire

Şîxadî Şêx Mend xelatkire

Sindirûka sor û sipî ye

Ji Helebê der aniye

Seydî Şîxadî li ber di çî ye

Sindirûka sor û zer e

Ji Helebê hate dere

Seydî Şîxadî çu bere

Sindirûka Zêrîn e

Ji Helebê der tîne

Wesilandine Mêrdîn e

Wesilandine Ruhayê

Feqîra şehde dayê

Sindirûka kesk e hatine hewayê

Sindirûka kibîr e

Şêx Mend tabûteke kibîr e

Vêra kirbû feqîre

Wesilandine Cizîr e

Sindirûka giran e

Şêx Mend tabûtake giran e

Şêx Mend Fexan e

Wesilandine Bozan e

Sindirûka bi neqş e

Şêx Mend tabûtake bi neqş e

Vêra kirbû dileq reş e

Wesilandine Laliş e

Wesilandine Samedrê

Welîyo xudanê Hekarê

Seydî Şêx Mend xelatkir vê carê (15:167-168)”

“Şêx Mend ê Ferxa, kurê şêx Melek Fexredîn e û ev jî kurê Êzîdînê mîr e. Hukumdarê Helebê buye. Dema dilmayîn di navbera Şêx Hesên û Şêx Şems da çê dibe, ew ji Helebê tê wekî wana li hev bîne. Navê wî carna datînin rex navê Şêx Adî û Şêx Şems. Carna dibêjin Şêx Mend Padşah. (19:159-160)”

Piştî mîtolojiya Êzdiyan, Şerexanê Bidlîsî jî di derheqê Şêx Mend de weha dibêje : “Di destpêka sedsala sêzdehan (1200) de (3:201-),”

“Fermanrewayên mezin ên Al-i Eyyûb, eleqeyek zêde didine Şêx Mend û wî dikine mîrêmîran ên hemû kurdên li Şam û Helebê.

Nav û dengê Şêx Mend li nahîya Quseyrê ya nêzîkî wilayeta Antakyayê roj bi roj belav dibe. Bi vî awayî rutbeyên herî bilind ên eskerî û îdarî jê re hatin dan. Bi vî awayî jî her milî ve kurdan berê xwe dan balê; ji bilî vê, kurdên li aliyê Cum(EFRÎNÊ k.t) û Kilîsê rûdiniştin jî hatin û ketin bin siya parêzgeriya wî..(1:250)”

“Kurê Şerfedîn, Zeyneddîn Yûsuf hatiye li Şamê bicîh bûye û çûye gundê Beyt Far ciyê bavûkalan. Dûre Zeyneddîn Yusuf ji virê diçe Kahîrê û li wirê di sala 1297 de diçe ser dilovaniya xwe. Piştî mirina



mirina Zeyneddîn Yusuf, êdî kurê wî Îzzedîn desthilatdariya bavê xwe dimeşîne. Îzzedîn bixwe jî di sala 1330 de ji aliyê sultanê Misrê ve têye hepiskirin û di zindana wan de diçe ser dilovaniya xwe. (11:59 û 12: 15)”

Em dibînin wexta nivîskarê tirk Evliya Çelebî di sala 1640 de bi apê xwe Sadrazam- Mustafa Paşayê Osmaniyan re dertê seferê, ewî hingê êrîşên ser herêmên Êzdiyan bi çavên serê xwe dîtine.

Lê Evliya Çelebî, di “seyahatname” xwe de gelekî bi neqencî bahsa Êzdiyên hingê dike û carekê ji mecburî dibêje: “Yezîdî jî weke Mervanî, Tiymanî, Hobarî, Marûfî, Zeydanî, Durzî û whd. ê li derûdora çiyayên Şam-Trablusê belabûn.(2:156). Dema Sultan Tîmur Han (yê ku di sala 1394 de herêmên Kurdistanê wêran dikir û xesareke mezin dida hemû kurdan -6:46- k.t.) bihîstiyê ku xelqê li Şamê dimîne tevde Yezîdî ne, ew hatiye Şamê û hemû Yezîdî, Durzî, Tiymanî û Mervanî hatine xwe avêtine Sultan Tîmur Han. Her Xwedê tenê zane bê ewan çiqas mal û pere ji Sultan Tîmur Han re anîne. **Li gorî gotina Tuhfe; şeş hezar pirîketên zêr, şeş hezar pirîketên zîv yên ku heryekê giraniya wan weke 10 okka** (giraniya okka yekî = 1283 gr bu .k.t) **giran, heşt barên hespan û şazdeh barên hêstiran bûn. ... ber dewam** (2:316 û Binêre li 11:93-96) .”

“Wexta Yavuz Sultan Selîm di sala 1516-7 de leşkerên artêşa Misirê şikandin, ewî desthilatdariya herêma Halep û Şamê xiste bin destên xwe. Di vê demê de Îzeddîn begê Êzîdî -neviyekî şêxên Êzdiyan-1:251- û ji binemala Şêx Mend.e k.t-) serokê mîrgeha herêma Kilîsê bû.(11: 87-88 û 7:295)”

“Ji dewrana siltan Salehedînê Eyûbî, heta hatina Osmaniya sala 1516 a malbata Şêx Mend û malbata Şêx Bekir(ji ber ku ji malbata Şêx Mend kesekî usan nema mîrtiyê bike, mîrtî kete destê binemala Şêx Bekir û ewî heta sala 1530-î mîrtî kir.19:111), ku herdu jî êzdî bûn mîrtiya devreke mezin dikirin, ku Kilîs, Maraş, Hema û Malatiya jî diketine nav. Siltan Selîm dema êrîşî çerkezên Misrê kir, wî hevaltiya serokên êzdiya, bi taybetî mîrê Kilîsê Qasim xwest, ku ji binemala Şêx Mend bû. Piştî serketinê wî serokên kurda, ku piştgirina wî kiribûn, vexwandine Îstembolê. Mîr Qasim û kurê wî Canpolat jî di nav vexwandîya da bûn.

Siltanê Osmaniye mîrgeha Kilîsê da Canpolat, ku heta sala 1564-a mîrtî kir. Ji wê dewranê da ew mîrgeh bi navê Canpolatiya hat naskirin. Piştî Canpolat kurê wî, Cefer Beg bû mîr û çar sala mîrtî kir. Pey Cefer beg ra dutîretî kete nav malbata Canpolat. Kurê Canpolat Hebib beg derket. Ew çû Kilîsê pareke deverê kire bin destê xwe, derê girtîgehên bavê xwe gişkan vekir û girtî aza kirin. Paşê wî ew şandin bal siltan , wekî giliyê birê wî bikin. Lê siltan piştgirîya Hisên beg kir. Sala 1001 koçî(1592-93z) bi fermana siltan navê paştîyê dan Hisên beg û ew bû Hisên paşa.(19:111)”

“Çiqas jî hinek malbetên Durzîya, yên bi nav û deng pêşiyên xwe ereb dibînin, lê bi zaniyarî hatiye mak kirin, wekî eşîrên Men, Cumbûlat, Arslan û gelekên mayîn bi koka xwe va kurdin(Philip K. Hitti,rûp.21.). Navê eşîra Cumbûlat jî navê Canpolat tê, ku ji malbeta Şêx Mend e.(19:96)”

“Colbert’e, wezîrê maliya(derayîya) Fransa yê, hêja di meha nîsanê ya sala 1670 an de bahsa hevkarîya bi Êzdiyan re dike û soz dide ku, çi gava dujminên kiraliyeta Fransayê êrîşî ser hêzên Fransayê bikin, ewê hingê ji nava Êzdiyan 30 hezar merivî ji bo alîkariyê bişîne.(11:102)”

“Konsolosê Fransayê Joseph Dupont Cizvit, bahsa tîkiliyên xwe yên bi Êzdiyên li Cebel Sem’anê re berdewam dike û diyar dike ku gava Marquis de Nointel, niwêner(elçî)ê dewleta Fransa yê di sala 1674 de hatiye mêvaniyê, ewî bi reîsên Êzdiyan re civînek çêkiriye.(11:106)”

“Civata Êzdiyên li rojavaya Helebê û li derûdora çiyayê Cebel Sem’an ê nasnama xwe hêjî (sala 1875) parastine û gelek geryokên xerîban jî hatine li wan bûne mêvan. Merivên di van gundan de dijîyan, mecbûrbûn herine eskeriyê. Piraniya kesên ku dişandine leşkeriyê, diçûn nava garnîzona li Yemenê û çiqasên ku diçûn leşkeriyê jî qet venedigeriyan. (Binêre li nama 11:241)”

Wekî ku di hinek berhem û lêkolînên dinê de jî xwanê dibe (Binêre li çavk.:3, 8, 9, 10 û bi taybetî jî li wan name û çavkaniyên ku di çavkaniya 11 an di rûpelê: 85 heta 113, 232 û 241 an de hatine kifş kirin), ji destpêka sedsala 17 an heta dawîya sedsala 18 û 19 an gelek dîroknas, lêkolînvan, niwêner(elçî) û baylozhan(konsolos)ên welatên rojava (Ewropa) yê jî hatine li Êzdiyên Cebel

Sim’an (EFRÎNÊ) bune mîvan. Geleka ji wan di berhem û namên xwe de bahsa sedemên mîvandariyê, hevkarî, astengî û zordariyên Êzdiyan kirine û diyar dikin ku kesî zû bizû nikarîbûye reîs û begên Êzdiyan bi qelibînine ser dîne Xirîstiyânî û Musilmanetiyê.

### Wêne :27

Êzîdînas û nivîskarên Êzdiyan

(Eskerê Boyik, Pîr Xidir Suleyman

û whd.) vêga hêjî zindî dibêjin ku,

yek ji wan Tawisên sembolê

Êzdiyatiyê ji bo Êzdiyên li

derûdora Helebê (EFRÎN, Hama,

Kilîsê, Tirbespiyê, Qamişlo,

Amûdê û heta herêma Serê

Kaniyê) diman hatibûye ve

qetandin û lewma hêjî li

Lalişê navê wê Tawisê

“ Tawisa Helebê” ye.

Li gorî di nivîs û agehdariyên ku Mala Êzdiyan ya li bajarê Oldenburgê de hatiye kifşkirin; “hêjmara malbatên Êzdiyên li bakurê Sûyriyê yên heta sala 1990 hêjî 12 232 aîle bûne (yanî li derûdora Amudê: 2178, Qamişloyê: 2251, Ras al-Ain:2354 û Hassaka: 5444 neferên Êzîdî hebûne.(4:2)“ Vêca, ka hêjmara Êzdiyên li Sûriyê çiqas e ?. Ev jî valeyê û ciyê lêkolînê ye.

**Herêmên Êzdiyan yên hêjî li derûdora wîlayeta Hessekê ev in:**

1. Herêma Tirbespiyê (Nr.:1.Al-Kahtaniye) û Qamişlo (Nr.:2.Al-Qamihsli)
2. Herêma Amûdê (Nr.:3.Amudeh)
3. Herêma Hasakah (Nr.:4. Al-Hasakah)
4. Herêma Serê Kaniyê (Nr.:5. Ras al- Ain)

### Wêne: 28

ÊZDIYÊN LI HERÊMA TIRBESPIYÊ Û QAMIŞLOYÊ LI VAN GUNDAN DÎMAN

Navên gundên wan ev in :			Eşîrên lê diman : Li gorî çavkanî 3. Rûp.:194			
Li gorî ser xerîta çavkanî 4.Rûp.:19. Nr.:		Li gorî çavkanî 3.Rûp.: 194		Ji eşîra Hewêrkan	Çend Mal in ?	Xwedanê wan
1	Mizgeft	3a	Mizgeft	Dasikan		
2	Gurkê Şamo	5b	Gurkê Şamo	Behcolan	5	
3	Otelce	5a	Ulticiyê	Kîwaxî	25	
4	Calhumiye	2	Selomiyê	Efşanî		
5	Tall Xahtunk	4	Tell Xatunk	Behcolan		
6	Ala Reş	6				
7	Mel Abas	3b				

„Piraniya Êzdiyên ji eşîra Hewêrkiyan û hinekên ji eşîra Hesenaniyan di wexta serhildana kurda ya sala 1925 de şikestiyê , hatine vê herêma Qamişlo û Tirbespiyê.(3:194)“

### Wêne: 28

ÊZDIYÊN LI HERÊMA TIRBESPIYÊ Û QAMIŞLOYÊ LI VAN GUNDAN DÎMAN

Navên gundên wan ev in :			Eşîrên lê diman : Li gorî çavkanî 3. Rûp.:194		
Li gorî ser xerîta çavkanî 4.Rûp.:19. Nr.:			Li gorî çavkanî 3.Rûp.: 194		
	Ji eşîra Hewêrkan	Çend Mal in ?	Xwedanê wan		
1	Mizgeft	3a	Mizgeft	Dasikan	
2	Gurkê Şamo	5b	Gurkê Şamo	Behcolan	5
3	Otelce	5a	Ulticiyê	Kîwaxî	25
4	Calhumiye	2	Selomiyê	Efşanî	
5	Tall Xahtunk	4	Tell Xatunk	Behecolan	
6	Ala Reş	6			
7	Mel Abas	3b			

„Piraniya Êzdiyên ji eşîra Hewêrkiyan û hinekên ji eşîra Hesenan di wexta serhildana kurda ya sala 1925 de şikestiyê , hatine vê herêma Qamişlo û Tirbespiyê.(3:194)“

**ÊZDIYÊN LÎ DERÛDORA AMÛDÊ LÎ VAN GUNDAN DÎMAN**

Navên gundên wan ev in :			Eşîrên lê diman : Li gorî çavkanî 3. Rûp.:194		
Li gorî ser xerîta çavkanî 4.Rûp.:19. Nr.:			Li gorî çavkanî 3. Rûp.:193-194		
	Ji eşîra Şerqiyar	Çend Malên ?	Xwedanê wan		
1	Til Hişk	29	Tell-Asq	Hadiyan	10
2	Kerengo	34b	Kerengo	Su anî	25
3	Merkeb	31	Merkeb	Su anî	30
4	Xerbê xweh	28	Xerbê xweh	Su anî, Turunan	15
5	Kulyê	30	Qulî	Dinaî	15
6	Cetele	36	Çetel	Dinaî	50
7	Dugerki	35	Du Gûr	Su anî, Dinaî	25
8	X. Xezal	27	Topo	Su anî	10
9	Kislacuk	33	Ayn Afâr	Dinaî	15
10	Gondor	34a	Qizil Acox	Dinaî	20
11	Xerbê Feqîra	32	<b>Soxan</b>	Belluxan	30

**ÊZDIYÊN YÊN LÎ DERÛDORA HASSAKAH LÎ VAN GUNDAN DÎMAN :**

Li gorî ser xerîta çavkanî : 4. Rûp.:19.			
Navê Gund	Nr.:	Navê Gund	Nr.:
Xirbê Xidir	7	Tell Teyr	15
Tell Tewil	8	Gumar	16
Suleymanî	9	Gumar Garbi	17
Tolku	10	Tell Eswed	18
Zediye	11	Mahmudiye	19
Berzan	12	Anteriye	20
Jidale	13	Morik	21a
Jidaide	14	Al Nasiria	21b

Li gorî ser xerîta çavkanî : 4. Rûp.:19.	
Navê Gund	Nr.:
Khirbe Cemal	22
Awgira	23
Heşerî	24a
Mehék	24b
Mozko	24c
Xirbê Dîlan	25
Bor Said	26

**ÊZDIYÊN LÎ DERÛDORA SERÊ KANIYÊ LÎ VAN GUNDAN DÎMAN**

Li gorî ser xerîta çavkanî : 4. Rûp.:19.			
Navê Gund	Nr.:	Navê Gund	Nr.:
Asadiye	37	Şakariye	42a
Tell Sekher	38	Lizga	44b
Tell Bayder	39	Cafa	43
Merekis	40	Derdara	44
Can Temir	41	Teleliye	45
Abu Jarade	46	Tell Naif	47
Xirbê Batana	48	Tell Xanzir	49



Pirê Heşirkê – Mêdunkê kevin



## Qamişlo

### Di evîna welat de dilekî pir jen e

#### Mihemedê Mele Ehmed

#### Xelek – 1 –



Qamişlo bajarêkî nû ye, lê li ser zemîneke dîrokî ye kevin e. Cihê û dormedora wê berî hezaran sal, berî sedan sal, berî dehan sal, meydana çirîda hespan bû, cihê levketina hêzên leşkerî bû, cihê hevdîtina bajarvaniyê bû. Şûnemayên wan di hemû girên Cizîrê de, yê nîzîkî Qamişlo, an dîrî wê de dimînin. Di (Beden) a Qamişlo-Nisêbîn de, di Çaxirbazar de, di Til Birak de, di Girê Mozan de, di Girê Leylên de, çêroka hemû girên Cizîrê dibêjin, çêroka bajarvaniya hezaran sal dibêjin.

Û holê li ser deştên Cizîra bi xêr û bêr çêrokên wê yê kevin tên gotin. Di bajar û gundên wê de, serhildana Beyandûrê û ya Amûdê; kizirandin û şewtandina zarokên biçûk, xwendekarên dibistana Amûdê di sînemê de; kuştina mêran di girtîgiha Hisiça de; qurbanîyên şoreşgêran di Cirnîka Qamişlo de, û di şelandina nasnaman û erdan de çêrokên wê yê nû dibêjin.

Qamişlo û tewên zemîna dormedara wê çêroka dilovaniya pêlên çemê Ceqceq di herdemê de dibêjin. Çêroka hin navbirên dîroka kevin, ya ku hinek dixwazin wan wida bikin, lê nayên windakirin, çinkî dîroka zemîn û miletekî stembare dibêjin. Çêrokeke dirêj ya vî mîletî û ya vî zemînê bi sitemkaran re, bi dagîrkeran re heye.

Firansîz hatin zemîneke nenas, nav miletekî biyan. Xwastin, weke xeynî xwe ji dewletên dagîrker, bi zora çek û hêzên leşkerî xwe desthilatiya xwe li ser mîlet û erdê vedin. Ew erdê ku deştên wê yê fireh, çêregehên zivistanî, jibo pezên hozên Kurdan ên koçer û yê dêmanî bûn, weke Milan û Kîkan, ta Aliyan û Koçerên Mîran û Hesinan û xeynî wan jî. Holê pirtûkên dîrokê û yê gerokan jî (weke Tavrênîyê firansî di 1644-an de, Nîhbûrê danîmarkî di 1764-an, û Jims Pakinghamê îngilîzî di 1816-an de û yê Erebb Ehmed Wesfî Zekerîye di 1934-an de) dibêjin. Dibêjin jî ku çiyayên Kurdistanê ji pezên wan re çêregehên Havînê bûn.

Bi vî re jî, dîroka Osmanîyan a nîzîk, û ya herêmê jî, dibêjin ku ev herêma he di bin desthilatdariya wilayeta Mêrdînê de bû, û di bin siha mîrekên deverê de bû. Weke tê nasîn, ew ji destpêka sedsala 19. ve ta dawîya çaryeka pêşîn ji sedsala bîstan di bin siha mîrekên Bedir-Xaniyan û Paşayên Milan de bû.

Birê Rojhilat ji Mêrdînê ta bajarê Dirbêsiyê (çemê Zirgan) û gola Xatonyê ji Rojava ve, û Çiyayê Şingalê ji Başûr ve, di bin siha mîrekên Botan, nemaze Bedir-Xan beg û Ezdînsêr, de bû.

Dû wan re di bin siha Osmanîyan de bû. Xelefê Şovî, xwediyê strana bi nav û deng yek ji mîrxasên Bedir-Xaniyan bû, şûngirê wan di deverê de bû, ta ku çû dilovaniya Xwedê û li nîzîkê Amûdê hate veşartin. Wî bêş û xokî ji hozan dida hev û astengên wan çare dikirin.

Birê didiwan, yê Rojava, ji Bakur ve Wêranşehir, ji Rojhilat ve Dirbêsi (çemê Zirgan), ji Rojava Til Ebyed, an ta Orfe û ji Başûr ve çiyayê Ebdilezîz, an hê wêdetir, û gola Xatonyê, di bin siha paşayên Milan de bû.

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekê, Firansa û Tirkiye li gor peymanê (Biryân – Bekir), ya ku di 20.11.1921-ê de hatî muhkirin, sînor di navbera dewleta Sûriyê, ya nû hatî damezrandin, û dewleta Tirkiyê ya Kemalî de saz kirin. Bi vî peymanê Firansa karî bû Cizîr (Nîklê Betê), Kobanî û Çiyayê Kurdan ji Kurdistanê Bakur veqetîne û ji xwe re bibe, ango bixe bin siha Sûriyê de, û mandata xwe li ser wan vede.

Ji bo ku Firansa desthilatdariya xwe li ser Cizîrê vede û wê bi Sûriyê ve, û bi paytextê ve (Şam), girê bide, wê di sal 1922-an bîrek ji leşkerî xwe rêkirin wê derê. Ji aliyê birêvebiriyê ve ew saz kir û kir parêzgeheke bi sê qezan: yek Rojava, navenda wê Serêkaniyê; a dî li Rojhilat navenda wê Dêrik, û ya sisîyan, cihê gundê Beyandûr jê re layiq dît (dûre cihê wê guhezte Qamişlo). Cihê gundê Hisiça jî li gor yasaya hejmar 2392, roja 19.9.1930-î, kir navenda parêzgehê ji devera Cizîrê re. Di gelek cihan de jî qîşle jibo leşkerî xwe ava kirin.

Firansa, weke dewleteke dagîrker, dixwast wê deverê bixe bin destê xwe, gora keyfa xwe bi wê bileyize û xêr û bêrên wê bixwe, lewre karê xwe yê yekemîn kir ku mîletê wê lev bide, da jev bikeve, û bi rehetî daxwazên xwe bibe serî. Eva he pê re çû serî, lê bû sedema serhildana Bayandûrê di sala 1923-an de, û ya Amûdê di sala 1930-an de.

Piştî danîna sînorê navbera Sûriyê û Tirkiyê riya zozanên Kurdistanê Bakur li koçerên kurd hate girtin, lewre ew bi zemînê ve hatin girêdan û neçar bûn li ser çêregehên xwe rûnin û gundan ji xwe re li rex hozên dêmanî, weke hinek ji Milan û Kîkan û Aliyan û Hesinan, ava bikin.

Evên he, bi piranî, di destpêkê de dîr ji rûniştin û avakirina xaniyan di bajarê Qamişlo de man. Digel ku wan didîtin ku kesên biyan lê rûdin, xaniyan lê ava dikin û bazirganiyê dikin. Û digel ku wan dizanî aboriya bajêr, û xeynî wê jî, li ser milê wan bû, ji keda milê wan bû, xwe nîzîk ne kirin. Lê piştî demê berê xwe danê û xwastin wê hembêz bikin, lê mixabin ewi tembarbûn.

Firansa xwast di nivê Cizîrê de navenda qezakê ji bo birêvebirîya wê binav bike. Lewre cihê gundê Beyandûr ji wê re baş dît. Navê qezayê li gor zimanê xwe kir qeza “Gîro” (ji navê çemê Qîro yê nîzîk, qeymeqamek jê re binav kir, lê rûnişt û qîşlek ji bo leşkeran lê avakir. Lê Beyandûr, weke navenda qeymeqamiyê dom ne kir, bi sedema

nezaniya serokê leşkerî Firansa li wî cihê, keptên Rogan, ê serhişk û zordar.

Evî Roganî stem û zordarî li Kurdan dikir, serokhozekî wan jî kuşt. Lewre wan hozan (Hevêrkan, Dorikan, Hacî Silêmanan û xeynî wan jî) xwastin heyf û tola xwe ji Firansa hilînin. Wan xwe di bin serokatiya Haco Axa de dan hev û êrîşî navenda qeymeqamiyê (Beyandûr) kirin, Qeymeqam û hin leşker kuştin û navend şewitandin. Û pêşde çûn ta Tirbispî, û li wê derê kemîn ji wî kaptênê zordar re danîn (ew ji gerekê di Rojhilata deverê de vedigeriya). Dema kapêtan giha cihê (Girê Topê) nîzîkî êstegîha tirêna Tirbispî, lê qewimandin, ew û hin leşkerî wî kuştin. Ev bûyera he şûnemayeke nexweş li ser Firansa, dewleta mezin a ku di Şerê Cîhanê de bi ser ketî, hêşt. Lewre piştî vî bûyera giran, bi bînfirêhî, berê xwe da Cizîra biyan û li awakî nû geriya, da ku wê bi hêsaniyê, bê ku tu bêş û ziyanan bide, bixe bin destê xwe. Wê dît ku a baş ew e ku navenda qezayê ji Beyandûrê veguhêze û bibe cihekî dî – ji vî yekê re Qamişlo layiq dît.

#### Nav

Belkî navê Qamişlo bi zimanê tirkî yan bi zimanê kurdî be. Çimkî gotina qamiş bi zimanê tirkî ew çîtîkê li ber çeman çê dibe ye, ku bi Kurmançî dibêjinê qeram. Gelek ji wî çîtîkî (qeram, qamiş) li ber çemê Ceqceq çê dibû. Li gor gotina xelkê Qamişlo navê Qamişlo ji vî çîtîkî hatiya.



#### Cih

Bajarê Qamişlo li ser zemînekê hate avakirin, ku berî sînordanîyê ya bajarê Nisêbînê bû. Di destpêka çaryeka didiwan ji sedsala bîstan li Başûrê Nisêbînê, li ser herdu keviyên çemê Ceqceq, xelkê dest bi avakirina bajarê Qamişlo kir (li gor ku xelkê Qamişlo dibêje belkî di sala 1925-an de bû).

Samiyê Mela Ehmed Namî, li ser zimanê bavê xwe, dibêje ku “Firansîzan di 20. Tebaxa sala 1926-an de bajarê Qamişlo bi endazyariyêke pir rast û dirust û bi destê endazyarêkî firansî hat danîn û avakirin”.

Zemîna ku Qamişlo li ser hatiye avakirin zemîneke pehn û fireh e, arîkariya avakirineke dirust û sipehî kir, arîkariya hebûna cadeyên dirêj, rast û fireh kir, bê ku tu kolanên teng lê hebin.

Qamişlo di nivê Bakur yê parêzgeha Hisiça de ye. Sînorê navbera Sûriyê û Tirkiyê erdê wê û yê Nisêbînê jev vediqetîne; her yek ji wan



bajarekî serbixwe. Qamişlo dikeve navbera bajarê Serê Kaniyê (120 km li Rojava), bajarê Dêrikê (100 km Rojhilat) û Hisiça (85 km li Başûr-rojava). Ji Amûdê 30 km û ji Dirbêsiyê 60 km, ku li Rojavayê wê ne, dûr e. Ji Tirbispî 30 km û ji Rimêlan 60 km, yê ku li Rojhilata wê ne, dûr e. Holê jî, bi Rojava de, ne bi gelekî ji bajarên ku di dîroka kevin de bi nav û deng in dûr e: Girê Mozan 25 km, Çaxirbazar 30 km, û Til Birak 40 km. Bi Rojhilat de jî ji Girê Leylên 30 km dûr e.

Weke me got, Qamişlo ji aliyê Bakur ve bi bajarê Nisêbîna kevin ve ye. Hin erdên Nisêbînê bûne para bajarê Qamişlo, weke erdê ku bi navê (Beden) tê naskirin. Qamişlo dikeve cem xeta hêsin ya tirêna ji Tirkiyê tê Sûriyê û diçê Îraqê (Tirêna Rojhilat a Lezok "Orient Express", ewa ku ji Berlînê tê Bexdayê). Herwiha Çemê Ceqceq jî wê dikê du bir, Rojhilat û Rojava. Û li dora wê gundên Mehmeqiya, Cirkî û Enterî (li Rojhilat), û gundê Zinûd û Hilko (li Başûr), û gundê Hilêliyê (li Rojava) hene. Lê ev gundên he niha bûne taxine bajarê Qamişlo, bi sedema firehbûna wê ya mezin.

## Çemê Ceqceq

Çemê Ceqceq ava xwe ji du kehniyên dehla Bûnîsrê, yek şîrîn û ya di tehil, werdigrê. Dema ava herdu kehniyan dighe hev, ava wan şîrîn dibe, û çemê Ceqceq pêktînin, yê ku di Rojhilatê Nisêbînê re diherikê, berê xwe dide Başûr, sînore Tirkiyê û Sûriyê qut dikê û di nivê Qamişlo re diborê. Piştî 6-7 km, bal başûr ve, berê xwe dide Başûrê Rojava û li cem bajarê Hisiça, piştî ku zêdî 100 km qut dike, dighe çemê Xabûr, yê ku ji bajarê Serêkaniyê (serêkehniya çemê Xabûr) tê. Li ser keviya rastê ya çemî, û nîzîkî şûnemayên bajarê Nisêbîna kevin (Beden), ya ku dikeve nav erdê bajarê Qamişlo, aşekî avê, berî Qamişlo bê avakirin, hebû. Xelkê Nisêbînê û gundên dora wê, û yê Qamişlo û gundên wê jî, ta nivê salên çilan sûd jê werdigirtin û arvanên xwe lê dihêran. Hemberî aşî, li ser keviya Rojhilat, cokeke di ji çem re di salên sihan de hate kolan.

Ew bi coka serekî ya çem re, û 100 m jê dûr, diherikî, ta digha cada serekî, ya ku ji Rojava dihat û di ser pirê re (û di ser vê cokê re jî) diçû Rojhilat. Ev coka he piştî 30 mitrî berê xwe diguhart bal Rojhilat ve û diherikî ta digha gazxanê û sûka pêz (ereşe) û cihê serjêkirina wan (meslex).

Dû re riya xwe di çolê de vedikir û bal gundê Nî'metiyê ve berdewam dikir û li çolê winda dibû. Ji vê cokê, dema berê xwe dida Rojhilat, cokeke biçûktir vediqetî û bal Başûr ve diherikî, aşekî di digêrand û xwe digihand coka çemê mezin. Lê ev coka Rojhilat, hemû ji serî heta binî, di salên heftiyên de hate girtin û nema bal Rojhilat ve diçû.

Bi wê re jî sûka pêz (ereşe) û meslex herdu ji cihên wan hatin guhastin û bal Başûrê bajêr ve, ser çemê Ceqceq, nîzîkî gundê Zinûd hatin bicihkirin. Niha cihê wê bi navê taxa Ereben Tey tê naskirin.

Firansizan, di salên sihan de, li ser çemê Ceqceq pireke hesinî ye teng (têra derbasbûna otomobileke tenê) ava kirin. Wê pirê Rojava û Rojhilatê Qamişlo digihandin hev û ta destpêka salên şêstiyên ma, gava yeke fireh ji çiminto û hêsin şûna wê hate avakirin.

Dewletê sê pirên din li Başûrê wê avakirin; yekê taxa Bişêriyê gihande sûka nava bajêr (navenda bazirganiyê), yeke di li Başûrê wê bû û beşeke taxa Bişêriyê digihand bajêr, û ya sisyan cada Kornîş

û êstegîha tirênê (stasyon) a nû, û devera pîşeyî ya bajêr (el-Mentiqe el-Sina'iyê) û Enteriyê digihandin hev. Niha pireke di li Bakurê cihê ya hesinî ava dikin.

Xelkê Qamişlo (berî firehbûna wê ya mezin) di çandina şînatiyê de gelek sûd ji çemê Ceqceq didît. Herwiha xelkên gundên dora çem jî. Holê jî ava çem ji bîrên vexwarina bajêr re xezne bû, berî ku boriyên ava vexwarinê di nav bajêr de, di destpêka pênciyên de, dirêj bikin.

Lê Tirkan ji pênciyên ve, dema li rex sînore Sûriyê dest bi çandina pembû kirin, ava çemê Ceqceq diguhartin ser çandinyên xwe, dihiştin ku ava çem Havînan li ser Qamişlo kêmbibe, hin Havînan jî diçikeha û Qamişlo ji ava çem bêpar dima. Jibo vê û hin tiştên din coka Rojhilatê çem çikandin, aşê ku pê dihate gerandin nema, û sûka pez û meslex cihê wan bal Başûrê Qamişlo ve hatin guhastin (li ser çemê mezin). Lê du aşên agirî (mîkanîkî) di bajêr de hatin avakirin, yek yê "Manokê ermenî" li ser cada el-Wihde bû, ya din jî li cem gihandinheva riya Amûdê û ya Hisiça. Li cem gundê Cirkî dewletê aşekî di yî mezin û enbarên zêd ava kirin.

Digel qencyên pir yê çemê Ceqceq li ser xelk Qamişlo, xirabiyên wî jî hene; weke ya Zivistana sala 1952-an, dema şîn û girî li Qamişlo belav kirî. Di meha Şibata 1952-an de xelkê Qamişlo dît ku ava Ceqceq hinekî bilind dibe. Lê di şevê de rê neda wan ku xwe jê rê kar bikin. Dora xaniyên ser keviya çemî girt û bi pêlên xwe, yê ku mirin bi wan re bû, ket sirdabên xaniyan û dîwarên axî sist kirin û herifandin. Ev bela he ji nişka ve bi ser malbata hevalê me (Ebdilezîzê Seyid Ebdila) de hat. Bav û birayê mezin hew gihan hevalê me yê nexweş, yê ku ne dikarî ji ser textê razana xwe rabe, hilgirin û ji odê derxin. Dîwar herifîn û ban bi ser wan de hat xwarê. Hersê bi hev re li nav şapa mirinê de winda bûn. Holê Ceqceqê şînek di nav heval û dostan de peyda kir û dilêşeke mezin li nav xelkê Qamişlo belav kir.



## Avakirna Qamişlo

Di nerîna min de, dema biryara avakirina bajarekî di cihê Qamişlo de hate dan, di destpêkê de li ser erdekî hinekî fireh û piçekî ji sê aliyên ve (Rojava, Bakur û Rojhilat) bilind qîşlak ji bo leşkeran hate avakirin. Ev qîşla he ji Bakur ve seranserê Nisêbînê û riya ku ji Qamişlo diçiyê bû. Ji aliyê Rojhilat ve seranserê erdê ku diçe bal çemê Ceqceq û wêranên Badenê yê nîzîk bû. Ji aliyê başûr ve bi cadeke ne dirêj, ku ji ber devê qîşlê bal zîndane ve diçû, û bi pireke biçûk li ser kûranyeyeke biçûk ji erdê digha bajêr.

Weke me berê jî gotî, dema dest bi avakirina bajarê Qamişlo bûye, ji bilî aşê avê (rex Bedenê, li ser çemê Ceqceq) tu avahî li cihê wê ne bû. Ev aşê he ta nivê salên çilan ma, xelkê Nisêbînê (berî

sînore bê danîn) û yê Qamişlo û gundên dora wê, di hêrandina arvanên xwe de, sûd jê werdigirtin.

Dema sînore hate danîn hinek ji zemîna Nisêbînê ket aliyê Sûriyê, xelkê wê jî barkirin û çûn Bakurê xetê. Avahiyên mayîn bûn kaviil, û bi yê kevin re bûn wêranên Bedenê, ya ku bû bû ji erdê Qamişlo. Gelek ji karkeran payîzan bi erebeyan axa Bedenê, jibo seyandina dîwar û serbanên xaniyan, tanîn û difrotin. Gelek caran zarok di nav wêranên Bedenê de dileyistin, diketin sirdab, od û kaviilên xaniyan. Gelekan, zarok an karkeran, kûz û şerbikên axî û hin tiştên din didîtin.

Dema dest bi avakirna Qamişlo bûye, ez bawer im, dest bi dirêjkirina cada serekî (ya ku ji gihandinheva riya ji Amûdê tê Qamişlo, û ya ji Hisiça tê Qamişlo) kirin û bi Rojhilat ve birin: di ser pira hesinî re ta giha bajarê Dêrkê nîzîkî ava mezin, Dicle. Bi vî awayî vê cadê bajar kir du bir – Bakur û Başûr. Ev cade dê bû be xeteke serekî ji bo sazkirina avahî û endazyariya bajêr û rastkirina cadan, çî ên bi berpala wê re dirêj dibûn, an serekî dihatnê. Herwiha jî deverên serekî di bajêr de diketin dora wê, Bakur û Başûrê cadê. Bi vî rengî em dikarin bêjin ku cade, çem û qîşleyê roleke mezin di avakirina bajêr de leyistin.

Vêca mirov dikare bajêr bikê sê birên serekî:

1. Naveda saziyên hikûmetê, navbera qîşlê û cada serekî. 500 m Rojavayê Ceqceq.

2. Naveda bazirganiya bajêr, Başûrê cada serekî. 100 m Rojavayê Ceqceq.

3. Birê sisyan, Rojhilatê çemê ceqceq li ser herdu aliyên cada serekî û bi hin derên bajêr ên din re bûn cihê avakirina xaniyan û hebûna taxan.

Di birê yekê de, navbera qîşlê ji Bakur ve û cada serekî ji Başûr ve, ku bi navê cada "dû piran" dihate naskirin û di dû re navê wê guhartin û kirin "calda serok Cemal Ebdil Nasir", ji destpêka salên sihan ve Firansizan avahiyên saziyên hikûmetê û malên efserên leşkeran û karmendên xwe ava kirin. Bi wan re jî hejmareke pir kêmbû ji navdaran xanî ji xwe re li wê derê ava kirin. Ev avahiyên he hê jî dimînin, birek ji wan bûne avahiyên dezgehên parastinê, nemaze yê nîzîkî qîşlê.

Di vî birî de û li ser milê rastê ji cada el-Quwetlî, ya ku ji qîşlê dihat ser cada serekî (du piran) hin saziyên hikûmetê û mal hatin avakirin. Weke çend malên efseran, zîndana bajêr (berê ji axê bû, dû re bû ji keviran û çiminto), seraya hikûmetê (niha navenda şû'ba bajêr ya Partiya Be'is), mala Mîstêşarê firensî (niha mala qeymeqam e) û maleke biçûk, ji du an sê odan, kiri bûn nexweşxane (mistewsef) ji bo nexweşên bajêr (niha rex geraca makînen saziya Mîrê, malbatek lê rûdinê). Li ser çepê cada ku ji Rojhilat tê cada Quwetlî, li nîzîkê mala mîstêşarê firensî, di salên çilan de dibistaneke keçan hebû.

Ew dibistan ta salên pênciyên ma dibistana dewletê ya tek û tenê. Nîzîkê wê, li aliyê Rojhilat, dibistana dewletê ya kuran jî hebû (niha cihê wê navenda şû'ba gundan ya Partiya Be'is e).

Ev dibistana kuran ta sala 1947-an ma dibistana dewletê ya tenê. Li Rojhilatê wê saziya poste û telegrafê bû, û jê ne dûr saziya rêcê (ya titûn û çixaran) bû. Di navbera vî birî û çemê ceqceq de, û Bakurê cada serekî (du piran) malên çend kesên navdar û hinek çayxane û dikan hebûn.



Birê didiwan ji bajêr, yê ku erdê wî fireh û pehin e, û Başûrê cada serekî û Rojavayê çemê Ceqceq bi 100 m, naveda bazirganiya bajêr bû. Çend bazar (sûk) li rex hev hebûn. Di nivî de sûka şinatî û goşt (ereşe) bû, banê wê sac bû, li ser stûnên hesinî rabibû, di sala 1932-an de hatibû avakirin. Yeke di weke wê li ser riya Nisêbînê, li hember mizgefta mezin, di sala 1969-an de hate avakirin. Li dora eresa pêşîn, hin sûk hatin avakirin; weke sûka qumaşan, ku navê wê (Xan el-Gumrik) bû. Ji du rêzên firoşgehan bû, serê nava wan bi depa û çitikan girti bûn. Li rex wê sûka etaran bû (digotanê sûka cuhwan). Di quncika Bakurê Rojava yê eresê sûkeke di ye sergirtî weke ya Xan el-Gumrik hebû, cihê karên cuda cuda bû. Li dora eresê gelek firoşgeh, çayxane, aşxane û otel hebûn.

Li ser cada Rojhilatê eresê û sûkan, navbera eresê û çem de û nîzikî pira hesinî, di sala 1935-an de, avahiye mezin hat avakirin. Ew avahiya bû cihê çend saziyan; weke saziya bajarvaniyê (Beledî), navenda polîsan û polîsên parastinê, û ya pasportan jî (niha saziya bajarvaniyê tenê tê de ye). Di sirdaba wê avahiyê de cihê banka peran bû (Banka Sûriye û Libnan). Li ser dirêjahiya milê rastê ya vê caldê, û Başûrê wê, hin dikanên cuhiwan û malên wan hebûn. Li hember wan, li ser milê çepê, sînema û çayxana Gerbîs yê havînê bûn, û di Başûrê wê de serşoka bajêr, ya ku di sala 1936-an de bi erênîya parêzgeha Helebê, hate avakirin.

Li Bakurê navenda bazirganiyê, û li aliyê çepê ji cada serekî, hinek çayxane weke ya Gerbîs û ya Boxos (ya Gerbîs a zivstanî ya havînê jî dimînin, lê cihê ya Boxos bû firoşgeh, li ser cada ku diçe mizgefta mezin û Nisêbînê). Heryekî ji wan sînema jî avakiri bû. Sînema Gerbîs niha navê wê "Sînema Dîmeşq" e, û sînema Boxos a zivstanî, weke çayxana wî, cihê wê bûye firoşgeh, lê cihê sînema havînê, ya ku diket ber çem, niha çend firoşgeh û nexweşxana dr. Miskî lê hatine avakirin. Nîzikî wan hin xanî, yê xwediyên erd û milkên Qamişlo, navdar û çelebiyên Nisêbînê û hin kesên din, hatin avakirin.

Li Başûrê navenda bazirganiyê hin xanî hatin avakirin, yê nîziktirê sûkê malên Cuhiwan û Kenîse Kenîse û dikanên wan bûn. Li Başûrê wan jî malên hin Ermenîyan bûn, lê hineke di ji wan li taxa Bişêriyê, Rojholatê çemê Ceqceq û Başûrê cada serekî, malên xwe ava kiri bûn.

Li aliyê di ji cada Rojavayê navenda bazirganiyê (niha navê wê el-Wihde ye) hinek Kurd û Siryanan malên xwe lê ava kiri bûn. Li wê derê dêra rahbatan (jinên olperest ên ermenên katolîk) di sala 1934-an de hate ava kirin (niha xwendegeha Qadisiyê ya keçan e).

Ji salên heftiyên ve ev bira he bi navê "Taxa navî" hate naskirin. Çinkî diket nivê bajêr, navbera Rojhilat û Rojavayê wê de.

Lê birê sisyan, yê Rojhilatê çemê Ceqceq, bû birê avakirina xaniyên rûniştinê. Di vî birî de taxa Qedûr Beg, taxa Bişêriyê û taxa Aşûriyan hatin avakirin. Di vî birî de, û li ser cada serekî (du piran), cihê makînen saziya (Neqil û miwaselat), gazxana bajêr û cihê eresa pêz (kirin û firotin) û serjêkirna wan (meslex) bû. Di ber wan re şaxê Rojhilat yê çemê ceqceq bal gundên Rojhilat ve diçû. Di salên şêstiyên de cihê eresa pêz û meslex bal başûrê bajêr ve (ser çemê Ceqceq) guhastin.

Xelkê vî birê he di salên çilan û berî wan de ji hemû

milet û olan bû, ji Misilman û Fileh û Cuhû û xeynî wan bûn. Hemû di nav hev de dijîn. Lê ji pênciyên ve Fileh û Cuhû, her yek çû nav taxa xelkê xwe (ev taxên he bibûn weke Gîto ya wan).

Li destpêkê xelkê vî birî xwe li dora mala Qedûr Beg, Rojhilatê çem, û nîzikî pira hesinî dane hev. Bi vî re jî xwe li rex riya kevirkirî, ya ji cada serekî vediqetî û di Rojhilatê mala Qedûr Beg re di navbera goristana Misilman û Filhan re diçû gundê Mehmeqiyê (Bakurê Rojhilat) û digha rawestgeha Til Zîwan a tirênê. Ev tirêna Rojhilata Lezok ji Berlînê, û di nav welatên Ewropa re, dihat Tirkiyê û Sûriyê û diçû Bexdayê. Di salên pênciya de ev riya ku diçû rawestgeha trêna Til Zîwan hate guhartin, û yeke nû li cem badana cada serekî bal gundê Entriyê ve vekirin. Cada kevin ma cadeke navbera taxa Qedûr Beg de.

Li hember taxa Qedûr Beg, li aliyê Başûrê cada serekî (du piran), taxa Bişêriyê hat avakirin (di destpêkê de gelek Ermeniyên ji devera Bişêriyê, ya li Kurdistana Bakur, lê rûniştin. Lewre – di nerîna nim de – bi navê wan hate naskirin. Bi wan re Kurd û Siryan jî lê rûniştin). Di Rojhilatê vî taxê de kesên Aşûr, ên ku hatin Qamişlo, malên xwe lê ava kirin, lewre navê wê kirin taxa Aşûriyan.

Di salên heştîyan de li ser erdê fireh û vala di navbera Qamişlo û gundê Entriyê de garaca otomobîlên ku diçin Rojhilatê Qamişlo, û cihê karê pîşeyî (mîkanîkî) "el-Mentiqe el-Sina'îye" hatin avakirin. Herwiha li rex wan rawestgeha



Qamişlo kolana herdu piran (salên 50-60)

(stasyona) nû ya tirênê (ji dêlî ya Til Zîwanê) û hin enbarên zadan jî hatin avakirin.

### Taxên Qamişlo

Holê li gor plana firansîzan birê didiwan ji bajêr, yê Rojavayê çem, bû navenda bazirganiyê, û Başûrê wê, bi rojavayê wê re, bi birê sisyan re, bû cihê avakirina xaniyan û rûniştina xelkê.

Di salên sihan û çilan de, weke me berê jî gotî, birê ku diket navbera qîşlê û cada serekî cihê saziyên dewletê û xaniyên efser, karmend û hin kesên nîzikî firansîzan, an hinek xeynî wan jî bû. Lewre herdu birên din jibo avakirina malan û rûniştina xelkê man. Li dora sûka navendî, ji Başûr û Rojava ve, cihê erdê fireh û pehin, xelk li wan rûniştin û taxên biçûk ava kirin. Cuhûyên ku ji Kurdistana Başûr û ya Bakur hatine, xaniyên xwe nîzikî sûkê, ji aliyê Başûr ve, û di nava wê de kenîsa xwe ava kirin. Ermenîyan jî, nemaze yê ji Heleb û Dêrezorê hatine, di Başûrê wan de xaniyên xaniyên xwe û dêra xwe ava kirin. Lê yê ku ji devera Bişêriyê û dora wê hatine, bêhtirê wan di taxa Bişêriyê de xaniyên xwe ava kirin. Hinek ji navdarên bajêr, an xwediyên erdên Qamişlo, ji xelkên Nisêbînê an xeynî wê, xaniyên xwe li Rojavayê taxa Cuhû û Erminiyan ava kirin; weke mala Nizamîdîn û Mîşêl Dom û Mîşêl Eso û mala Hana û mala çermûklî û mala Qewmê û xeynî wan

jî. Hinekan jî li Bakurê cada "du piran", weke dr. Nafiz, Arif beg Ebas, mala Zekî û Nîhad Çelebî û Nedîm Beytar. Dû re hin malên dewlemend (weke mala Esfer, Nekar, mala Hedaye, mala Terzîbaşî, mala Mi'marbaşî û mala Esmer) hatin Qamişlo û li wan cihan ava kirin.

Erebên hozan, namaze yê Tey, ewên nîzikî Qamişlo, tukes ji wan, ji bilî çend şêxên wan (weke Faris el-Mihemed û Ebdilrezaq el-Heso û Ebdirezaq el-Nayif û mala Selûmî) ne hatin bajêr. Lê ji salên şêstiyên ve ev hoza he berê xwe da Qamişlo û li Başûrê bajêr nîzikî gundê Zinûd gihan hev; hejmara wan li wir zêde bû, ta ku cihê rawestandina wan bû taxek, ku niha bi "taxa Tey" tê naskirin.

Lê hoza Şemer dût ji Qamişlo ma, çinkû gundên wan ji Qamişlo dût bûn, diketan aliyê qeza Dêrkê. Tuyan ji wan, ji bilî şêxên wan Mîzer el-Medlûl û Humeyid Diham el-Hadî, malên xwe ne anîn Qamişlo Gelek ji Kurdên dora Qamişlo, bi sedema danîna xetê di navbera Sûriyê û Tirkiyê de, dema ku dewleta Sûriye hate damezrandin, neçar bûn li ser çêregehên xwe rûnin, gundan ji xwe re ava bikin û dev ji koçeriyê berdin, an koçerîke teng ne gelekî dût ji gundên xwe bikin, û guh bidin çandinyê û xwedîkirna pêz. Ji bo vî wan ne xwast bîn bajêr, û ji nû ve li karan bigerin û bikin. Û holê di gundên xwe de man, lê hejmareke kêma ji wan hatin bajêr.

Dû re ev hejmara he zêde bû, nemaze piştî ku hikûmetê di salên pêncî û şêstiyên de dest bi siyaseta nijadperest di dermafê wan de kir; li wan ne weke welatîyên Sûriyê nerî; erdên çolê da ereban, û neda wan; nasname ji wan stand, û dût re erdên bav û bapîran jî ji wan stand û da erebên xwe, yê ku ji dora Heleb û Reqayê anîn Cizîrê. Lewre ev Kurdên he, ji bo ku zarokên xwe xwedî bikin, neçar bûn berê xwe bidin bajêr û li karan bigerin. An hineke dewlemed hatin bajêr ji bo karan bi perên xwe bikin.

Û holê hejmara kesên bajêr gelekî zêde bû, ta salên heştîyan giha bêtirî (300 000) sêsed hezar kes .

Û hejmara kesên taxan jî zêde bû, weke ya Qedûr Beg, ya Bişêriyê, ya Aşûriyan û ya taxa Rojava . Hin taxên nû jî hatin avakirin, weke ya Bengladêş (kesên lê rûniştin avahiyên xwe bê erênîya hikûmetê ava kirin, lewre saziya kolanên taxê ne serast bû, lê saziya bajarvaniya bajêr neçar bû ku bi avakirna wan razî bibe, û hineke ji wan serast bike). Ev taxa he vajiyê taxa Kornîş bû, ya ku ji avahiyên nûjen û qatane, û bi riya civatên taybet an yê karmendan hate avakirin. Û holê jî di Rojavayê Qamişlo û Başûrê firokgehê de vîlatên weke xaniyên ewropîyan ji bo maldaran hatin avakirin.

Weke me berê jî got, ji salên heftiyên de navê "taxa navî" li birê ku diket navbera çemê Ceqceq ji Rojhilat ve, û cada el-Quwetlî, ya ber seraya nû, ji Rojava ve kirin.

Bêhtirê xelkê vî taxa he ji Siryan û Erminiyan bû . Lê taxên din bêhtirê kesên wan ji Kurdan bûn. Li ya Rojava jî hemû millet di nav hev de bûn.

Lê hejmara Cuhûyan, bi sedema bazdana wan ji Sûriyê, gelekî kêma bibû. Vê dawiyê Siryanan jî dest bi reva ji Qamişlo kiri bûn, û holê jî Kurdan di van salên dawî de dest pê kirin. Li Qamişlo hejmareke biçûk ji Çerkes û ji Çeçanan jî hebû. Di salên çilan û pênciyên de hin erdên vala, di navbera bajêr û gundên dora wê de (Mehmeqiyê, Cîrnîk, Enterî, Zinûd, Hilko û Hilêliyê) hebûn, lê niha ev valabûn hate dagirtin û ev gundên he bûn ji avahiyên bajêr.

**Dumahîk heye...**



## Hevpeyvînek zindî bi

### Husên Duzen re

## Pirsgirêka zaraveyan hîn nehatiye çareserkirin

### kesê jar, kesê brîndar nikare rexneyan hilîne.

#### Hevpeyvîna: Qado Şêrîn

- \* pirsgirêka zaraveyan hîn nehatiye çareserkirin.
- \* bi xêra Mîr Celadet Bedirxan gelek gavên bingehîn hatin avêtin.
- \* ev weseyeta Mele Mistefayê nemir e.
- \* li başûr nêta tu kesî nîn e di demeke kurt de dest bikaranîna alfabeya latînî bikin.
- \* û bila deng neçe kesekî, navbênê min û helbestê jî ewqas tune ye.
- \* kesê jar, kesê brîndar nikare rexneyan hilîne.
- \* ew bixwaze dikare nivîsên ku qet nehêjayî weşanê ne jî belav bike.

#### P1- Tore neynika jiyana gelan e, heya çi astê toreya kurdî ev pêk aniye?

**H. Dûzen:** Di hemû warên jiyana mirovên kurd de rastiyeke her bala min kişandiye; jiyana jixweve, ya bê tevlibûna faktorên derve, baş meşiyaye û kêr zêde dimeşe jî. Di vî warî de Kurd ne kêrî cîranên xwe ne. Gava em dêhna xwe didin stranên Kurdan ên gelêrî ev yek pirr zelal diyar dibe. Bi salan re gelek destanên Kurdan ên evîne ku ji yê cîranan ne kêmtir in hatine pê. Lê ku Kurd dixwazin bi teherêkî hev dem jiyana xwe biguherin an ku hewl didin berhemên nûdem pêk bînin, gelek caran nikarin bi kesên din re bikevin qayîşê. Xebatên wan î modern li dû yê gelên din in. Mînakên nûdem î biserketî yan qet tune ne ger ku di warinan de hebin jî ew pirr lawaz in; li paş ên cîranên xwe ne.

Ev tişt ne bes di warê kilamên gelêrî de wisa ye: Di siyaseta wan, rabûn û rûniştina wan a rojane, bikaranîna demokrasîyê de jî wisa ye. Ev bi tevahî xwe derdixe pêş bêyî ku mirov bandora stanîlîzmê û fikrên din î dîktatoriyel ku van 20/30 salên dawî bandoreke pirr mezin li ser Kurdên bakur û bi taybetî jî li ser siyaseta wan hiştîye bide ber çavan.

Divê ev tiştên ku ez dibêjim neyên famkirin ku ez xebatên di warê wêjeyê yê van salên dawî ê bi taybetî jî gelek berhemên ku li surgunê hatin afirandin nabînim. Min tenê xwest ku ez destnîşan bikim ku serkeftin her tiştêkî îzafî ye; divê her pirsyara li gor "çî" û jê jî girîngtir li gor "kîjan" pîvanê pê re were bersivandin. Ku mirovên Kurd û bi wan re jî wêjeya wan bixwaze kabên xwe biavêje nav yê gelên din û bibe beşeke ji civaka hemdem a dunya îro, divê bê zanîna ku hîn riyeye dirêj li ber nivîskarên wejeya kurdî ye.

#### P2- Astengiyên zimên ji aliyê vekîtê bi taybetî bi du ebcediya tê nivîsandin {Latînî, Erebi} ta çi radeyê ev yek bandora xwe li gelê me dike û ji aliyê zaravên cuda çine?, çi bandora du ebcediyan li wêjeya kurdî heye?

**H. Dûzen:** Bêguman bikaranîna du an gelek alfabeyan hin astengiyên bi xwe re tîne. Eger hemû kurdan bi yek alfabe yê binivîsandin da qewsikek di nav dan û standina wan a bi hev re kêmtir ba. Belkî jî bi riya berhemên çandî ji aliyê manevî de jî nêzîktirî hev bibûna.

Lê ez bawer nakim ku pirsgirêk ev tenê ye an jî ev pirsgirêka bingehîn be. Ji hêla erdnîgarî de sînorên di nav Kurdan de qewsikekî pirr girîng e.

Jê pê ve pirsgirêka zaraveyan hîn nehatiye çareserkirin. Hîn jî newêrin nîqaşekê li ser vekin ka bê Zazakî zaraveyekî Kurdî ye an zimanekî serbixwe ye.

Piştî Hewarê ji aliyê Kurdên bakur û yê Başûrê Rojava ve gelek berhemên wêjeyî derketin. Nivîsandina bi kurmançî û alfabeya latînî gihîştê radeyê pirr girîng. Di hêla standartkirina Kurmançî de bi xêra Mîr Celadet Bedirxan gelek gavên bingehîn hatin avêtin.



Di destê me de rêzimanêke birêkûpêk heye.

Lê mixabin li başûrê mezin kesên ku bi Kurmançî dipeyivin nedan ser vê riyê. Li wir zaravayê bingehîn soranî ye. Di dibistanan de soranî tê xwendin. Ji kêr zêde 200 kovar û rojnameyên ku bi kurdî derdixin çend rûpel ji wan bi alfabeya latînî tên çapkirin. Qederê ez zanim kovareke bi navê Nûbûn bi latînî derdixe û kovara Êkitiya Nivîskarên Duhokê "Peyv" jî beşek ji rûpelên xwe ji nivîsên bi elîfbaya latînî re vediqetîne. Ji ber ku ev weseyeta Mele Mistefayê nemir e tu nêta kesekî ku li ser nîqaşê jî bike xuya nake.

Ev jî pirsgirêkên ji alfabe yê mezintir derdixin pêş.

Min payiza par di dema pêşangeha pirtûkan a navnetewî de li Frankfurtê derfet dît ku ez bi wezîrê rewşenbîrî li Slêmaniyê Fatah Zaxoyî re sohbet bikim. Wî jî min re got ku wan dest pê kiriye ku hêdî hêdî elîfbeya kurmançî jî bi kar bînin. Hîngê min bawer kiribû ku rewş li ba wan ev be dê gavên ku li hêla Behdînanê bîn avêtin hîn bihêztir bin, bêyî ku em ji wan bixwazin ku elîfbeya erebî jî îro heta sibe rabikin. Lê di gera min a Adara derbasbûyî li başûr ez bûm şahid ku nêta tu kesî nîn e di demeke kurt de dest bikaranîna alfabeya latînî bikin.

#### P3- Tu çawa helbesta kurdî {klasîk û nûjen} li başûrê rojavayê kurdistanê bi taybetî û li kurdistanê bi tevayî dinerxînî?

**H. Dûzen:** Li hemû welatan wêjeya pêşî bi helbestê dest pê kiriye, geş bûye û piştê peşan bûye forma wêjeyê ya sereke; her çûye eleqeya ji bo helbestê kêr bûye, hejmara kesên ku helbestan dinivîsîn kêr bûye, her ku çûye peşan pêş ketiye. Û di nav teherên peşanê de jî romanê xwe daye pejiwandin. Ez bawer dikim ku kêr zêde wêjeya hemû dunyayê di van radeyan re derbas bûye an dibe.

Gelo di wêjeya Kurdî de jî ev pêk hatiye? Ez dibêjim erê. Gava ku em li helbesta Kurdî a klasîk mîze dikin em gelek mînakên biserketî dibînin. Piştê herçûye berhemên biserketî kêmtir bûne.

Lê di nav van 20 salên dawî de eleqeyê mezin ji bo peşanê xwe nîşan da. Û wek li gelek welatan pêşî gelek kurteçîrok jî hatine nivîsîn, lê her çû romanê xwe wek teherêkî wêjeyî yî nûdem derxistiye pêş.

Van salên dawî gelek roman hatin nivîsîn; gelo ew çiqas biserketî ne, yan jî çend nivîskarên peşanê xwe gihandin standartên navnetewî? Ev tişt pêwistî lêkolînên taybet e.



Û ez bawerim ji bo ku pirsyara we karibe bê bersivandin, divê xebatên taybetî li ser helbestê jî çêbibin. Ez dizanim ku gelek kes helbestan dinivîsin. Lê çend ji wan hêjayî nirxandinê ne? Min bi xwe di vî warî de tu xebat nekirine. –û bila deng neçe kesekî, navbênê min û helbestê jî ewqas tune ye.

**P4- Ger û lêkolîn û rexne wêje û çanda gelan zengîn dikin, ma di nav me kurdan de tu vê yekê çawa dinerxînî?**

**H. Dûzen:** Ez bawerim mebesta “ger” di pirsê de “gername” ye ango ew vegotina li ser ger û rêwîtiya kesekê/î ye.

Min berî bi çend rojan gernameyeke pîrr xweş xwend . Ew gername berê di malpereke internetê de çend caran ber bi çavê min ketibû, lê ji ber ku min ew jî mîna yek ji gelekên din ku min xwendibûn û poşmam bûbûm texmîn kir min ew piştî bi weşandina wê bi salek û nîvekê xwend. Sernivîsa wê “Başûrê Kurdistanê” bû. Hesenê Metê bi zimanekî xweş ew gernameya xwe vehûnaye. Berî bi çendakî wek pirtûk bi navê “gername” li Stockholmê derket . Ez bi xwe di nav wêjeya kurdî de pêrgî gernameyên biserketî nehatime .

Lêkolîn di nav Kurdan de ? Dana bersîvên pirsên wisa pîrr dijwar e. Ji bo ku mirov bersiva vê pirsê bide divê mirov lêkolînên ku hene bi rexnegirî di ber çavan re derbas bike û ku mirov vê bike hertim tirsek heye; gelo mirov bipeyvên xwe kesekî neêşîne? Wek gelek berhemên din lêkolîn jî pîrr in. Lê Lêkolînên bingehîn, yên ku bi metodên zanistî hatine kirin, yên ku ji bo bidestxistina encamên zanistî pîrs avêtine holê û bi metodek û xebatên ilmî encam derxistine pîrr kêmtir in. Hin kesên ku bi awayên bi lez hin agahdariyan komî ser hev dikin û ku ji bo pirtûkekê bes bin çap dikin. Mixabin ev xebatên wisa dibin sedemê ku ev forma xebatê belav bibe û ew kesên ku nêta wan a lêkolîneke zanistî hebe jî dikevin ser vê rîya hêsan.

Kêmtir zêde heman tişt ji bo rexneyê jî dikare were gotin. Di civakên wek a kurdan de kesayetî ji ber sedemên diyar brîndar in. Ev tişt ji sosyalîzasyona wan tê. Û kesê jar, kesê brîndar nikare rexneyan hilîne. Ji bo ku kesek bikaribe rexneyan tehemul bike û ku ji wan fêr bibe divê kesatiyeke xurt be. Ez bawer im sedema bingehîn a geşnebûna rexneriya wêjeyî di nav kurdan de ev e. Gelek kesên ku dil dikin di vî warî de tiştinan binivîsin jî an ji bo ku kesekî neêşînin qet dest pê nakin an jî ewqas bitirs dinivîsin ku wek sîstemekê rexnegirî di wêjeya kurdî de nikare cihê xwe bibîne.

**P5- Win çawa toreya kurdî di celebên -helbest, çîrok, roman, rexne û wergerandinê de dinerxînî?**

**H. Dûzen:** Ji ber ku piraniya kurdan wê wek teherêkî wêjeyê nabînin ez dixwazim ji keça jinbavê “wergerê” dest pê bikim. Eger destûr hebe ez dixwazim li vir jî bi epizodekê dest pê bikim. Beri bi neh deh salan di bin pêşengiya Feqîr Ehmed de li bajarê Almanya’yê Kölnê komeleyeke nivîskarên kurd hatibû damzirandin. Hingê serokê wê Komeleyê jî Hisên Hebeş bû. Feqîr Ehmed zaf hewl dida ku kongreyekê pêk bîne ji bo ku koma rêvebir bê guhertin. Du caran bangî me kir da em biçin Köln’ê lê kongre nikaribû bê li darxistin, ji ber ku wî roja kongreyê li gor salnameya xwe ku wî çêkiribû û hemû mehên wê 30 roj bûn diyar dikir. Lê ew kesên ku diçûn wir jî li gor salnameyên fermî diçûn, lewra li hev rast nedihat. Dawiya dawîn em rojekê li hev kom bûb; Û min dît ku Feqîr bi dengê xwe yî bilind dibêje “Nabe heval kî kar bike, ew ê bibe serok. Û ev çi ye, hinek hene berhemên xelkê wergerandine bi navê xwe çap kirine,wisa nabe, ew çi ye werger merger nabe, yan tu nivîskar î tuyê binivîsîn an tu ne nivîskar î!” Di wê kêliyê de min dît bê Husên Hebeş çawa soro moro dibû, û digot “Ev çi peyv in ma ne ez serok bûm, we çawa bêyî min ez ji serokatiyê derxistime?” Tu nabêjî sedemeke ku bêyî ku hayê Husên Hebeş jê hebe wergereke wî yan yeke endamekî din ê koma rêvebir bû; li gor Feqîr Ehmed û çend kesên din î li wir amade werger ne wêje bû, lewra xwe mafdar dîtibûn ku bê helbijartin kaka rêvebir ji ser karê wê daxînin.

Min wan rojan antolojiyeke kurteçîrokên Kurdî bi Almanî amade dikir. Û baş dizanibû bê werger çi ye.

çi megre min hemû kurteçîrokên ku heta hingê bi Kurdî derketibûn xwendibûn û gelek caran jî hêrs bûbûm, ji ber yê ku bi kêr dihatin di nav wan de kêmtir bûn. Lê ez jî di wê civînê de çiqçiqim û bê deng mam. Mixabin ez çiqas dêhna xwe didim çalakiyên wejeyî yê Kurdan hîn jî wan dîtînen xwe yê di heqê wergerê de neguhertine. Bawer dikim di vir de tîrsa nivîskaran jî zaf heye. Ew ditirsin ku mînakên din yê ji nivîskarên biyanî bîn nas kirin û berhemên wan bi çavekî din bîn nirxandin.



**Husên Dûzen ( di ciwanî û por reşiya xwe de).  
[de ma zêrînî](sernivîser).**

**P6- Toreya biçûkan{zarokan} li nav nivîskarên kurd pîr kêmtir û li paş e, gelo ji çi ye?, çawa nivîskarên kurd dikarin biçûkan perwerde bikin bê ko ji wan re nivîs û berhem hebin?.**

**H. Dûzen:** Ev pîrs zaf girîng e û kêmtir kes li ser vê babetê radiwestin. Ew tiştên min di bersîvdana pîrsa yekemîn de gotin li vir jî derbas dibin; herçî beşê çîrokên gelêrî ne pîrr çîrokên zarokan jî di nav wan de hene û tu çi bigrî hemû çîrokên dinyayê yê bi nav û deng di nav kurdan de jî bi zimanê wan bela bûne.

Lê di warê wêjeya biçûkan a modern de birastî jî kurd pîr li paş in. Ez bawer im her kurdeke an kurdekî-yên ku bi zarokên xwe re bi zimanên biyanî diaxivin ne tê de-her xwestiye ji zarokên xwe re kilamên zarokan bibêje an li çîrokên geriyaye û an nedîtiye an jî kêmtir tişt bi dest xistine.Ez bi xwe jî li kilamên zarokan geriyam. Min gelek kovar pirtûk tev dan. Mixabin ez rastî kêmtir kilaman hatim ku li gor pedagojiya zarokan hatibin nivîsnadin. Piştî demekê naseke min ji Swêdê ji min re got ka li malpere Tîrêj mêze bike, di wir de kesekê bi navê Itîdal heye . Kilamên wê ne xerab in. Xwedê jê razî be bi rastî jî kilamên Itîdalê dive her zarokê kurd li wan guhdarî bike.Piştî min ji hevalê xwe Arşevê Oskan bihîst ku piraniya wan kilaman ji pênûsa Ferhadê Içmo derketine û ku du pirtûkên wî yê helbestên zarokan hatine çapkirin (Landik 1 û Landik 2).

Gelek pirtûkên zarokan li Swêdê di van 20 salên dawî de hatin wergerandin bo Kurdî. Lê mixabin di destpêkê de werger zaf xerab bû. Weşanxaneyên wek Apecê bêtir serê xwe bi wergerandineke ku li wan pirtûkan bê êşand. Mixabin hîn jî mirov pêrgî wergerên ku ewqas xerab in ku bikêrî xwendina ji bo zarokan nayên tê.

## P7- Çi rola rewşenbîrê kurd li gelê me heye, rewşenbîrê kî ye û gereke çî bike, ma ê nivîskar dibe ko rewşenbîr be?

**H. Dûzen:** Di vê pirsê de ez bersiveke neyînî dibihîzim; bi min wisa tê ku pirsyar dixwaze bi dizî bibêje ku nivîskar nikare bibe ronakbîr. Dibe ku mebesta pirsyarê ew be ku nivîskareke/î ku kar û barê xwe yê nivîskariyê cidî têbigihe, ji xwe nikare bi watiniyên yekî rewşenbîr re rabe. Ku mebesta bi rastî jî ew be ez dixwazim bibêjim: Rewşenbîrî ne pîşeyek e, ew bêtir helwesta elîteke ji zanayên civatê ye ku pêwîst be her gav bi berpirsariya xwe re radibin. Berî her tiştî ew zana û wêrekên civata xwe ne rewşenbîr. Kesê rewşenbîr ew kes e ku her tiyê zanîne ye; dengê ji hundurê wî jê re dibêje ku ew divê her li ser derdora xwe agahdar be, lewra her sibe tiştê ku berî her tiştî dest diavêjê xwendina qeflek rojname ye. Xwedî wijdan e, bi pereyan nayê kirîn, bi zorê nayê tewandin kesê rewşenbîr. Îca ku rewş ev be bêguman kesê nivîskar jî dikare xwediyê van taybetiyan be. Û ne dûrî aqil e ku ji hemû kesên din bêtir nivîskar nêzikî bicîhanîna van pîvanan e. Lê hin nivîskar di rewşin taybet de dikarin ji aliyê hinera wêjeyê ve berhemêke biserketî biafirîne bêtir ku helwesta kesekî rewşenbîr nîşan bide. Lê li gor ezmûnên dîrokî bi gelemperî tevahiya berhemên nivîskarên wisa jî kulek dimînin. Hermann Hesse diyar dîke bê çawa nivîskarên bi rastî tên nas kirin: "Ku hûn...bixwazin hunermend û nivîskarên rastî nas bikin, hûnê bikaribin bibînin ku ew kesin wisa ne, ku hewcedariyê wan a bêtir ji bo serxwebûnê heye û kesek bixwaze wan mecbûrî kirinê ne li gorî wijdanê wan e bike, ew tavilê dev ji kar berdidin. Ew ê ne bi zor û bertilê, ne jî bi mewkiyên bilind bîn kirin û ew ê ji dêvla ku xwe bidin bi kar anîn, ... xwe bikujin. Ji van tiştan hûnê bikaribin wan nas bikin". Gelek caran guftûgo li ser dibe bê divê helwesta rewşenbîr an nivîskar li hemberî siyasê çawa be. Bi ya min ne elîta rewşenbîran ne jî hunermend an nivîskar ne ew kesin ku her roj tevli kar û barên siyasî bibin. Divê helwestan wan diyar be ku hat û pêwîstî bû divê bi wêrekî derkevin raya giştî bi dengê bilind helwesta xwe eşkere bikin û piştê dîsa vegevin ser karê xwe. Umberto Eco li ser ronakbîran dibêje: "Ronakbîr bi kêrî çareserkirina kirîzan nayên, ew bi kêrî derxistina wan tên...Watiniyêke rewşenbîriyê jî ew e, ku mirov ji aliyê siyasî ve êrişî neyarên partiya xwe neke, lê belê li dijî hevalbendên di partiya xwe de derkeve." Ez dibêjim ji hemû gelên din bêtir pêdiviya Kurdan bi nivîskarên xwedî helwesteke rewşenbîrî heye. Mixabin mirov nikare bibêje ku nivîskarên kurdan hejmareke berbiçav ji nivîskarên xwediyê van xweseriyên li jor derxistine.

## P8- Internet dergehêkî nû li tore û nivîskarên kurd vekirîye, tu tecrubeya xwe ya taybet bi malperên kurdî re çawa dinerxîni û wekû nivîskarekî tu çî ji malperên kurdî re dibêji?

**H. Dûzen:** Internetê derfeteke baş da kedkarên wêjeya Kurdî. Di van çend salên dawiyê de gelek berhem bi riya malperên Kurdan belav bûn, gelek nîqaşên balkêş hatin kirin. Wek bê çawa di jiyana reel de çapemeniya Kurdan nikare bi berpirsariyên çapemeniyê wek hêza 4.rabe di malperan de jî gelek karên ku bîn kirin hîn hene. Piraniya malperên kurdan bi kesekî ve girêdayîne ku ew kes nexwaze nivîsek çap nabe an ku ew bixwaze dikare nivîsên ku qet nehêjayî weşanê ne jî belav bike. Û ku li hesabê wan kesan bê dikarin bi neheqî kesan suçdar bikin. Lê tiştê herî xerab jî ew e ku gelekên ji van malperan bê xwendin; nivîsên ku ji wan re tên belav dikin. Ev dibe sedema ku gelek çewtiyên rêzimanî jî belav bibin. Ez dibêjim çî dibe bila bibe lê divê rê li ber vê helwestê bê girtin.

**Têbînî:** Di 2005an de me ev hevpeyvîn ji bo malpera Tîrêj bi rêzdar Husên Duzen re kiribû, ji ber dîtînen wî yên zindî yên di derbarê ziman û zaravan de, em ji xwendevanên xwe yên hêja re di rojname Pênûsa Nû de dubare diweşînin, bê ku em tiştêkî jê biguherînin.

## ji foliklorê kurdî

### Gurê devbixwîn ... Çîrokê Zarokan

Xalis Miswer



Di mêrgêkê şîn de, kerek, û beranek, û roviyek, û kîvroşkek, û dîkek, bihev re jiyana xwe berdewam dikirin, û bibûn heval û dest birakên hevdû. Rojekê li wê hindamê, du gurê devbixwîn, bihev re derketibûn seyda û nêçîrê. Ha...li vir...û ha...li wir. Di meşin diçin û tên, ta gihane nêzî mêrga wan heywan û lawiran. Wa nerîn, wa nêrîn, dîtîna ku, waye birek heywan, li dera ha tene xuyakirin. Gurekî ji yê din re got: De birako tu li vira, li bendeyî min raweste, ezê bi tena xwe herim pey van lawiran, ku min tiştêk qezenc kir, wê çaxê ezê bang li te kim, tê were emê nêçîra xwe bi hev re bixwin, lê ku te dît ez dereng mam, tu zanî ku tiştêk bi min hatiye, tê ji xwe re bireve û here. Gurê din got: Nexeme de here birako vaye ez li vira li bendeyî te me çavê min li rêye. Gur berê xwe da mêrgê û çû. Beran wuha nêrî, dît ku vaye çawa gurekî devbixwîn, bilez ber bi wan ve tê, devê wî gazeke ji hev çûye.

Beran got: Birakê ker, gote: Hê... go, hay ji xwe hebe, bi xwedê waye gurekî dev ji hev, waye bi kerb, ji wêve tê. Ker kete hev de û got: Ka birako emê çilo bikin, bi xwedê ku em çarakê ji xwe re nebînin, wê gur me hemiyan li vêde biwxê. Beran got: Birakê ker, ker go Ha... birakê beran tu çî dibêji. Beran got: De binêre, ez zanim ku gur hez ji gunê kera dikin, ewila tên devê xwe davêjin gunê wan, de ka piştê xwe bide gur, û şeqa xwe ji hev vekê, çaxê devê xwe bavêje gunê te, tê herdû lingê xwe li hustê wê bide hev, û qenc lê bi şidîne, û bikê teht, wê çaxê ezê jê vekişim, û bi quloça pêkevîm, ta ez wî nehawî bikim, û ji kuştin berdim. Ker got: bilabê birako weke te gotî ezê bikim. Gurê devbixwîn ji wêde bi lez tê .... çaxê gihane nêzik mêrgê, dik bazda ser serê darê û azan da, rovî qulek ji xwe re di erdê de kola, û kîvroşk bi çolê ket. Gur gihane ker û devê xwe, avête gunê wî, û berneda, ker jî şeqê xwe lê dane hev, û kirin teht. Beran jêvedikişîya û bi quloça pêket, rep û hey rep, ta ew ji haw haw de xist. Ker got: Birakê beran, bi xwedê gunê min gelekî eşandiye, ez nema ji ber debar dikim. Beran got: Kuro ruh tê nemaye, min ew ji haw haw de xistiye, de hema şeqê xwe hinekî jêre sist bike, wê bê çerp û bazde, û li dûv xwe jî nanêre. Ker şeqê xwe hêdî... hêdî ji hev vekirin, hema gur ji cî go: hem hah û bazda, hate cem havalê xwe û lê nesekinî, hevalê wî go bisekine heyran raweste bê çî bûye çî nebûye. Gur got: Kuro bazd temîniya min li te bî, tu li vî welatî nesekinî. Gurê din got: De ka bisekine birako qene ez zanibim, bê çî bûye çî hatiye serê te. Gurê devbixwîn got: Qet nepirse tiştê hatiye serê min neyê serê misqof û gawiran. De meşe ta em serê heft caran derbasnekin, ez serpehatiya xwe ji te re nabêjim. Herdiwan bi hev re bazdan, ta heft car derbasnekin, ji niv re gur rûnişt û çîroka xwe ji hevalê xwe re got: hevalo, tiştê min dît tu nebîni!. Çaxê ez gihame mêrgê min dît, ku serêmin kete nav du tehtan de, û yekî bi du kopolan li min dixist, û yekî azan da û li ser min nimêj kirin, û yekî tirbamin dikola, û yekî jî bazda çû kefenê min bîne, lê pişt re nizam çawa ez filitîm, min xwe nedî illeh li cem te. Gurê din got: Wax!... birako! ev tiştê giş te bi çavên serê xwe dîtine û hatine serê te?. Got: Erê weleh... min bi çavê serê xwe, ev tişt hemû dîtine, Go: De meşe, ez bi wî xwedayê jorî mezin kim, ta law lawê me hebin, em bivira nema dikevin! û dan xwe û çûn, û hew li mêrgê vegeryan. û Çîrokamin ji were xweş.



## Welatê xwe nas bike

### Kirmanşah



Kirmaşan an Kirmanşan **an jî** Kirmanşah yek ji herêmên Rojhilata Kurdistanê (Îran) u yek je 30 parêzgehên Îranê ye.

Ev herêm ji Kamyaran dest pê dike û heta Şahabad diçe. Di vê herêmê de bajarên Kirmaşan, Ciwanro, Tazawa, Bêstûn, Pawe, Sonqur, Rewanser, Sahane, Kengawer, Serpêlzhaw, Mahîdeşt, Kirênd, Qesrê Şîrîn, Gîlangerb û Şahabadhene.

Kirmanşah navê vilayet (ustane) mezine rojhilata Kurdistanê û her visa navê merkeza vilayetêye ev bajare û bajarên ser bi vê vilayetê xudî mêjûyekî kevnar in. Navê bajarê Kirmanşahê bi kurdî dibe Kirmaşan û navê qedîme vê Qirmîsen bûye .



Kirmanşah di teqîmîmata ê evîlîn de ustana Qêncêye Îranê bû ku ustanên Hemedan û Kurdistan û Îlam jî li ser vê hisab dibûn . Piştê sê vilayetên navbirî jê cuda bûn .

Di despêka şoreşa islamîye Îranê de navê vê vilayetê bû Baxteran û piştî çend salan bi zext û fişara nonerên Kirmanşahê di parlamana Îranê de carekî din navê Kirmanşahê cihê Baxteranê girt. Di serjimariya sala 2006an de nifûsa vê vilayetê 1902760 hatiye texmîn kirin û nifûsa merkeze vilayetê yanî bajarê Kirmanşahê divê serjimariyê de gihîştîye 765075 kesî. Bajare Kirmanşahê 1410 mêtiran ji derya azad bilintire.

Ev vilayete merkeza hikûmeta Sasaniyan bûye li bervêyekê asevarên gelik dîrokî û xudan qîmet divê vilayetê de mane, mina; Taqbostan, ketîba Bîstûnê û meêbeda Anahîta.

Kirmanşahê li ber xatira cirecîre bûna av û heva û mezheb û qevmîyetên vê leqeba Hindistana Îranê didinê . Bo mînak Qesrîşîrîn xudanê av û hevayê germe û Sunqur û Pavê av û hevayê sar hene belê bajarê Kirmanşah xudanê av û hevayekî normale.

Di vê vilayetê de Kurd, Lek (eşîrekî kurdan), fars, ereb tevlihev dijîn. Ji aliyê olê ve Şîee, Sonî, Ehillheq (**Yarisan**) , **ermenî**, **asûrî** û **cihû** bi hev re dijîn. Piraniya xelkê vilayeta Kirmanşahê bi **zimanê kurdî** qise dikin .

#### Qezayên Kirmaşanê

Kirmaşan (qeza): Kirmaşan, Fîrûzabad (senter: Helcî), Maydeşt (senter: Rubat)



Ciwanro (qeza): Ciwanro (Ciwanro), Selas Bawecanî (senter: Taze Dê), Riwanser

Emîle (qeza): Emîle, Giwawer (senter: Sermist)

Harûnawa (qeza): Harûnawa, Humîl, Kirînd (Kirînd), Giware

Hersîn (qeza): Hersîn, Bêstûn

Kingawer (qeza): Kingawer

Pawe (qeza): Pawe, Bayingan, Newsû

Qesrîşîrîn (qeza): Qesrîşîrîn, Somar

Sehene (qeza): Sehene, Dînewer (senter: Nêwan Rêyan)

Serpêlzhaw (qeza):

Serpêlzhaw (Sêpell Zehaw)

Sunqûr (qeza): Sunqûr

#### Bajar

Bajarên vê vilayetê evanene: Kirmanşah merkeze vilayetê, Islamabada Xêrb (Şehabad), Pavê, Nosûd, Nodşe, Selasbabacanî, Civanro, Dalaho (Kirênd), Revanser, Serpulzhab, Sunqur, Sehne, Qesrîşîrîn, Kengawer, Gîlan Xêrb, Hersîn.

#### Cihên tûrîstî

Cihên torîstî ye vê vilayetê evanene; abşara derbend, Qebrê Babayadigar, Bîsitûn, Taqbostan, Qopya Mehşîdanê, Tekiya Mueavin Elmulk, Çartaqî, Rêjav, serava Revanserê, serava Nîlofer, şikevta piro, şikevta Qûrî Qelayê, qelaya Yezdgurd, koçka Sasanî, Qesrîşîrîn, gora Ishaqvend, micesime (hêykelê) Hêrkol, mizgevtaya Eimadidole, nîyayişgah (îbadetgeha) anahîta (CD Dêhxuda).



## Baniye Cegerxwin



### Ne xeme êdî tu herî

Ne xeme êdî,tu here  
Ji min tu zû bi dîr keve  
Nema dilê min,ji nûve  
Azariya te hiltênî

Ji jiyana min derkeve  
Bi dostanî,winda bi be  
Nema çavê m' ji mgirînê  
êdî karî Te bibênî

Bi elendê re zû here  
Bi şevêre rêwî bibe  
Nema rewa li canê min  
Da ku oxir ji te bistênî

Bi ewra re nependî be  
Li ber çava,nexuyayî be  
bese derûn,ji jana dil  
nema karî xwe hilênî

Bi derya re tu xweş here  
J' bîranînê min derkeve  
Nema hişê m bi carekê  
Dixwazî te bi bîr bînî

lêbûrîna, qet neşîne  
Li paş xwe tu nemezêne  
Da hêviya vegera te  
Nema ji min re bimênî  
Ti şûnwarê xwe nehêle  
Ne yê bîra min her pêle  
Nema hizir ,êdî karî  
Bîranînan binexşênî

Bi sîber û bi xeyala  
Bi xewrojken timî vala  
Nema xewna min,ji nûve  
Karî dîsa,xwe vejênî

Bi min re raman qet neman  
Ne helwest û hestê min man  
Çawa dil xwe biparêzî  
Çawa rêça xwe bi bînî

Heza dil û evîna min  
Hemî bûyerên jina min  
Min tev dane te bê buha  
Ka wê çi j' min re bimênî

Ger bi rastî tu hevkar bî  
Ji min re tim payedar bî  
Bîranînekê bihêle  
Da dil xwe pê her bibênî

Meger ji dil, evîndar bî  
Bi evînî tu navdar bî  
Divê tu ,herdemê bi dî  
L' bende sitandinê  
nemênî

## Bêwar BARI TEYFURI



### Kurdo rabe

Xelq bi xwîna min bû xwedan sînor û  
mor,  
Lê hela hê hildîşê xwîna min a sor...

Ji nav gelê min kê m nabe axîn û şîn,  
Lê xemsarîya rêbazan min dike xemgîn...

\*\* \*\*\* \*\*

Çi rozgar,çi helweste,  
Çima kurd xelgpereste.

Hev hes nake bê heste,  
Ji bo neyar kardeste.

Weha nabe qe jîne,  
Bifikirin hun kîne ?.

Kurdo çima nabin yek,

Hev nagirin bin alek,  
Bê pişt,bê hêz û bê dost,  
Kurd hêrandin kirin post.

Kurdo bûye xwelîser,  
Hemberî hev dike şer.

Rastî jî mera şer me,  
Ev çi dilq,rewş,keleme.

Çi bîr û doz berxwedan,  
Çi serxwebûn,çi meydan.?

Kurdo kêra dike şer,  
Yek yekî nake bawer....

Bi pesina pir meste,  
Dixapînin bindeste.

Çi rozgar, çi helweste,  
Kurdo hertim berdeste.

Kurdo mayî bin pîya,  
Pêpez dibî ç a gîya.

Yekser rabe ç a çîya,  
Her ser dujmin ç a zîya.

Bi yekbûn bibe xuya,

Yê te silavke dunya.  
Bêjin.....n,  
Bêjin va em jî hene,  
Ne koleyê xelqêne.  
Xwedan ax,maf û dozin,  
Xwedan jînek pîrozîn,  
Lewna îdî em yekin,  
Li qadada ne tekin....

\*\*\*\*\*

KURDO dem dema teye,  
Pêşeroj jî ya teye

Lê raperîna te  
A yekser ne xuyaye

Ev gel ê birîndar

Hîvîdar ê teye

Xewaroooooooooooo

Hişyarbe dora teye.,

Dora te

Mora xwe li dîrokêxe

BIBE XWEDAN AL Û SÎNOR

WEY K U R D O O O O O O



*Ezîz Xemcivîn*



**Çenh helbest**

Di êvara min a tenik de  
 Di hawara dilovaniya min de  
 Di bin savara kesera min de  
 Di qata zêrîn de tu li ba min diyar dibûyî...  
 Di ketina nîrxê dînbûna te de  
 Di raxistina hişê te de  
 Di lêrasthatina  
 Xecxecokên çavên me de  
 Di gerîneka sêrojka evîna me de  
 Di baxçeyê bîreweriyê de min tu didîtî...  
 Ne hunerê rengê te bişaft, û ne tiliyên min ji te re mûmdan man  
 Dêmen te di bin çengê silavê de xatir ji lêvên min xwestin...

Porê şevê di nav guliyê te de winda di be...  
 Heyv di rûyê te de şerm dike.  
 Kî û kê morîkên xewê di guhdana zikreşiya xwe de çandine...  
 Çima keskesora bejna te nabînin?  
 Çima canê te di derizînin?  
 Gulofîtên maran li ber pêyên te diraxînin?  
 Welatê kederê! Ji xwîna hinarkên rûyê te,  
 Gulzara evîniya min hatiye avdan,  
 Ji lew ra helbestên min şaneyên xwe di çiyayê dilê te de ava dikin.

Te bi xwe ew êş veçirand...  
 Te bi xwe ew dahol çirand...  
 Guhê çolistana dil dengê te nekir...  
 Zincîra keseran heyva gotinên min dorpêç kir...  
 Em ketin pêxîla tilûrên beratan,  
 pêxîla hunera kujer bazan...  
 Çendî dirinde li ser ax û kevirên me civîne...  
 Nema bi xwînê têr dibin,  
 êdî ken jî ji çavên zarokên me didizin...

**Ji bo Helbstvanê Navdar**

*Ehmed mustefa*



Piştî tu çûyî ew dara te jê re dinivîsand nema pelên wê şîn di bin  
 piştî mirina te nema rûbara tu li ber rûdiniştî  
 û te hel bestên xwe jê re digot û dixwend nema diherike  
 piştî tu çûyî kevirên welatê te li ser te kirin girî û lorî  
 û kevokên welatê te nema karin bifrin û baskên wan şikestin  
 piştî mirina te helbestvanan pênuşên xwe şikandin  
 û gelê te tev man perîşan û bi çavên kelogirî  
 lewra li ser gora te hêsinên dilşewat dibarînin.

**Şêrko Bêkes**



**Beyar Robarî**

Ey felek .. ey felek  
 Ka **Felekîne**<sup>1</sup> me ka?  
 Ew ronî û pêûsê giranbuha  
 Mijûkar û ramanvanê pêşverû û hêja  
 Şoeşgerê azadiya raman û peyva  
 Ê pêşmegeyê Şoreşa Êlûn û Gulan  
 Ciyê te buhuşt be ey ronekbîrê hemû kurdan

\*

Ey felek .. ey felek  
 Çima zû ji nav me barkir kek Felek?  
 Me heye pêwîstî bi wisa mirov û xelk  
 Xwedî ramanên pêşverû û wêrek  
 Nekoleyên peran û postên wezaret

\*

Ey felek .. ey felek  
 Her carê bardike ji nav me delalek  
 Aqilmed û zanyarek  
 Jibo civaka me ev mezin ziyaneke  
 Çima dimirin mijûkar û zaneyên zîrek?!

**1- Felekîne Kakayî:**

Rewşenbîrek Kurd binavûdenge û ew bi salan pêşmerge bû di nava revên şoreşa Êlûnde. Sala 1943 li Kerkû ji dayîka xwe bûyî û sala 2013` an 31 meha tîrmehê anîjyanbû. Ji berhemên wî: Ronahiya Zaredeşt, Bêdarî û bi erebî jî wek: العلويون، موطن النور، احتفالا بالوجود.

\* \* \*

**Kurdno koçnekin**

Kurdno koçnekin û merin  
 Hemû dijminên me li ser koçkirina me yekin  
 Hûn baş di bînin,  
 Hemû dewlet û opzosiya Sûrî bêdengin!!  
 Merin û koçmekin, mayîn û koçberî neyekin  
 Mirina birûmet û nanê koçberiyê ne wekhevin

\*

Kurdno koçnekin û merin  
 Li Rojavayê welatê xwe bi mînin û dermekevin  
 Da hûn nebin kole û xizmetciyên sexte kesin  
 Ê nemalî keling û nivînên bav teresin  
 Ê ranezin li bin çadîran wek pez û qerecin

\*

Kurdno koçnekin û merin  
 Welatê xwe nehêlin û xwe erzan nekin  
 Dijmin û neyaran koçkirina me daxwazdikin

**Ey felek**

Xwe biyekin û bi mînin û çek û topan hilînin  
 Ê van tundrew û çetan ji warê xwe derînin

\*

Kurdno hûn kanin hîro koçbikin  
 Lê hûnê çawa paşê vegerin ?  
 Nehêsane vegera warê xwe û male  
 Piştî ketin destên neyar û dijminane  
 We nedît rewşa Felestîniya li pêşiya çavane  
 Ê rewşa kurdên başûr sala 1991` ne  
 Koçberî xerabmal û wêrane  
 Ê wendabûna xaka niştimane

\*

Kurdno jiyane nebes av û nan û rehet razane  
 Jiyane rûmeta mirov û niştimane  
 Daxwaz û hêviya min ji her kurdek dilovane  
 Bimîne li mala û warê xwe, li Kurdîstane



**Diya Ciwan****Ji bo Bavê Ciwan****di bîranîna salvegera wî de**

Min digot qey tu carî, dara Mazî hişk nabe...  
 û kevirên gundê me pîr nabin...  
 Min digot qey tu carî, Stêrik ranazên.....  
 û birînên min careke dîşiyar nabin..  
 Min digot qey tu carî,  
 pênuşa min lal nabe...  
 De were loooo...de were lo...  
 Malavawo..  
 Çavên min û van helbestan.. ji riya vegera te..  
 westihan û qerimîn..  
 De were looo..  
 de were lo..binêre;  
 ka çawa ez bi rondikên xwe destnimêj digrim !!  
 Kî dibêje derdê te bê demane..  
 û çûna te bê vegere..!??  
 Hey lê lêêê...hey lê lê....  
 Hey lo loooo..hey lo lo....  
 De were loooo..



Dê tu henekê xwe li kê bikî..?  
 Bi Xwedê...Her heft bira û her pênc xwehik  
 û her şeş zarok..  
 Her çar dîwar.....  
 Cîran û kolan..  
 Balgeh û doşeka te...  
 Berçavk û se'eta te  
 hemî weke min dibêjin:  
 De were looooo  
 de bese looo  
 De were lo....berya ku agirê mirîna xopan  
 xewnên min hemiyan  
 bi hev re bişewitînin ...  
 Ma tu carî  
 pismaman xwe ji ber sozên Dotmaman dane  
 alîkî..!!!??  
 De were lo...  
 Bi Xwedê, ditirsim ku bimrim  
 eger rojekê ez hest bikim ku  
 vaye  
 tu ... MIRÎ.

11 . 07 . 2011

**Diya Ciwan****Pênûsa min (1)**

Pir caran  
 Pênûsa min dibe mîna kevirê ku  
 Tu wê bavêje binê bîrekê de  
 Serê xwe di zikê xwe de diveşere  
 Bê deng û liv dimîne  
 Ez destê xwe ji wê dişom  
 Bawer dikim  
 ku ew ber bi mirînê ve diçe  
 Ez gora wê, di rex ya dayîka xwe de  
 dikolim  
 Hew dibînim  
 Ji nişka ve  
 Tîpên minî gerî tijî û çav şil  
 Bi destê hev digrin  
 Li dora cendekê wê dîkin govend  
 Hinek ji wan dilîlînin  
 Hinek ji wan digrîn  
 Ê hinek dikevin ber milê wê  
 Radikin şîpya  
 Dîsa pênûsa min a bejinzirav  
 Çavê xwe mist dide û vedike

Li dora xwe dinêre  
 Mîna ku ji xeweke giran şiyar be  
 Li ser serê tiliyên xwe radiweste  
 Ê  
 Bi tîpan re  
 Dikeve cenga semayê

**Pênûsa min (2)**

Ger tu nebî xencerek  
 Di nav destê pêşmergeyekî de  
 Yan dadekek  
 Di destê mendalekî de  
 Nebî tîrek  
 Di kevanê nêçîrvanekî de  
 Ne jî gêsnek di bin piyê cotkarekî de  
 Nebî rimek  
 Di nav penca rimbazekî de  
 Ne kilçovek  
 Di nav kilê zeriyekekî de  
 Ne kopalek  
 Di bin çengê kalekî de  
 Lê ji kêmanî  
 Bibe derziyek  
 Di destê jinbiyekê de

## Mizgîn Hesko



### Kurd im Kurdistanî

Dayê  
Îro...  
Ne li vir û ne li wir im  
Tenha...tenha  
Êşa te ..  
Di dilê xwe yê xembar de  
Di hilgirim  
Dayê  
Ne şeva min şev e  
Ne jî roj roj e  
Tenha ...tenha  
Fîxana te  
Cerg û hinav di soje  
Dayê  
Ev çi dûman û tariye  
Bexên min in  
Li ber dergehên sînoran  
Li şûn wan  
Tenha...tenha  
şîn û girî ye  
Xaka min e  
Wêran û vala dibe  
Ma ev çi felekreşiyê  
Ax...çi bi serê min hatiye  
Ax...çi bê serê min hatiye.... dayê  
Dayê  
Soz ...dê dest ji te bernedim  
Hîn...çem û rûbarên te  
Yên zuha  
Di damarên laşê min de  
Xwîn digerin  
Hîn...rez û zeviyên te  
Yên bê keskaî  
Tevlî henasên berbangên min di bin  
Lale û nesrîn  
Di bejna paşeroja min de  
Di jenin  
Di bişkivin  
Û hîn...  
Bîna pêşîra te

Pîvanokên bedena te  
Peñîrokên destên te  
Mişarên pembo  
Yên li ser gerdana te  
Nîsk û gulgenimên lêvên te  
Kelkela havînên te  
Bawêşîna şevên te  
Sihara spê  
Bîna qehwê  
Hinarên qelaştî  
Erxewaniya dêmên te  
Xwişîna spîndaran  
Awazên sozdarên  
Lîlelîla werz û demsalan  
Kolanên aşiq û evîndaran  
Û hezkirina te  
Ax...çi ji te hezdikim ...dayê  
Dayê...  
Vemirîna te  
Ez im...yê vemirî û bêdeng di mirim  
Rondikên te  
Ez im...yê dagirtî giryan  
Herikîna xwîna te  
Ez im...yê sor sor  
Can herikî  
Şehîd û pakrewanê te  
Û hawara te.... dayê  
Ez im...nevîçirkê malzaroka te  
Axa te  
Êşa te  
Hawar hawar  
Hawara te  
Dayê  
Soz....dê dest ji te bernedim  
Dê serdana başûrê dilê xwe bikim  
Dûr naçim  
Dê nêzîk ve gerim  
Li wir jî  
Ne biyan û penaber im  
Kurd im.kurdistanî  
Di xaka xwe de  
Bi serbestî digerin  
Kurd im...kurdistanî  
Li wir jî  
Ne aware û koçber im  
Na ...na  
Ne tirsonek û revok im

Lê,,, qêrîna biçokê min î birç  
Ez behitandim  
Nexweşiya dapîra min  
Cerg û hinav  
Li min sohtandin  
Nafîna xwişka min  
Di nav pençên tarîgehê de  
Dest û pê  
Li min lerizandin  
Dayê  
Reşe demsal  
Li min zîvirîn  
Û payîzê  
Ez xapandim  
Rewrêkê piştî min şikand  
Seqet û bawî  
Sînor...sînor  
Ez gerandim  
Û îro  
Bi hezaran  
Em tert û bela ne  
Di tebaxê de  
Em mîna keleşera ne  
Lê vaye  
Kurên te yê comerd  
Bi min ve hatin  
Dibêjin: em kurd hemî bira ne  
Na ...na  
Ne ku qels û lawaz im  
Lê carna jî  
Şêrên jêhatî bê çara ne  
Erê...dayê  
Min digot: ez ê axa gundê xwe bixum  
Û dê dîr neçim  
Ez ê...ava çalên kolanên xwe vexum  
Û dê dîr neçim  
Lê...ma çibki m dayê  
Bê çare me  
Careke din felek dewra ne  
Li min enfal û ferman e  
Li hawîrdora min  
Valahî û wêran e  
Bê çare me  
Li ber dergehê mirovahî yê  
Ax...çi bi serê min hatiye  
ma sincên mirovahî yê  
li vê cîhanê ne man e...?




*Ebdulselam Xoce***Halana Dil**

Roj diçû ava..  
 Tariyê per da xweyî reş  
 Berdida ser riwê gerdûnê.  
 Gund...û...Bajar...  
 Diketin xew  
 Heyvê şerm dikir  
 Piştta xwe dida te..  
 xatir nedixwest û diçû..  
 Stêr direviyan..  
 Dilên evîndarên te xemgîn dikirin û ..  
 ew jî diçûn.  
 Amûdê.....keleha êş û xeman  
 Tu bi tenê şiyar dima  
 Li ser masa derdên xwe...  
 Te şîva evîndar  
 Leheng ...û Can fîdayên xwe...  
 Amade dikir û digel barçemokan,  
 Te guliyên helbesta xweyî westiyayî dihûnand...  
 Landika êşên te,  
 Evîndarên te, giyanên sotandî...  
 Lehengên te... Li asîman...Firîştta dihejand  
 Pêre sema dikirin  
 Û  
 Dibin çengên xwe de binaxkirin...  
 Amûdê...  
 Birçiyê helbestê me.  
 Bêriya zivistanên teyî bi şîn dikim.  
 Û fîxanên bi axîn li kolanên te...  
 Cadeyên teyî jibîrkirî,  
 Tenûra nanê teyî germî sarbûyî,  
 Dastanên dîne teyî bîaqil...  
 Hewar digot:  
 -Xwedê nehêle...

Wê ji kêre bihêle, ji kêre nehêle...  
 Şêxê doda li gola Enter...  
 Mirîdên xwe dicivandin, li erbanê di dan...  
 Şermola di hejandin...  
 Çîrokên binaxkirî vejîn dikirin...  
 Ji xew şiyar dibûn.  
 Çîrokan.. çîrok ji hev re digotin...  
 Mindalên ku zû ji himbêza dayikên xwe koçber bûn..  
 Bi refên çûkan re ,  
 Bi firîştayan re..  
 Dojeh dixemilandin..  
 Qedera min bi ya te ve girêdayî ye...  
 Qedereke nepen...  
 Dara jiyane ji mêj ve.. pela te hilweşandiye.  
 Rewşa te awarteye, dayika min, evîna min...  
 Ta kengî di payîzê de, dibin pelên hilweşayî de..  
 Bê dengiya xwe veşêre.....  
 Li ser şêlakê.. her dem navê te.. dinîvîsînim...  
 Lê pêlên derya hiltîne..  
 Karwanê omîdê.. Te li pişt xwe dihêle.  
 Ger delûlê ..giyanê te dilerizand..  
 Tu germ î..sar nabî.....  
 Hevîrên xwe li tenûra te dixistin..  
 Te dipêça..Li şoreşgêran belav dikir..  
 Şoreşa hebûnê.. Bi te berdewam dibû...  
 Şahrezad[1].. Dilpakiya te bû..  
 Toş.. Welatparêziya te bû..  
 Herifandina... keleha zordariyê,  
 Awirek ji awirên tolê bû..  
 Ax, ax, ax... Amûdê...  
 Nema dikarim, li hêviya wê rojê bi mînim  
 Ez ê bi mrim...  
 Giyanê min bi axa te şa bibe,  
 Min pir ji te hez kir ...  
 Amûdê... Dayika min evîna min...

## Spasî ji bo weşanên rêveberiya giştî ya karubarên Êzîdîyan !



### Hêjayan,

ez gelekî bextewarim ku, weşanên rêveberiya giştî ya karubarên Êzîdîyan, bi alîkariya wezaretê ewqaf û karubarên Ayîni ya Hukumeta Herema Kurdistanê, ev pirtûka min a jimara zincîrê (8), di bin derhênanê hûnerî: rêzdar Hesên Omer Xidir de û di sala 2012 de li çapxana rewşenbîrî / Hêwler `ê da çapkirin.

Spasî yê bê sînûr arasteyî mamoste Xeyrî Bozanî, rêveberiya giştî ya karubarên Êzîdîyan li Hukumeta Kurdistanê dikim, ku çapkirina vê pirtûkê bi erkê xwe zanî û bo her kesê keda wî ketî nav perên vî berhemî da.

Li hêla din sipasdarî nivîskar Heso Hurmî me, ku ev berhem di bin çavên wîra bi xwendinek hûr derbas bû, zêdebarî nivîsandina pêşpeyveke bi qîmet.


### Pêşpeyva nivîskar Heso Hurmî weha ye:

Ji sala 2002 ande, ez xemxorê kulturê kurdên Êzîdî mamosta Kemal TOLAN nas dikem, kedeka mezin di vê biyava hanê de mezaxî ye û her xebata xwe di domîne, meriv ji hîza wî ya leşî û hizrî çavnebare, ku kesek bi vî emrî gelek jê li diyasporan derbas kirî, tim ziman, kultûr, dîrok û perwerde li ser nîrxên kurde waryê di nax û fikra wî dane, belkû serkêşiya bizav û çalakîyan sexmeratî bi cihanîna van nîrxên Êzîdîyatê di

de meşandin, zêde barî weşandina berhemên.

Ev pirtûka li ber destê we yê hêja amêza barcemêke nivîsar û gotar û dîdarên nivîska K.Tolan dike, anlîzeyên xweşik bi zimanekî rind û sakar dayî ne nivîsandin, ez bi bawerim demê mirov vê pirtûkê di şopîne lave nake ku dev jê bi qire, heya temam bike, çûnke şewazê nivîsînê pir bilinde û hêjaye, gelek pêzanî bi nîrx û giran buha li ser mijarên cûda, cûda yê girêday Êzîdîyatî yê, di îne holê, bê guman wê asoyên xwendevanê xwe ber fireh bike û bibe handerek îdî ciwan û xortên me li kevneşopên kal û pêşyan mêze biken, belkû lê xwedî der bikevin bi armanca parastin û pêşdebirîne.

Berhevkerê pirtûka Nasandina Kevneşopên Êzdîtiyê II hewil daye bi dekommentikrîna pîrozî yê Êzîdîyan rabe li gel pêşkêş krîna şirove yê zanistî û hêja derbare yî dîrok û çand û rewîşt û tîtalên Êzîdîyan. Dest xesîyê li nivîskarî dikem û miraz xwazim ku ev pirtûk sîd beşîş be û bigeha armancên xwe. *Hollanda 05.02.2012*



### PÊŞGOTÎN Û HÎNEK DÎTÎN LI SER KEVNEŞOPÊN ÊZDIYATIYÊ

#### Xwandevanê/a hêja;

Gelek ji me dizanin, dema ku mediya elektronîk, bi taybetî jî gava îmkânên ragihandin û weşandinê bi saya derketina internetê derket, hingê firsenda ku meriv bikaribe zanîn, çavkanî û lêkolîn kirina xwe zêde bi rêkûpêk û pêşkêşî xwandevan bike jî derket.

Şikir ji Xwedê ra, gelek xizmetkar, zahmetkêşên mediya ragihandin, weşan û çapemeniya Kurdî jî ji vê fersendê fêdekirin û zanîna xwe pê bilndikirin. Dûre bi saya pêşketina wan yê di nav van salên derbasbuyî de gelek nêrîn, gotar, çalakî û nivîsên min jî gihîştine nav mal û ber destên xwandevanên dilxazên Êzdîtiyê. Li virê dîsa dibêjim, gelek spas ji bo wan dezgeh û kesên ku di quncikên weşanên xwe da cîh dane nêrîn û gotarên min.

Lê, ez bi xemgînî dibînim ku vêga piraniya wan nêrîn, gotar, çalakî û nivîsên min di nav arşîva gelek mediya, weşan, çapemeniya Kurdî û bi taybetî jî di nav çavkanî û ragihandinên civaka me Êzîdîyan de ne hatine xwanê kirin û parastin. Vêga ev kesên ku ew xizmeta ku min berê ji bo nasîna ola civak û netewa xwe kiriye ne xwandi bin, ew îro nizanin ka min çî ji bo parastin, pêşveçûn, hebûna nasname û nasîna Kurdayetîya resen kiriye.

Ji xwe ev yek ji sedema min ya ku ez wan nêrîn, gotar, çalakî û nivîsên xwe, yê ku di nav gelek kovar, malperên internetê û rojnameyên cûde de hatibûne weşandin, cardinê di vê pirtûkê de çapbikim.

Sedema min ya diduyan jî li ber dilê min gelekî girînge û ez timî li goriya zanîn - derfetên xwe dibêjim; di nav kevneşopên civaka me Ezdahiyên de gelek nîrxên Kurdayetîya resen, yê mîna ziman, dîrok, çand, folklor, adet û toreyên Kurdîtiyê tene xwanê kirin hene. Û piraniya van nîrxên Kurdayetîya resen hîna ji aliyê rewşenbîr, rojnameger, nivîskar û niştîmanparêzên Kurdistanê û me Êzîdîyan ve baş ne hatine gengeşekirin û zelal ne hatine xwanêkirin. Ji ber van kêmasiyan jî gelek agehdariyên ku „zane“ û „dîroknivîsên“ xerîban û her wisa jî gelek nezan, belangaz, rewşenbîr, rojnameger, nivîskar û niştîmanparêzên Kurdistanê ku li ser Êzdîtiyê jîyan me Êzîdîyan gotine an hêjî beladikin şaşin.

Bi dîtina min, gava meriv baş ji naveroka çand, helbest, sitran, çîrok û metelokên Ezdahiyên yê kevn hatine parastin fêhbike, meriv dibîne ku di nav wan de ne tenê ziman, dîrok, çand, folklor, adet û toreyên Kurdîtiyê hatine parastin. Her weha di nav wan de gelek nîşanên kesayetî, libas, gund, çiya, deşt, newal û dîmenên xwezaya Kurdistanê jî tene ber çavên meriv. Dîsa meriv dikare gelek xelet û dîmenên dîroka xwe yê bi hezarê salan derbasbuyî, hestên ev î, eş û tadeyên cihê cihê hatine serê gelê me jî fêmbike. Heta bi saya hebûna ilm, Qewl(bingeha sitran, destan, çîrok û dengbêjiya Kurdî ne), duha, serpehatî û metelokên Êzîdîyan yê ku heta vêga tenê bi devkî dihatine gotin, êdî pêşeroja xwe jî zelaltir bide xwanê kirin. Ez bawerim, lewma jî bav-kalen me gotine, „kesên ku kevnê wî nebin, wê nuyên wî jî nebin“.

Vêca, ji bo ku ciwanên me jî bikaribin çande, ol, tore, kevneşopên nasname û dîroka netewa xwe baş analîze û nas bikin, divê gelek arşiv û çavkaniyên ku nîrxên parastin, pêşxistina nasname, ziman, dîrok, çand, folklor, adet û hemû toreyên civaka me Êzîdîyan didine xwanê kirin, li ber dest û zanîna wan hebin.

Ji xwe gelek ji we rêzdarên jî dizanin, min ji bo vê armancê heta vêga 3 pirtûk jî ji nav dewlemenidiya çanda Kurdîtiya resen, zargotin, kevneşop, jîyan xwe û serpehatiyên endamên civaka Êzdîtiyê pêşkêşî xizmeta parastin, pêşveçûn, hebûna nasname û nasîna Êzîdîyatîyê kirine.

Heta ji destên min bê, ezê zanîn û şeweya ku min di wan kitêban de bi kar anîbû, divê pirtûka berhevkerîna Nasandina Kevneşopên Êzîdîyatîyê II de jî bi kar bînim.

Lavan ji Xwedê dikim ku hinek ji ciwanên me, xêrxwaz, olzane, dîroknas û lêkolînerên olnasîne bikaribin ji vê xebata min fêdebikin. Ev xebat û berhevkerîna min ji wan re bibe handanek û ew karibin hê zaniyarên zêde li ser wan babetên ku destê min ne gehîştîye anjî min bi wan nizanîbû tevan kombikin, kêmasî û pakîyên demên derbasbuyî baş fêr bibin û ew bikaribin pêşerojê gelekî paqij, tijî aremî, aşîti û azadî ji xwe û nebiyên xwe ra biafirînin.

Herweha hêvîdarim ku tu nijad, civat, ol û kes vê mîtolojiya afirandina dinyayê û bingeha mirovatîyê ji bo berjivendiyên nijad, civat, ol, dezgeh, rêxistin, ziman û kesayeta xwe neguhêzin. Em bikaribin ji vê resenî, heqî û wekhevîya di mîtolojiya “HAVEYNÊ MIROVATIYA ME ZOPOTAMIYA YÊ Û BI TAYBETÎ JÎ XIZNA NASNAMA GELÊN KURDE “ re xwedî derkevin.

Berhevkar KEMAL TOLAN ..... Almaniya ,2011



Sernivîser

**Qado Şêrîn**

Rêvebirê Nivîsînê

**Arşek Paravî**

Desteya birêvebir

**Abdilbaqî Huseynî**

**Ezîz Xemcivîn**

**Lawîn Şêxo**

**Pîr Rustem**

**Silêman Azer**

Derhener

**Xorşîd Şûzî**

Ji bo hinartina berhe mên kurdî:

[kurdi.penusanu@gmail.com](mailto:kurdi.penusanu@gmail.com)

